

Nûbihar

www.nubihar.com

KOVARA ÇANDÎ HUNERÎ EDEBÎ



- ▶ Di Cihana Îslamî de Jana Guhertinê
- ▶ Şaha kurd Deyfe Xatûn
- ▶ Di Sedsala Kurdan de Sedhejmariya Nûbiharê
- ▶ Bindestbûna Gel
- ▶ Desîsa Duyemin
- ▶ Mela Alî Germavî bi Bêdengi Wexer Kir
- ▶ Bi Sabah Kara re Hevpeyvîn
- ▶ Wek ku Gunehekî Xwe Veşêre
- ▶ Du Şêr Du Xezal
- ▶ Bi Şivan Perwer re Hevpeyvîn
- ▶ Raman û Hêvî
- ▶ Kall Haco
- ▶ Evîn Şahê Hemî Welatan e
- ▶ Cu û merg
- ▶ Mewlid-Yûsif û Zelîxa - Qesîdeyê Kerbela
- ▶ Bûm Siwarê Xeyalan
- ▶ Evîna Wenda
- ▶ Gorname
- ▶ Perwerda Zarokan
- ▶ Jiyana Mirov û Şeveqa Serkeftinê
- ▶ Keda Şêx û Meşayîxên Me



Sal: 14
Cild: 11
Hejmar: 99
Havîn 2006
Biha: 5 YTL

PÊŞBAZÎYA

Hejmara 100.

Bi sedema hejmara Nûbiharê ya 100. me pêşbazîyek vekirîye.
Pêşbazî di du beşan de ye: Çîrok û Helbest.
Kesên ku dixwazin beşdarî vê pêşbazîyê bibin divê berhemên wan heta
31 Çileyê Pêşîna 2006ê bigihêjin destê me.
Emê encama pêşbazîyê di hejmara 102. de îlan bikin.

Mercên pêşbazîyê:

- 1- Divê berhemên şandî, heta niha nehatibin weşandin.
- 2- Çîrok ji 5 rûperan zêdetir nebin.
- 3- Divê nivîs hem bi rêya e-mailê û hem jî li ser kaxizê ji me re bête şandin.

*

Nûbihar/Çîrok

Xelat:

Yekemîn: Plaket û 10 Cildên Nûbihar û pirtûkên wê

Duyemîn: Plaket û 10 Cildên Nûbihar

Sêyemîn: Plaket û Pirtûkên Nûbihar

*


Nûbihar/Helbest

Xelat:

Yekemîn: Plaket û 10 Cildên Nûbihar û pirtûkên wê

Duyemîn: Plaket û 10 Cildên Nûbihar

Sêyemîn: Plaket û Pirtûkên Nûbihar



www.nubihar.com

Nûbihar
KOVARA ÇANDÎ HUNERÎ EDEBÎ
(KÜLTÜR SANAT EDEBİYAT DERGİSİ)

Navnîşana Name û Nivîsan
P.K. 80 Fatih - İstanbul

www.nubihar.com

Nûbihar

KOVARA ÇANDÎ HUNERÎ EDEBÎ
(KÜLTÜR SANAT EDEBİYAT DERGİSİ)

Büyük Reşit Paşa Cad. Yumni İş Merkezi No: 22/29

Vezneciler/Beyazıt - İstanbul

Tel&Fax: (0212) 519 00 09

www.nubihar.com • info@nubihar.com

Navnîşana Name û Nivîsan

P.K. 80 Fatih - İstanbul

Li ser navê Pak Ajans Yayıncılık Ltd. Şti. (adına) Xwedî û berpirsiyarê Nivîsaran
(Sahibi ve Yazı İşleri Müdürü)
Süleyman Çevik

Nünertîya Almanya
Burhan Kaya
kizilkaya_burhan@yahoo.de
Tel: 0234 - 890 74 10

Kovara **Nûbihar** ji 3 mehan carekê; serê Payizê, Serê Zivistanê,
serê Biharê û serê Havînê tê weşandin

Amadeyiya ji bo çapê
Nûbihar

Çapxane
Kilim Matbaacılık

Yayın Türü:
Yerel Süreli

Mesûlîyeta ramanên nivîsaran aîdê nivîskaran e.
Berhemên hatine şandin bi şûn de nayên vegerandin.

Berdêla abonetiya salane:
Tirkîye: 20 YTL (20.000.000 TL.)
Welatê din: 25 EURO, 30 \$

Jimareyên Hesaban:
Hundur Tirkîye: Postgîro (Posta Çeki H.) Süleyman Çevik: 658265
Dervê Tirkîye: Süleyman Çevik İşbankası Yavuz Selim Şubesi: 1079-30100-3118770.

Naverok

Li Cihana Îslamî Jana Guhertinê SÜLEYMAN ÇEVİK.....	5
Şaha kurd Deyfe Xatûn ÇANKURD	7
Di Sedsala Kurdan de Sedhejmarîya Nûbiharê AYHAN GEVERÎ.....	16
Hunera Folklorê Kurdî ZEYNELABIDÎN ZINAR.....	19
Bindestbûna Gel FERÎD ÎZOL.....	23
Desîsa Duyemîn SEÎDE NURSÎ.....	25
Ceribandineke Keşxe: LEYLname ERGÎN ÖPENGÎN	28
Mela Alî Germavî bi Bêdengî Wexer Kir TEHSÎN ÎBRAHÎM DOSKÎ.....	31
HUNER	
Bi Sabah Kara re Hevpeyvîn AYHAN GEVERÎ.....	33
Bûm Siwarê Xeyalan ABDULKADİR ÖNKOL	37
Xezel MEWLANA CELALEDDÎNÊ ROMÎ	38
Wek ku Gunehekî Xwe Veşêre FELAT DILGEŞ	40
Du Şêr Du Xezal HAMÎT GEYLANÎ	41
Pîpik BENJAMIN FRANKLÎN.....	42
Diçim GÜLISTAN ÇOBAN	43
Bi Şivan Perwer re Hevpeyvîn SALÎHÊ KEVIRBIRÎ	44
Raman û Hêvî BERHÎM PAŞA	51
Texmîs ABDULKADİR BİNGÖL.....	52
Kall Haco DİLŞAD MUTÎ.....	53

Evîn Şahê Hemî Welatan e CANKURD	57
Zirav û Tij FAHRETTİN İNCE	59
Lûleper ÖMER DILSOZ	60
dilketîyê te aniha çi mame? BAMED SERDAR	61
Nûbihar DİLŞAD MUTÎ	62
W.K Merdimîn ra Şîrî	63
Cu û merg OMER FARUK ÇETİNKAPLAN	64
Mewlid-Yûsif û Zelîxa - Qesîdeyê Kerbela ROŞAN LEZGÎN	65
Şûrê Qetlê li Milî Rehma Xwedê li Dilî Â. MERETOWAR	71
Rojhat û Berxika Sawa ROJBÎN ÖZKAN	74
Nûbihar RAÎFÊ BÊÇARE	76
Gorname MUAMMER ÖZKAN	77
Perwerda Zarokan MAMOSTE AMEDÎ	79
Evîna Wenda İZEDDİN QOSERÎ	80
Ji bo Edebîyata Trajîk Nimûneyeke Baş: Mijabad ZILKÎF XWEŞHÊVÎ	81
Jiyana Mirov û Şeveqa Serkeftinê MÛCTEBA BARAVÎ	88
Dar NAÎF ERGÜN	83
Rovî û Dîk SEYDA RONAHI	90
Ne Dihat Bîra Me Ji Hev Qetandin RUSTEM ZALL	91
Keda Şêx û Meşayîxên Me BAMED SERDAR	93
Ferhenga vê Hejmarê	95

Li Cîhana Îslamî Jana Guhertinê

SÜLEYMAN ÇEVİK

ceviksuleyman@hotmail.com

Roja îro nexweşî, tevlihevî, şer û pevçûnên li rûyê erdê bi piranî ji cîhana îslamî bilind dibin... Ji Fasê bigre hetanî Endonezyayê tevlihevî û aloziyên heyî, ev xelk tev perîşan kirine. Helbet ji vê perîşanîyê her xelk di eynî sewîyê de para xwe nastîne; di vê cîhanê de yên ku rewşa wan baş e û dixwazin ku ev halê kambax bi vî hawî bidome jî hene.

Di nav xelkên dunyayê de tu cîh biqasî vê cîhanê paş de nemaye. Di dunyayê de di nav sed cîhên paşdemayî de para pirtir ya dewlet û xelkên misliman e. Di warê edebiyatê, hiqûqê û zanînê de tu kesek tune ye ku di dunyayê de nav bide... Li cîhê teralî hebe ev dunya, ji xwe re xebatê nake adet... Li rojhilata navîn ma çi zêdeyîya Îsraîlê heye ku ew erdê beyar kirîye cîhê jîyanê û li dunyayê dewletek ku dilê meriv dibijîyê ava kirîye? Tu dewlet biqasî Îsraîlê qîmetê nade xelkê xwe jî. Li rojhilata navîn tenê li Îsraîlê parlamentoyek bi esasî heye, hîlbijartinên bi pirpartî û partîyên ku di nav hev de bi awayeke demokratîk iqtîdarê parve dikin hene...

Meriv layiq û talibê çi tiştî be ew tişt tê meriv peyda dike.

Îro li Ewrûpa, Amerîka û gelek deverên dunyayê ji dêvla şer û pevçûnê, kar û xebat heye. Evan kesana yektîya xwe çêkirine, îcadên nû dikin, dixebitin ku di her warî de jîyanek xweştir li ber xwe amade bikin...

Li hember vê xweşîya dunyaya rojava, cîhana îslamî di perîşanîyek bê mîsal de gelek caran jî gola xwînê ye!

Sebebên vê rewşa nebaş hene. Gelek sebeb tene ser hev û deriyên van nebaşîyan li ber me vedikin û vê kambaxîyê li ser pişt

xelkên belengaz bar dikin...

Îro em li hember vê kambaxîyê bêçare ne... Gelekên me jî di vê bêçaretîyê de mesûlîyetê davêjin stûyê hinekên din... Radibin dibêjin, sebebê vê rewşa me ya nebaş rojavayî, Ewrûpayî û dijminên îslamê ne ku naxwazî misliman bi pêş kevin û hwd... Helbet yek ji sebebên paşvemayîya me ev rojavayî ne, lêbelê ma tenê ew in? Helbet ev hêz û kes dixebitin ku misliman tim paş de bimînin û bi pêş nekevin. Ev tişteke normal e jî. Lewra berîya her tiştî dê ji bo xwe, ji bo fikra xwe, ji bo dîne xwe, ji bo mezhebê xwe û hwd. bixwaze... Pir caran dewletên hakim digel ewqas tiştên wan yek in, mensûbê eynî dîni ne, ew bi xwe jî bi hev nakin, tim dixwazin raqîbên xwe berteraf bikin...

Belê ew wisa difikirin û xêra mislimana naxwazî, lê ma misliman xêra hevûdu dixwazî? Cîhana ku di nav xwe de biratî û edaletê nehewîne, cîhana ku meseleyên xwe di nav hev de çareser neke, ma ji çi re ye? Îro di nav xelkên misliman de kî ji hevûdu hez dike? Şîî û Sunnî li cîhkî ne; kurd, tirk, ereb, fars, peştûn, belûcî li cîhkî ne...

Li vê cîhana îslamî guhertinek bingehî û esasî lazim e...

Li cîhê ku misliman rabin li derve li seban bigerin, bila pêşî xwe bikşînin hesabê. Sîyasetçî, âlim, serok welhasil kî di vê cîhanê de xwedîsoz e, bila ew hesab bide. Wê demê wê bête dîtin ku musebîbê vê rewşa me ya



► nebaş berîya her tiştî em bi xwe ne... Lewra kesek ji kesekî hez nake, xelkên misliman parçe parçe ne û tu kes xêra hevûdu naxwaze. Îro Kurd çil mîlyon nifûsa wan heye. Li rûyê erdê milletê herî mezin ê ku bê dewlet ew e. Di nav çar dewletên misliman de ewqas sal in di rewşeke gelek nebaş de jîyana xwe dewam kirine. Lê îro kesek tehemul nake ku piçeke rewşa kurdan jî baş bibe, bibin xwedî dewlet, bigihêjin heqên xwe... Meriv di malekê de birayên hevûdu be, lêbelê mîrasa bavê xwe bi edaletî parve neke, her tiştî ji xwe re bigre, birayên xwe ji wê mîrasê mahrûm bike. Ev çawa biratî ye, bila ehlê wîjdanê bersiva vê pirsê bide...

Ev çend sal in ku dema li cem hinekên ji cîhana îslamî der, bi taybetî jî li cem rojavayîyan behsa îslamê û mislimanan tête kirin, ew kesên ku bombeyan bi xwe ve dikin û diteqînin; hem xwe û hem jî bi xwe re gelek caran însanên masûm dikujin tête bîra wan... Xwekuştinên bi vî hawî jîbilî cîhana îslamî li kûderê hene? Ev çi fikr û îdeolojî ye ku ev însan ji vê xwedî dibin û îslamê bi vî hawî bi dunyayê didin nasandin?

Erişên 11 îlonê pêşî li Amerîkayê dest pêkir, paşê jî bi bombekirina Madrîd a Îspanyayê û London a Îngiltereyê dewam kir. Ev kirin bûn sebeb ku Ewrûpayî û Amerîkayîyên ku haya wan ji îslamê tunebû jî mislimanan bêhtir nefret bikin.

Di vê dema me de misliman bi îcadên xwe, bi pisporên xwe, bi hunermendên xwe, bi zanayên xwe, welhasil bi tiştên xwe yên baş û kêrî însaniyete bêtin neçûn cîhana rojavayê. Gelek rojavayîyan îslam û misliman bi kirinên terorê nas kirin. Lêbelê misliman bi sedsalan berê bi medenîyeta xwe çûne Endulusê, li welatên xwe medenîyet ava kirin. Di dema ku li Ewrûpayê şerên navxweyî hebûn li nav mislimanan jîyan biqasî vê demê bi kambaxî nebû. Her cîh gulgulîstan nebana jî biqasî Ewrûpa û rojhilat nexweşî tune bûn. Îro halê me û Ewrûpayê li ber çavanê...

Hûnê bibêjin, dibe ku li paş van kirinên

şiddetê misliman tunebin. Ma mislimanên ji bo van kirinan li çepikan dixin tune? Li Iraqê kesên dema însanan serjê dikin û "ellahu-ekber" dibêjin kî ne? Însanê bombeyan bi xwe ve girêdide û diteqîne ji kîjan dînî re xizmetê dike? Evê zîhnîyete çi daye mislimanan û îslamê?

Di van şert û mercan de kîjan kesê rojava xwe bi însanên dunya me nêzik dike?

Şefqet, merhemet, edalet, alîkarîya feqîr, belengaz û mezlûmên ji çi dînî dibe bila bibe... Ji dînên din re nîşandana musamahayê... Teşwîqkirina xwendina ilmê û hwd. Gelek xisûsiyeten baş hene ku îslam wan di nav xwe de dihebîne... Kesên ji dunyaya me der in, mixabin haya wan ji van tune...

Dema pêşiyê Hamasê leşkerek, li pey wê jî Hizbullahê du leşkerên Îsraîl rewandin; Îsraîlê jî li Lubnanê bombe barandin û kete hundirê wê... Di hundirê mehekê de ji hezarî zêdetir însan bi van erişên Îsraîlê hatine kuştin û nivê wan jî zarok û kesên masûm bûn... Ceng be jî usûleke wê heye, di cengê de dahî kuştina zarok û masûman sûc e... Îsraîl bi salan e ku di van erdan de dagirker e û li Filistinê jî bi salan e ku eynî tiştî dike. Li hember bombeyên Îsraîlê, mislimanan jî fuze û roket barandin bajar û gundên Îsraîlê... Îsraîl jî di tarîxa xwe de belkî tu carî rastî berxwedanek bi vî hawî/awayî jî nehatibû.


Ev şer, berîya şerê Îsraîl û Hizbullahê, şerê Amerîka û Suriyê û Îranê ye. Lewra li pişt Hizbullahê Îran û Suriyê heye, li pişt Îsraîlê jî Amerîka heye. Sîyaseta Amerîka û Îsraîlê, kirinên wan, menfeatên wan yek in... Îro li cîhana îslamî heznekirina Amerîkayê jî ji ber vê piştgirîya wê ya Îsraîlê ye...

Di vî şerê ku 32 rojan dewam kir de xwestinên Îsraîlê bi cîh nehatin. Îsraîlê ser û binê Lubnanê xirab kir, lê li hember berxwedana mislimana jî nikaribû pêş de biçe. Mecbûren piştî mehekê agirbest qebûl kir û şerê navbera herdu hêlan jî 14 tebaxê pêve kete merhaleke din. Yekitîya Netewan niha hêzên aştîyê dişîne navbera herdu hêlan û ji vir pêve çi dibe ne kifş e. Heger careke din şer dest pê bike, ihtîmal e şer rasterast Suriyê û Îranê jî bigre nav xwe. Wê demê wê şer bi wan tenê nemîne û gellek malên din jî bişewitîne... ■

Şaha kurd Deyfe Xatûn

CANKURD

Paş koçkirina sultanê serkeftî, Yûsif kurê Şadî yê ku bi "Selaheddînê Eyûbî" navdar e, di sala 588ê koçî de, şahdarîya wî ya, ku welatên Şam (Sûriye, Lubnan, Flistîn û Urdun), Misir, Sûdan, Hîcaz, Yemen û tevparek mezina Kurdîstanê girtibû, di navbera pênc kurên wî û birayê wî de hat parvekirin. Birayê wî bi Şahê Dadmend "el-Melik el-Adil" navdar e.



Dewleta Eyûbî di sedsala duwanzdehê Zayîni de (deverên xêzkirî)

Di dewleta Eyûbî de hinde xatûnên Kurd ên pir bi nav û deng di dîroka musulmanan de hene, bi çand û zanîn û wêjevanî û bi

destbolîya xwe di her warekî qenciye de hatine nasîn û dîroknasên musulmanan pesna wan di gelek pirtûkan de didin. Ji wan herdu xûşkên sultanê serkeftî, Selaheddînê Eyûbî, yek bi Rebie' Xatûn û ya di bi Zumrud Xatûn hatibûn navkirin. Feqîya navdar Şemsilmiluk Xatûn, padişaha Hemayê Xaziye Xatûn, padişaha Misirê Secretudurr, ku di dîrokê de bi sultana Ereb û Eceman hatibû navkirin, û padişaha Helebê, Deyfe Xatûn.



Kelaha Qahîrê

Deyfe Xatûn a ku em di vir de li ser wê dipeyivin, dota "qîza" Şahê Dadmend û birazîya Selaheddîn e.

Bavê wê mirovekî mucahîd, dilfireh û destbol bû. Di sala xelê "bircîbûna giştî" de

➤ li Misirê pir pere li nav gel belav kirin, bi birayê xwe re çûbû pir cengan û wek qehremanekî hatibû naskirin. Pir hajê xwarin û saxîya xwe dikir, lê ji ber ku wî gelek sîrone dixwar, nexweşiyên wî jî hebûn. Dema biharê ji ber kulîlkan difna wî diêşa. Ji Şamê diçû Misirê û paş biharê vedigerîya. Roja koçkirina wî di 75 salîyê de bû, ji 300.000 ne kêmtir mirov bi pey darbesta wî ketibûn. Li şûn xwe şanzdeh kur hêlan, ji wan:

- Şahê Misirê (el-Kamil)
- Şahê Şamê (el-Eşref)
- Şahê Cizîrê û bakurê Sûriyê (el-Salih)
- Şahê Ruhayê (el-Muzeffer)
- Şahê keleha Cihberê (el-Hafiz)...

Ji dotên wî jî:

- Deyfe Xatûn
- Xazîye Xatûn
- Zehre Xatûn
- Melîke Xatûn
- Muînise (Ismetudîn) Xatûn...

Deyfe Xatûn sala 1186 z. li keleha Helebê ji dayîk bûye. Keleha Helebê di destê bavê wê de bû, pişt re sultanê serkeftî Selaheddîne Eyûbî keleh ji dest birayê xwe girt û da dest kurê xwe el-Melik el-Zahir. Deyfe Xatûn ji kurê xwe el-Melik el-Zahir re xwest û anî. Ji Deyfe Xatûn re (el-Şitri'l'alî) digotin, weku paşê li ba Osmanîyan jî (el-Babul'alî) peyda bûye.

Ev kurê Selaheddîn mirovekî çeleng û jîr û jêhatî bû. Di navbera apê xwe el-Melik el-Adil û şahên herêm û kelehên di de listikek diplomatî ya mezin dilîst. Hem apê wî û hem jî wan şahan ew ji xwe re wek alîgek "alîkarek" an navberekî çalak didîtin.

Lê berî wê yekê, Xazîye Xatûn, xûşka Deyfe Xatûnê, li padîşahê Helebê hatibû

markirin. Paş ku wê koç kir dîyarê rehmetê, Deyfe Xatûna 25 salî ji wî re anîn.

Hîngê bûk li ba bavê xwe bû, li Misirê. El-Melik el-Zahir ji Helebê çû Şamê bo silavîya bûka xwe bike. Qelenê wê 50.000 Dînarên zêrîn bû, cihêzê wê jî barê 300 deve û 50 qantiran bû. El-Melik el-Zahir 5 gerdenên durreyan şeva derbasbûnê bi histoyê wê xistin, ku bihayê wan 350.000 Dirhem bû. Ew dawet û bûkanîna wilo bi nav û deng sala 1212ê Z. bû.



Kela Helebê


Paş salekê kurê wê el-Melik el-Ezîz ji dayik bû. Tevîya Helebê du mehan di xemlê de ma, xewanên xwarinê li her qedek bajêr roj bi roj dihatin danîn. Şayîyek mezin û demdirêj çêbû, pir zêr û zîv, yaqût û durre bi kurik xistin.

Paş ku mêrê wê el-Melik el-Zahir 30 salî deselatdarî kir, sala 1216ê nexweşîya wî xort bû, peyrew û serleşkerêd xwe li dora xwe civandin, ku ji kurê wî re dilsozîya xwe sond bixun. Di nav wan de bavpîrê zarokê wî yê sê salî el-Melik el-Fadil û xalê wî el-Melik el-Eşref jî hebûn.

Gava el-Melik el-Zahir koç kirîye dîyarê rehmetê, termê wî bi dizî hatîye veşartin, û ta roja îro kes nizane gora wî padîşahî li kîderê ye. Wî malbatek mezin ji bira, birazîyan, kur û nevîyan li şûn xwe hîşt, ne kêmtir ji 150 kesan. Xelkê bajêr gelek ji wî razî bûn, û bi taybetî ji ber ku wî qenalek pir hêja û kirêckirî ji dûr ve bo anîna avê ji Helebê re kêşa bû.

Paş du salan, di sala 1218ê de bavê Deyfe Xatûnê, el-Melik el-Adil jî çû dîyarê rehmetê. Ew li ser rêya Şamê mir. Birayê Dey-

fe Xatûnê, el-Melik el-Kamil cîyê bavê xwe girt, navê xwe û yê xarziyê xwe el-Melik el-Ezîz li ser pereyên Helebê da neqîşandinê.



Pereyên Selaheddîn Eyûbî, sala 586ê hicrî, ku li ser alîyekî stêrka pêxember Dawûd heye


Di dema el-Melik el-Kamil de peymanek di navbera wî û Xaçperestan de hat morkirin, û bi wê yekê Qudsa, ku apê wî sultanê serkeftî el-Nasir Selaheddîn Eyûbî û bavê wî el-Melik el-Adil bi darê zorê û paş gelek cengan vekirine, carek dî ket destê Xaçperestan, tenha camîya el-Eqsa û zinarê Mîrîracê di destê musulmanan de ma. Paş mirina wî, sira Deyfe Xatûnê di deselatdarîya Helebê de hat.

Kurê wê el-Melik el-Ezîz bû şahê Helebê. Dema ew bûye padîşah hîn 17 salî bû. Ew bi zûkî bû bavê kurekî bi navê "Selaheddînê duwemîn". Kar û barê deselatdarîya xwe baş kir, dêrîna "mulkê" xwe ji dest Etabegan stand û destê wan ji ser xwe rakir. Mixabin, di 24 salîya xwe de, paş 7 salên padîşahiye, di sala 1236ê de koç kir dîyarê dilovanîyê. Lêbelê berî mirinê peyrew û merivên xwe dan sondkirinê ku wê kurê wî Selaheddînê duwemîn, bibe padîşahê wan li Helebê. Paş ku kurê wê jî koç kir dîyarê rehmetê, neviyê wî yê, ku mafê şahanî bo wî hebû, hîn heft salî bû. Ji ber vê yekê Deyfe Xatûna, ku hîngê bûbû 50 salî, kirin padîşaha Helebê, ta lawik mezin dibe.

Deyfe Xatûnê deselatdarîya Helebê û derdora wê şeş salan kir. Rêformek diravî û zanyarî xiste sistema xûkê "pacê". Rêzgirtin û giranbihayî li hember zanyarên olî û dînyayî da xuyakirin, û ji ber ku ew hozan-

vaneka jêhatî bû, wê gelek pere li dibistanan rijandin, û du zankoyên bi navê xangeh "xwendegeh" li Helebê li taxa Ferafire, ku bi navên el-Nasîriye û Firdews berî niha bi 800 sal ava kirin, û jê re hoste, feqe û zanyarên bi navûdeng civandin. Ji xwe di dewleta Eyûbîyan de cîyê zanayan, hosteyên dibistanan, zankowan û camîyên, ku têde îzan û zanîn dihatin belavkirin, pir bilind bû.

Di wan 6 salan de, têkilîyên xwe yên diplomatî bi padîşahên Hema, Hums, Şam û Kurdistanê re xurt kirin. Bi taybet li gel padîşahên Kurd û Selcûqîyan, bi el-Melik el-Muzeffer, el-Mucahêd, el-Eşref û Keyxisro re giha bû peymanên nivisandî ji bo alîkarîkirina hev di têkoşîna li hember Xaçperestan, Xewarizmîyan û hêrişkerên Mongolî de. Deyfe Xatûnê şeş salan bê westan têkoşîn û xebatek wêrek li hember hêrişkaran kir. Temenê dewleta Eyûbîyan bi jîrbûna xwe dirêjtir kir.



Hem li ser pereyên el-Melik el-Adil û hem jî li ser yên Selaheddîn wênayan jinan hebûn

Di sala 1219ê Z. de, Mongolan bi serkêşîya Cengîz Xan hêrişa xwe ya xwînî bi ser Buxara û Semerqendê de anîn, qirkirinên kesnedîtî û kesnebihîstî di rê de kirin, bajarên musulmanan wêran kirin, li hezaran xangeh, camî û dibistan, tevî pirtûk û zanayan sotandin, talanek hovbaz a ku di dîroka mirovatîyê de ta niha li ser zimanan wek bê wekanî tê dîtin. Di wê demê de hemî mîrni-

➤ şîn û xudan keleh lerizîn û kabêd mêr û qehremanan sist bûn. Lêbelê Deyfe Xatûnê serê xwe li ber vê lehîya agirî neçemand.

Sala 1226ê Z. Cengîz Xan geber bû, piçekî hêrişên Mongolan kêm û jar bûn, lê paş 4 salan dîsa bi harbûnek bê wekanî di bin alayên Sarûxan, Kîsloxan û Berdîxan de, hêriş û talan anîn ser dewleta Xuwarizman, ew kavil kirin û berê xwe dan Selcûqîyan jî...Wek agirêkî bi zevîyên havînê keve, wilo Mongol ber bi rojava ve hatin.

Demê Mongol gihane ava Ferêt, kela Cihberê tarûmar kirin, xelkê wê qirkirin û tirs xistin hinava gelên herêmê. Leşkerê Deyfe Xatûnê belav bûbû, hinek çûbûn alîkariya keleha Cihberê, hinek jî çûbûn kelehên Sîrez û Harimê.

Mongolan bi asanî rêya xwe ber bi Helebê ve kudandin.

Mîrê Ereban Elî Bin Hedîse ku neyartîya Kurdan dikir, bû alîgirê Mongolên, ku li wan derdorên bi 12000 suwar û peya bûn. Wilo hejmara wan hîn mestir û bi hêztir bû. Li hember wan el-Melîk el-Mu'azzem Tûranşahê Eyûbî bi leşkerekî ji 1500 kesan li derveyî keleha Helebê çavrêya wan dikir. Sala 1240 Z. bû, hîngê pevçûnek xwînî ya mezin û demdirêj çêbû, Mongol û Ereban tevî ku deh caran jî Kurd û Helebîyan pirtir bûn, nema dikarîn xwe ragirin, ji qada cengê bazdan û revîyan. Lê mîrê ereb ê xiniz Elî Bin Hedîse ji nişka ve û ji paş ve hêriş ser leşkerê Helebê kir û xwe gihand Tûranşahê ku gelek birîndar bûbû, ew û birayê wî Nusretuddîn girtin û piraniya leşkerê wî mehf kirin, du şehzadeyên kurd, kurê el-Melîk el-Fadil û yê el-Melîk el-Zahir û hinek mezinên bajêr di nav wan de bûn.

Di Helebê de tenha 200 suwar man. Serkêşên wan Şehzade Şemsiddîn Lolo û Izzid-

dîn Mecla bûn. Herdu şehzadeyên wêrek bi wan suwaran bi fermana Deyfe Xatûnê ji bajêr derdiketin û li hîsta kelehê nûçeyên neyaran dicivandin, fermanên Deyfe Xatûnê bo gundîyan belav dikirin, ji xelkê dixwestin, ku bî Helebê, xwe di kelehê de bi cih bikin, da xwe ji qirkirin, talan û hovîtîya Mongolan biparêzin.

Carcaran jî bi Mongolan re diketin ceng û pevçûnên xwînî. Mongolan li Çiyayê Lelûn, Ezazê, Babê, Bizae', Munbicê û bajarokên dî yê li nêzîka Helebê tev wêran kirin, gel qir kirin, namûsa jin û keçên ku xwe di camîyan de veşartine di wan camîyan de şikandin û gelek ji wan destegîr kirin, bi xwe re birin. Tê gotin, ku zarokên şîrmij jî hembêza dayikan diavêtin û paş ku namûsa dayikan dişkandin, ew şîrmij dikuştin û dayik li pey xwe dixuşandin dibirin an jî dikuştin.



Keleha Selaheddîn li Sînayê

Nûçeya şikestina leşkerê Helebê giha padîşahê Humsê, el-Melîk el-Mensûr, yekser dora 1000 suwarî jî leşkerê xwe û jî leşkerê Şamî yê li ba wî bû civand ser hev û berê xwe da Helebê, li taxa Hezaze ya niha danîşt. Deyfe Xatûn çû silavîya wî û bi hatina dilşad bû.

Deyfe Xatûnê bizavek diplomatî kir bo ji hevçûna Ereban. Hîngê Mongol li Heranê civîya bûn û biryara xwe dabûn ku bavêjin ser Helebê. Deyfe Xatûnê şêxê Ereban Zahir Bin Ghannam jî xwe ve nêz kir, çend carîye jî carîyên xwe û hinek zevî danê, rêza Ereban kir dupar. Elî Bin Hedîse jî li têkilîya

xwe bi Mongolan re poşman bûbû, ji wan bi dûr ketibû.

Hêrîşkar di çemê Ferêt re derbas bûn û xwe gihandin bajarokê Reqqê. El-Melik el-Mensûr kona xwe ya şahanî li herêma Neyreb û Cibrînê vegirt. Erebb û Mongolan li herêma Cebûl û Dêr Hafirê ketibû qirka hevdû. Mongolan avêt ser Sermîn û Mee'retulnu'man, Kefer Tab û Şîrezê, wek nalek mezin leşkerêd wan li herêmên dora Helebê belav bûbûn. Berê xwe dan bajarokên Hemayê, Selemîyê û Reşafê jî. Di bin tiştên talankirî de êdî westîya bûn, hêdî hêdî dilivîyan. El-Melik el-Mensûr û bi wî re leşkerê Deyfe Xatûnê yê mayî gihan Siffînê û rêya vegera wan ber bi Reqqê ve girtin. Erebb bi civandina tişt û pertalên, ku di şeran de li şûn Mongolan diman, mijûl bûbûn. Eyûbîyan zora leşkerê hêrîşkaran bir, Mongol ber bi Heranê revîyan, gelek ji pez û jinên ku bi zorê li gel xwe biribûn li şûn xwe hiştin. Mongol ji Heranê jî ji ber Eyûbîyan revîyan, di şevêk tarî de lehîya avê bi ser wan de hat û gelek ji wan di çemê Ferêt de bi lêda çûn, geber bûn, dest ji jin û zarok û malê ku talan kiribûn, berdan.

Li bajarê Helebê û li tevîya kelehên dî yên musulmanan bû şayî. Leşkerê Eyûbîyan serkeftî vegerîyan, weku çawa ji cengên li hember Xaçperestan berê vedigerîyan.

Heran, Sirûc, Reha, Serê Kanîyê û Reqqe ketin bin destê Deyfe Xatûnê.

Di wê navê de el-Melik el-Hafîz, kurê el-Melik Adil, li keleha Ezazê koç kir dîyarê rehetê, xûska wî Deyfe Xatûn, termê wî anî Helebê û li Firdews hat veşartin.

Ji alîyekî dî ve birayê Deyfe Xatûnê, el-Melik el-Kamil ku padîşahê Misirê bû, her dixwest, ku hêrîşê bine ser Şam û Helebê bi mebesta yekkirina dewleta Eyûbîyan di bin destê xwe de. Dibe jî ew ditirsîya, ku paşketina Heleb û Şamê wê Mongol hêrîşê binin ser Misirê. Lê belê Deyfe Xatûnê bi diplomasiya xwe kanî bû ew ji wê sewdê bixis-

ta û nehiştta ew bavêje ser Şam û Helebê.



*Çavê Selahedîn yê rastê birin bûye.
Lewra ne wek yê dî di wêneyê de hatîye*

Di wan 6 salan de hinek xêrnexwazan jî her û her bizava xwe kirin, da Deyfe Xatûnê ji ser textê şahanî bavêjin. Yek ji wan mîrê Şîrezê bû, li nêzîka Hemayê, Şîhabuddînê Eyûbî bû. Wî bi tenê xwe nikanîbû tişteki bike, lewra şandîyek şand ba padîşahê Şamê, el-Melik el-Eşref, û gibûs wî kir, ku tevîya mîrên derdora Helebê dixwazin xwe ji bindestîya Deyfe Xatûnê azad bikin û ewan li padîshahekî hêzdar digerin. Gava el-Melik el-Eşref Helebê bistînê, wê hemî alîkarîya wî ya leşkerî û diravî bikin. Xudanê keleha Şîrezê jî bi xwe amadeye, ku di bin serokahiya el-Melik el-Eşref de deselatdariya Helebê bi rê ve bibe. Padîşahê Şamê el-Melik el-Eşref bersiv dayê, ku ew xinizîyê bi malbat û pişt û neviyên el-Melik el-Zahir ê Eyûbî nake.

Gava Deyfe Xatûnê ew xinizîya Şîhabuddîn bihîstîye, yekser leşker şand ser keleha wî, ew girt û riha wî rêş kir. Di wê demê de rêskirina riha mêrekî nizimkîrin û cersîyek mezin bû, bi zûkî li hemî welatan wek nûçeyek birûskî belav dibû.

Şîhabuddîn û peyrewên wî di keleha Helebê de hatin zîndankirin, mal û dêrînen



➤ wan jî ji dest wan hatin derxistin.



Weku em dibînin, bi kulehê Selaheddîn û bi ser cilên wî ve zêr û cewher nînin

Li hember Xaçperestan jî helwesta Deyfe Xatûnê her req û hişk bû. Carekê suwarên Aldawîye hêrîşî ser pezên musulmanan kirin û talan kirin, serleşkerê Helebê ku jê re el-Melîk el-Muee'zzem digotin, yekser avêt ser wan, leşkerê Aldawîye tertbelav kir, gelek ji wan kuştin, serfîyên wan birrîn û li gel destegîran anîn Helebê. Destegîr di keleha Helebê de hatin zîndankirin û dawî ewan daxistin keleha li xarê di xendeqê de. Tîrsek mezin xist dilên suwarên filehan, ku nema carek di talanê bînin ser pez û dewarên musulmanan li derdora Helebê.

Padişahê Şamê, el-Melîk el-Eşref, di sala 1237ê Z. de nexweş ket, weseka wî ew bû, ku birayê wî el-Melîk el-Salih li şûna wî bibê padişahê Şamê. Gava koç kirîye dîyarê rehmetê padişahê Misirê, el-Melîk el-Kamil, çav berdan dêrîn û text û taca Şamê û ji bo standina wan berê xwe da Şamê. Keleha Şamê xist damê "hesarê".

Deyfe Xatûnê berî hatina birayê wê ji Misirê alîkarî bo xelkê Şamê şandibû, û bi wê re jî padişahê Humsê, el-Melîk el-Mensûrê Eyûbî, alîkarîya Şamê dikir. Paş demekê wî raya xwe guhart û bû alîgê/alîkarê hê-

rîşkarên ji Misirê hatine.

Padişahê Şamê yê nû, el-Melîk el-Salihê Eyûbî, ku cîyê birayê xwe yê rehmetî girtîye, çare li damekirina keleha xwe nedît, binzor bû, ku deselatdarîya Şamê ji hêrîşkaran re bihêle. El-Melîk el-Kamil xwe bi wê yekê hêzdartir dît û biryar da bo standina Helebê jî. Deyfe Xatûnê jî çare li hember zora ku ji başûr ve hatîye nedît. Rabû alîkarî ji padişahê Selcûqî xwest. Lê alîkarîya wî hêzek biçûk bû, hema sozên wî mezin bûn.

Di wê navê de, el-Melîk el-Kamil nexweş ket û sala 1237ê Z. di keleha Şamê de koç kir dîyarê rehmetê. Şahdarîya wî bi mirina wî re dupar bû, Şam û Misir ji hev cihê bûn. Dewleta Eyûbîyan ket delavê parçebûn û jarbûnê.

Deyfe Xatûnê têkilîya xwe ya ramyarî bi padişahê Selcûqî re xurt kir. Wê hêla ku neviyê wê el-Melîk el-Salih û padişahê Selcûqîyan xûşkan bi hev biguherin.

Dîyar e ku peymanan jinanînê ne li Helebê bû, li Qeyserîyê bû, ku navenda welatê Romê bû. Gelek zêr û zîv û pere bo wê yekê hatibûn dayîn û belavkirin, hem li Qeyserîyê û hem li Helebê şayînên mezin hatibûn çêkirin.

Em dibînin, ku padişahê Şamê, el-Melîk el-Salih, xwe wek peyrewekî li ber Deyfe Xatûnê dida nasîn, û el-Melîk el-Hafiz, xudanê keleha Cihberê (Cee'ber), dema felicîye, ji tîrsa ku kurêd wî serî li wî hildin, ji xûşka xwe, Deyfe Xatûnê xwestîye, ku kehelek di li cîyê keleha Cihberê û Balîsê bide wî. Wê biryar da, ku keleha Ezazê, li bakurê rojavayê Helebê bide wî.

Sala 1242 Z., di 59 salîya wê de, nexweşîya Deyfe Xatûnê giran bûbû. Rovikên wê kul bûbûn. Nema toxtiran dikarî bûn çareyekê lê bibînin. Deyfe Xatûnê koç kir dîyarê rehmetê. Dergehên kelehê 3 rojan hatin girtin, gel xemgîn û dilsoj bû.

Termê wê di hucreyê de li nêzik gora bavê wê yê navdar, el-Melîk el-Adil, şahê dadmend, hat veşartin.

Nevîyê wê, el-Melîk el-Nasir ê ku 13 salî bû şûna wê girt, du şewirdaran, Cemaludawle Îqbal û Wezîrê Qeftî alîkarîya wî di deselatîyê de kirin. Ji ber dilnermîya wî êdî kesek nedihat kuştin, çî dizker û çî kuşter. Tê gotin, ku gava kuşterek dihanîn ber wî, digot: "Yê jîndar ji yê mirî çêtir e." û ew berdida. Wek dîyar dibe, ew hozanvan bû, hinek helbestên wî bi Erebi hebûn û li dora wî gelek hozanvan hebûn. Dibêjin ku di aşxaneyaya wî de her roj bi sedan pez dihatin serjêkirin, kelandin û biraştin û goştê wan dihat belavkirin. Di rojên Dusem û Pêncşemê de deriyê wî ji gilîyan re vekirî bû, guhdarîya xelkê dikir û bi dadmendî deselatdarîya xwe bi rê ve dibir. Di bin destê wî de şahdarîya Helebê firehtir bû, Hums û Şam û Mêrdîn û Mûsilê jî bûn parek ji dêrîna wî an jî di bin sîya wî de bûn. Hêrîş ser Misirê jî kir, lê bi serneket, vegerîya Şamê û dora 10 salan deselatdarîya wî ma.

Mixabin hêrîşên Mongolan kêma nebûn, vê carê Holako hêrîş ajot ser Rojhilata Navîn. El-Melîk el-Nasir hat girtin, ew birin ba Holako, pêşîn pir baş û hêja comerdî jê re kir û dawî ew da kuştin. Ala Eyûbîyan daket, stêrka wan rijîya û agirê wan ê bêtir ji 100 salî gurr û hêgin bû, bi hêrîşa hov a Mongolan hat vemirandin.

Ta roja îro navê Deyfe Xatûn di pirtûkên dîroka îslamî de, wek jinek hêzdar, serbixwe, diplomat û hezkirîya wêjevanîyê, avakirinê û dadmendîyê, hatîye neqîşkirin, mixabin, li ba Kurdan ev stêrka bi rohnî di dîroka jînan de nehatîye nasîn an kêma hatîye nasîn. Berî wan jinên Ewrûpî, ku navên wan li ser zimanên dîroknanan in, divê navê Deyfe Xatûnê di serî de ba. Lê gava em li mirovên xwe yê navdar xudan dernekevin, ma wê kî vî karî bike? Jinek wilo xudan deselatî, hem li hember Xaçperestan, hem li hember Mongolan û hem jî li hember neyarên xiniz ên hundirî, bi xebatek wilo mezin rabe, pêwîste li ba me Kurdan navê wê bi zêr bête nivîsandin.

Hinek navdarên Kurdên Eyûbî:

Ismetudîn dota Şahînşah kurê Eyûb (el-Şit el-'Ezra) (1141 Z. koç kir.)

Xudana dibistana el-'Ezrawîye ye ku li Şamê ava kiribû jibo feqehên Henefî û Şaffî', dema koç kirîye dîyarê rehmetê, ew di dibistana wê de definandin.

Şêrkoh kurê Şadî yê Eyûbî (1169 Z. koç kir.)

Şêrkoh kurê Şadî kurê Merwan, ku wek el-Melîk el-Mensûr hatîye navkirin. Serkêşê Kurdan bû li Misrê. Di dema sultan Nûridîn kurê Mehmûdê Zengî de, li Til Beste Xaçperest şikandin. Bû wezîrê padîşahê fatimî el-Melîk el-Adil li Misirê. Apê sultanê serkeftî Selaheddînê Eyûbî ye. Ji nişka ve sala 1169ê Z. li Qahîrê koçî dîyarê rehmetê kir û li wir jî hat definandin.

Ismetudîn Xatûn (sala 1183 Z. koç kir.)

Ismetudîn Xatûn dota mîr Muî'nuddîn e, paş mirina mêrê wê yê yekem şah Nûreddîn ê şehîd, Selaheddînê Eyûbî ji xwe re anî. Ew jin gelek oldar bû, li Şamê dibistana el-Henefîye ava kir, û navendek bo sofîyan û gelek weqfên xêrê li şûn xwe hiştin.

Teqiyêdîn Şahînşah Omerê Eyûbî (1191 Z. koç kir.)

Omer kurê Şahînşah Eyûb (el-Muzeffar), xudanê bajarê Hemayê bû. Ji sala 1186ê ta 1191ê Z. deshelatdarî li wir kir. Bîrazîyê sultanê serkeftî Selaheddînê Eyûbî bû. Di cengên li hember Xaçperestan de wek mêrekî wêrek hat nasîn. Li cîyê apê xwe demekê serkarê Misirê bû. Keleha Melazkurdê dame kir, û li ber dergêhê wê jîna xwe ji dest da, di sala 1191ê Z. de.



► **Sultanê serkeftî Selaheddînê Eyûbî** (1193 koç kir.)

Yûsif kurê Eyûb kurê Sadî ye (1137 -1193 Z.), avakarê Dewleta Eyûbî ye. Ji sala 1174ê de ta bi sala 1193ê Z., deshelatdarîya wî piraniya Kurdîstanê, Şamê (Sûrîye, Lubnan, Urdun û Filistîn), Misirê, ta bi Hîcaz û Yemen û Sûdanê, dewleta wî girtibû. Yek ji navdartirîn padîşahên cihanê ye, bi dadmendî, qehremanî û nêrînên xwe yê şarîstani. Bû wezîrê şahê Misirê el-Melîk el-Adil, pişt re dewleta Fatimîyan ji ser hev belav kir û bi xwe bû padîşahê Misirê, lê serkoha ya xelîfeyê Bexdadê sala 1171 Z. pejirand. Li nêzîka Humsê Zengî şikandin, Sûrîye û Mûsil stand, Teberîya ji dest Xaçperestan girt, ewan di gelek cengan de binve kirin. Li Hitîne hemî hêzên Xaçperestan li hember leşkerê wî civîyan, lê dîsa jî tev şikandin di sala 1187ê Z. de. Quds vekir û padîşahê wê yê file destegîr kir, pişt re li gel Xaçperestan peymanek aştîyê morkir û di navbera wan û Musilmanan de astî pêda kir.

Sittişam (1218 Z. koç kir.)

Sittişam, xuşka sultanê serkeftî Selaheddînê Eyûbî ye, jina Mihemmed kurê Eseddîdîn Şêrkoh e, gelek comerd û destbol bû, hersal bi hezaran Dînar derman û avjong li hejara belav dikir. Her pîrskarek dikarî biçûya ber derîyê wê û daxwaza xwe bikira, wê gelek komele û weqfên xêrê li Şamê û li derin dî vekirin.

El-Adilê yekemîn kurê Eyûb (1218 Z. koç kir.)

Mihemmed Kurê Eyûb kurê Şadî (1145-1218 Z.), cigirê Selaheddînê Eyûbî ye li Misirê û walîyê Helebê ye. Di navbera 1199ê û 1218ê Z. de padîşahê Misirê bû. Dawî wela-tên Şamê, Ermîniya û Yemen jî tev li dêrîna xwe kir. Di dema deshelatdarîya wî de desteya Ismaîlî li Misirê jar bû, paş ku gelek kes

ji wan girtin û avêtin zindanê. Dema ku xwe li Şamê bo cengê li hember Xaçperestan amade dikir koç kir dîyarê rehmetê. Ji şopên wî dibistana el-Adil e li Şamê.

El-Eşref Mûsa kurê Mihemmed el-Adil (1182-1237 Z.) Bû padîşahê Ruhayê, pişt re Heran jî ket bin destê wî. Di zikê 9 salan de Sincar û Xapûr û Nuseybîn jî ketin nav dêrîna wî, paş ku birayê wî Eyûb koç kirîyê dîyarê rehmetê Xelat û Meya-Farqîn û derdora wê jî di nav du salan de bûn yê wî. Hinek ji dêrîna xwe da pismamê xwe û li şûna wê Şam sala di ber de ji wî girt. Deshelatdarîya wî di navbera (1229 û 1237 Z.) de bû.

El-Kamil Kurê Mihemmedê Eyûbî yê yekemîn (1238 Z. koç kir.)

Mihemmed (el-Kamil) kurê Mihemmed (el-Adil ê yekemîn) kurê Eyûb (1180-1238 Z.), bû cigirê bavê xwe li Misirê, lê paş ku bavê wî koç kir dîyarê rehmetê, wî serxwebûna dewleta xwe xuya kir, ji sala 1218ê Z. de ta bi mirîna xwe padîşah bû.

Avêt ser Heranê, Ruhayê, Sirûcê, Reqqê, Amedê, Kela Kîfa û Şamê, û kurê wî Masûd sala 1225ê Z. Mekkê girt destê xwe. El-Kamil li Şamê mir û di keleha wê de hat veşartin. Ji bermayên xebatên wî yê bo zanîne dibistan Kamilî ye li Misirê.

Şêrkohê duwemîn (1239 Z. koç kir.)

Şêrkohê duwemîn Kurê Mihemmed kurê Şêrkoh e (1173-1239 Z.) Bi nave (el-Melîk el-Mucahêd Eseddîdîn) hatiye nasîn. Wek bav û bavpîrê xwe xudanê bajarê Humsê bû li navenda Sûrîyê. Ew jî mirovekî wêrek bû, bi taybetî di cenga Dimyatê de li Misirê (1221 Z.) navdar bû. Di zanîna olî de jî navekî wî hebû û destûra wî wek hedîsbêjekî ji hinek zanayên Şam û Misirê hebû.

Deyfe Xatûn (1242 Z. koç kir.)

Deyfe Xatûn dota el-Melîk el-Adil kurê Eyûb e, ew jina el-Melîk el-Zahir kurê sultanê serkeftî Selaheddînê Eyûbî ye. Paş mirîna mêrê xwe, hîngê kurê wê piçûk bû, ew bi xwe bû padîşaha Helebê û pişt re

dewleta xwe firehtir kir. Şeş salan deshelatdarî bi şeweyekî baş kir, hêrişên Mongolan û Xaçperestan ji ser şahdarîya xwe vegerandin. Li Helebê hat definandin û ji şopên wê Dibistana el-Firdews û Xangeh e.

el-Muzeffar Mehmûd ê yekemîn (1244 Z. koç kir.)

Mehmûd kurê Mihemmed ê (el-Mensûr), ku Omerê (el-Muzeffar) (1202-1244 Z.) Xudanê Hemayê (Ji sala 1230ê ta bi 1244 Z.), paş ku deselatî ji dest birayê wî Qilîç Arslan (el-Nasir) hat derxistin. Ta mirina xwe ma deshelatdarê Hemayê. Li ser wî tê gotin ku mirovekî comerd û wêrek û zanînperwer bû.

el-Salih Necmiddîn Eyûb (1249 Z. koç kir.)

Eyûb (el-Melik el-Salihê kurê el-Melik el-Kamil (1206-1249 Z.) du caran bûye padîşahê Şamê û bi hêzdarî deshelatdarîya xwe bi rê ve birîye, carekê (1229 Z.) û cara dî (1245 ta 1249 Z.) Di 43 salîya jîna xwe de bi nexweşîya wêranê mir li Misirê (el-Mensûre), dema ku ew ji Şamê çûye Misirê, da hêrişê Xaçperestan li Dimyatê rawestîne. Termê wî rakirin birin li Qahîre definandin. Keleha er-Rewde li Qahîre di saya wî de hat avakirin.

El-Mue'zzem Tûranşah (1250 Z.)

Tûranşah kurê Necmiddîn Eyûb e. Sala 1250 Z. koç kir dîyarê rehmetê. Sultanê Eyûbî yê tewr dawî ye li Misirê (1249-1250 Z.). Ew li keleha Kîfa demekê cîgirê bavê xwe bû, dawî neviyên wî deshelatdarî li wê kehê kirin. Ketibû gelek cengan li hember Xaçperestan û bajarokê Dimyatê li Misirê ji destê wan derxist. Li Farskorê bi destê Memalikên deryayî hat kuştin.

el-Mue'zzem Isayê Eyûbî (1250 Z. koç kir.)

Îsa kurê Mihemmed kurê Eyûb, ku bi el-Mue'zzem hatibû navkirin sala 1250 Z. koç kirîye dîyarê rehmetê. Di navbera salên (1218-1227 Z.) de sultanê Şamê bû û zanîyarekî mezin bû. Gava cengê dest pêdikir,

ew berî leşkerê xwe derdiket meydanê. Yek ji pirtûkên wî bi "el-Şehmul musîb firreddî e'la İbnîlxetîb" e.

Şeceretudurr (1257 Z. koç kir.)

Şeceretudurr, kebanîya el-Melik el-Salih Necmiddîn Eyûb e. Paş mirina wê û kuştina kurê wê Tûranşah, ew bû padîşaha Misirê. Wezîrê xwe İzeddîn İlbek, avakarê dewleta Memalikên, li xwe mar kir, mêrê xwe kir sultan lîbelê deshelatdarî bi rastî di destê wê de bû. Yek ji navdartirîn jinên Kurd e di dîrokê de.

el-Eşref Mûsa kurê İbrahîm (1263 Z. koç kir.)

Mûsa (el-Eşref) kurê İbrahîm (el-Mensûr) kurê Eseddîdîn Şêrkoh (1230-1263 Z.), padîşahê Rehbê û Humsê bû. Li hember Teteran, ku leşkerê wan 6000 suwar bû, bi 1500 kesî derket qada cengê û ewan ji ber wî revîyan. Jina wî "Emetulletîf" zanayeka Humsî ya bi nav û deng bû. Li Humsê koç dîyarê rehmetê û li wir hat veşartin. Ew padîşahê dawîn bû ji malbata Eyûbîyan li Humsê.

Jêderên mijarê:

- تاریخ ابن خلدون .
الأعالي الخطيرة في لكر أمراء الشام و الجزيرة ، لابن شداد .
زبدة الحلبي في تاريخ حلب ، لابن العديم .
المختصر في أخبار البشر ، أبو الفداء .
تاريخ الإسلام ، للذهبي .
الأعلام ، للزركلي .
علاء السيد - حلب .. تحكمها امرأة
محمد أمين زكي ، خلاصة تاريخ الكرد وكرستان - الطبعة العربية في القاهرة 1939
دلو ميغري - نساء كورستان - الوجه الحقيقي لشعب عريق / الحوار للمتمدين
مواقع إسلامية وتاريخية عربية وكوردية .
يونيو 2005 مجلة " أهلا وسهلا " المصرية .

- *Tarîxa ibn Xaldun*
- *El-E'laq el-Xetîre fi zikir Umera' eş-Şam wel-Cezîre, Ibn Seddad.*
- *Zubdetul-Heleb fi Tarîx Heleb, Ibn el-'Edîm.*
- *el-Muxetsar fi Exabarîl Beşer, Ebul Fida.*
- *Tarîx el-Islam, Zehabî.*
- *'Elam, Zeriklî.*
- *Heleb Tehkumuha Imrae, 'Ela es-Seyyid.*
- *Xulaset Tarîx Kurd û Kurdistan, Muhemmed Emin Zekî, çapa Qahîre 1939.*
- *Nîsa Kurdistan, el-Wicud el-Heqîqî li Şe'b 'Eriq/el-Hîwar el-Mutemeddin, Dilo Mîqirî*
- *Mewaqî' İslamiye we Tarîxiye 'Erebiye we Kurdîye.*
- *Kovara Ehlen Wesehlen, ya Misrî, Tirmeh 2005.*

Di Sedsala Kurdan de Sedhejmarîya Nûbiharê

AYHAN GEVERÎ

ayhangeveri@gmail.com

Heta deh-panzdeh salan berê, gava ez di nava dîwanek/civînek pîremêrên mêvanên mala bapîrên min de dirûniştim, gotina bapîrê min yan jî ya pîremêrek di eve bû: "Me şerê Mela Mistefa jî dît, lê bo me nebû nesîb ku em xilasîya xwe bibînin. Piçûkên me jî nedîtin, neviyên me jî nedîtin. Belkî neviyên neviyên me bibînin..."

Belê hêj bapîrê min sax e û min (neviyê wî) ala Kurdan li ser serê çiyayên Kurdistanê dît. Min di atmosfera azadiyê de xilasîya gelê xwe bi çavên serê xwe dît... Wextê min zîyareta bajarê Mahabadê kirî min wisa nivîsî bû: "Mahabad mereqa hîlbijartinên Başûr dike..." Sedhezar car şukur ku piştî encamên hîlbijartinan vê carê jî min şahidîya hîlbijartina serokatîya Kurdistanê kir, di Kurdistana Azad de... Gelo ev azadî azadiyek çawa ye, yan jî azadî tê hesabê, an jî di bin bandora hêzên bîyanî çiqas azadî dibe? Belê mirov dikare wan pirsan hemûyan bike, lê gava we pîyê xwe avêtine Başûr êdî ev pirsana bêmane dimînin. Çunkî şahidîya azadiyê bi xwe jîyan e... Jixwe pîremêrên Başûr jî di sala par de jî min re wisa gotibûn: "Herkesekê digot, gava Kurd bi-

bin dewlet wê gavê dê qiyamet rabît... Lê ha eve ye em bûne dewlet çî qiyamet jî nerabûn..."

Piştî ewqas bindestî û rezaletê îro di parçeyek welat de jî be Kurdan desthilatdariyek mezin destêxistîye û ew tiştê giranbiha îşareta wê yekê jî dike ku êdî çerxa felekê bereks/ters dizivire û Kurd dê pêşerojê de baştirîn û gelectirîn tiştan dest biêxin. Ji ber vê jî êdî em dişên wê sedsalê wekî sedsala Kurdan bi nav bikin.

Di sedsala Kurdan de gelek erk û wezîfe li ber Kurdan rawestayî ne lê gava hema mirov bi çavek xwe û guhek xwe teqîba rojevê bike mirov dê bibîne ku êdî Kurd ne Kurdê berê ye. Belê di gelek babetan de Kurd hêj di xewa giran de ne, lê di warê hişyarîya azadiyê de di mêjîyê her Kurdekê/î de çirûskek hîlbûye. Anko baş an nebaş ev sedsal sedsala Kurdan e, belê gava mijarên wisa têne gotin hizra însanan li ser siyasetê mijûl dibe. Helbet rola siyasetê bêguman nahête înkarkirin lê gava em li dîrokê dinêrin gelek gavên siyasî-polîtîk bêencam mayîne, lêbelê gavên binecih daîmî dimînin. Belê di merhaleyek wisan de gavên wisa çî ne?

Bera her tiştî gava li mêjûya azadîya gelan bête nêrîn ew yeka tete dîtin: Rola rûşenfikrî û çapemeniyê. Anko diisa bi taybet

Nûbiharê jî şahidê wê heqîqetê ye ku hejmara berîya wê anko hejmara 98ê di demek kurt de xilas bû Nûbiharê hejmara xwe ya 98ê dîsa çap kir, anko kovarek bi zîmanê Kurdî çapa duyê çêkir. Jixwe eva jî ne tiştêkî taze bû, hejmarên din jî hene ku Nûbiharê du caran ew hejmara çap kirîye..

Ji bo meseleyên wekî meseleya Kurdan, çareserîya herî mezin xebatên li dor çand û zîman têne kirin in... Derxistina rojname, kovar û kitêban, li ser zîman û kulturê çêkirina xebatên bîngêhîn, çapemenîyek ku xwe bigehîniye kitleyek mezin, wekî tv û radyoyan...

Gelek caran mirov dibêje li ser civakê tesîra wan tiştên li jor qet nîne, di derxistina mafan de, pêşveçûyîniyên girîng de ma rola rojname û kovaran çî ye? Ma di sîyaseta cîhanî de kî navê kovarên Kurdan dizanin..? Belê ya ku ber çav wisa ye, lê birastî jî tesîra çapemenîyê tesîrek veşartî lê tesîrek bîngêhîn û muhîm e... Gelek gavên mezin bêdeng bi xêra kovar û rojnameyan dihên avêtin...


...

Her çend di aliyê zîman û edebîyatê de milletê Kurd gelek nexweşî dîtîbin jî Kurdan li kîdera dinyayê be çend sedsal in ku kovar derxistine? Bi rastî rola kovarên wekî Kurdistan û Hawarê ber bi çav e, lê ka kovara ku hûn niha dixwînin? Kovara Nûbihar?

Bi zîmanê Kurdî wekî me gotî gelek kovar hatine belavkirin lê cihê Nûbiharê çî ye, nemaze jî di sedsala Kurdan de, sedsala bistûyekê de..?

Kovara Nûbihar nêzîka panzdeh (15) sal e ku weşana xwe dike û ew hejmara di destê we de hejmara 99ê ye ku di zîmanê Kurdî de ev hejmar birastî jî hêjayê pîrozî û şahîyê ye... Lewra belkî di Bakurê welat de kovara herî temendirêj û bi îstîqrar her ev kovare ye. Kovara Nûbihar ne tenê bi temendirêjî îstîqrarê ve balê dikêşe, her wisa

Nûbihar



- ▶ Karîkator, Rexne û Heqareti
- ▶ Li Gor Seldê Nursî Ji Ahyê Dînî û Qewmî
- ▶ "Edin"
- ▶ Perwane
- ▶ Mela Mîstefa Barzanî û Malbata Wî
- ▶ Helbestvanê Klasîk WîdaT Ji Rêvingiyê
- ▶ Vegerya
- ▶ Humay Rê Lak Kewtîş -Munacat-
- ▶ 7 nîza çîma
- ▶ Nameya Hivdehem Taziyenama Zarokan
- ▶ Sonnet 139
- ▶ Hesenkeyf
- ▶ Çîzra Botan
- ▶ Nivîsîn, Jîyan û Roman
- ▶ Xalê Mihê
- ▶ Zerfa Deya Piro Tîya di Cay
- ▶ Mi Hewmên Di / To Emrê
- ▶ Wergêr û Şîrovekirina Xezetek Mewtana Celaledînê Romî
- ▶ Goristan
- ▶ Zîn(dan)ja Mem Memê Zîn(dan)ê
- ▶ Nivîskariya Kurdî
- ▶ Ji dayka pîroz re
- ▶ Li ser Jîyanê Axîtinên Taybet



Berga hejmara 98an

di gelek waran de serkeftinên ciddî û birêkuppêk pêkînane. Mîsalen gelek nivîskar û şair û lêkolînerên ku îro di Kurdî de bi navûdeng in bi saya Nûbiharê ve dest bi nivîsîn û xebatê kirine. Her wisa Nûbihar ne tenê mektebek mezin e ku gelek şair û edîb perwerde kirine, li gel wê bi hezaran insan bi xêra vê kovarê bûne xwendevanên zîmanê



➤ xwe. Jixwe tîraja Nûbiharê jî şahidê wê heqîqetê ye ku hejmara berîya wê anko hejmara 98ê di demek kurt de xilas bû Nûbiharê hejmara xwe ya 98ê dîsa çap kir, anko kovarek bi zimanê Kurdî çapa duyê çêkir. Jixwe eve jî ne tiştêkî taze bû, hejmarên din jî hene ku Nûbiharê du caran ew hejmara çap kirîye..

Gava li ser zimanê Kurdî axavtin an jî fikrek destpê dîke gelek caran berîya her tiştî Nûbihar tête hêşê insanan. Ne tenê di nava Kurdan de hema di nava hemû însanên ku li ser Kurdan an jî Kurdî dixebitin de navê Nûbiharê wekî markayekê ye. Jixwe ya tabîî jî wisa ye ku çawa Ehmedê Xanî navekî rêzdar û muhîm be, kovara Nûbiharê jî her wisa layiqê wê qedr û rêzê ye ku jixwe Nûbihar ne tenê navek e ji navan. Ew, hem navê kitêba Ehmedê Xanî ye ku Seyda têde îşaret kirî ku zimanê Kurdan ji zimanê çî/tu kesan kêmtir nîne. Nûbihar hem jî ber û fêqîyê nû ye ku dê gelek tişt jê çêbin...

Wêca Nûbiharê heta niha li ser ziman û kultur û ol û nirxên Kurdan karekî giranbiha kirîye. Li ser rêya Ehmedê Xanî, ala Xanî hilda ew wêdatir bir û wesîyet û mirazên Xanî jî înane cih. Hetta niha deh cild kovar ku hema bêje 100 hejmarên Nûbiharê derketine pêş xwendevan û lêkolîner û xemwarên zimanê Kurdî. Lê ligel wê hejmarên Nûbiharê hema ne tenê hejmarên alelade ne, ne tenê kovarek e Nûbihar: ku gelek hejmarên Nûbiharê hêj jî wekî çavkanîyên muhîm li ber lêkolîneran dirawestin. Mesela eger ez hindek mînakan bidim, hejmara Melayê Cizîrî, hejmara KTC û Seyîd Evdulqadirê kurê Şêx Ubeydullahê Nehrî, hejmara Medreseyên Kurdan, hejmara Mealên Quranê ên bi Kurdî, hejmara Xelîfe Yusuf û hwd.

Ligel wê wekî me gotî kovara Nûbiharê ne tenê kovarek e, her wisa di bajarê Stenbolê de -Stenbol em dikarin bêjin ku îdî bajarê Kurdan e ku nufusa Kurdên Stenbolê ji ya hemû bajarên din gelectir e- cihekî yekta ye (ligel Medya Kitabevi) ku hemû kitêben Kurdî lê têne firotin û peydakirin. Belê hûn dikarin şahidîya gelek têkilîyên lokîlînî û çandî jî bikin di Nûbiharê de... Anko Nûbihar her wisa em bibêjin wekî navendek çandî ye jî...

Ligel wê, kovara Nûbihar ne tenê ewqas e... Lê divê wê jî bibêjim ku her Kurdê/a dixwaze bikeve nava sohbetek şîrîn bi Kurdî an jî bixwaze nivîskar an jî şairekî Kurd bibîne divê rêya xwe biêxe ber bi Nûbiharê, jixwe hewce nîne ku bibêjim şekirên şîrîn ên Kekê Suleyman Çevik jî hene ku wekî sohbetê wî şîrîn û xweş...

Nûbiharê heta niha gelek gavên wisa havêtine û bûye mînakek zêrîn lê her wisa di pêşerojê de jî kovara Nûbiharê gelek proje hene ku di rêya ziman û çand û kultura Kurdî de bîne meydanê.

Di salê de bihar çî be, erê di Kurdî de jî Nûbihar ew e. ■

Hunera Folklorî Kurdî

ZEYNELABIDÎN ZINAR

pencinar@bredband.net

Li Tirkîyê gava sazîya zimanê Tirkî di 1926an de hatîye damezirandin, zana û pisporên Tirk hemû nivîsên xwe yên pêdivî ku bi alfabeya erebî û zimanê osmanî bûne, veguhaztine tirkîya nû û bi alfabeya latînî nivîsîne. Bi wê yekê, nivîsên nû yên Tirk, kê-m-zêde ageh ji mêjûya xwe mane û dîroka zimanê xwe nasîne.

Lê di 1926an de gava zimanê kurdî hatîye qedexekirin, zext û zordestî jî li serê pir hatîye kirin. Ji ber hindê Kurdên Bakûr xasma jî nivîsên nûhatî bi derbekê ji koka xwe hatine qetandin.

Lê belê jibîlî jîyana kurdên li bajaran, ji bo parastina ziman û **Toreya Kurdî**, di nava kurdan de sê faktorên pir girîng hebûne ku wan **Ziman û Toreya Kurdî** li pêşberê hewqas mercên giran parastine. Ew hersê faktor ev bûne:

- 1- Medreseya Kurdî
- 2- Sazûmana Şêxantîyê
- 3- Sazûmana Axatîyê

Çawa ku tê zanîn, hemû milletên pêşketî yên ku îro li dinyayê hene, vê çanda xwe ya nûjen, li ser du bingehan ava kirine. Yek berhemên wan ên **klasîk** in, ya din jî berhemên wan ên **folklorî** ne.

Li gor wan belge û materyalên ku di lêkolîna min a li **Folklorî Kurdî** de, eşkere bûye ku **Çiroka Folklorî**, pir dewlemend e û di bingeha wê de bi sedan tiştên girîng û pir

balkêş hene ku herdem pêdivîya Kurdan pê heye. Ew dewlemendî nakeve ber çembera mejîyê mirovan. Wek mînak: Heft şaxên çîroka **GUL û SÎNEM** hene.

(Min çar şaxên wê bi dest xistine û kirine yek pirtûk. Lê hêj sê şaxên dî mane ku bi destên min neketine.)

Ji ber vê dewlemendîya zimanê kurdî, tirsî min bi xwe ji asimilasyonê pir tune. Tirsî min tenê ji vê yekê heye: **Eger Forma Toreya Kurdî û ya Zimanê Kurdî bêne guhartin, hingê siqûmata mezin derdikeve holê.**

Bi bawerîya min, di salên sihî de eger Zimanê Kurdî li Bakûrê Kurdistanê bi awayekî fermî qalibê xwe girtiba, wê îro ne xwe-dîyê vê dewlemendîya hanê bûya.

Çîrokên **Folklorî Kurdî** bi gelek tewrên babetçihê hatine honandin û di bingeha wan de gelek fentezîyên pirtexlît û xeyalên cihêreng hene. Çîrok bi awayekî wisa geş û xweş derketine holê ku pir zehmet e mirov salixê wan bi dev û pênûsê bide. Tenê eger mirov saline dirêj lêkolîn li wan bike, hingê mirov têdigîje ku deryayeke bêkevî û bêbinî ne.

Xwendina **Çîrokên Folklorî Kurdî** sudeke pir mezin didin mirovan, xasma jî didin zarokan. Herweha astengîyeke mezin li



► pêşberê asîmilasyonê çêdikin, hem ji aliyê nijadî ve mirov gelekî serbilind dikan, ji aliyê şixulandîna mejî ve jî rohnîyeke pir xurt derdixînin holê.

Gelek babet di **Çîrokên Folklorê Kurdî** de hene ku hicirkên mejîyê mirov, pîr didine şixulandin. Bi wê yekê, dinyayeke bê sînor li pêşberê mirovî vedibe.

Îcar dema ku mirov bi têngîştina folklorê xwe rewşen dibe, mirov girêdana reha xwe ya nijadî, saxlem dibîne. Mirov êdî xwe bi bav û kalên xwe serbilind dike. Tiştê herî girîng ev e ku mirov êdî xwe ji kirina xirabîyan dide paş. Herweha bawerîya mirov pîr zêde bi mirov çêdibe. Mirov pîr dixwaze ku şexsîyeteke rind bigire. Mirov dixwaze ku di her karê xwe de serkeftî bibe. Mirov hertim xwe berpirsyar dibîne ku destên alîkarîyê dirêjî belengaz bike. Û bi dehan xeysetên baş ên wisa...

Ha ji ber van girîngîyên ku hatin gotin, îro pêdivîya Kurdan pîr heye ku berhemên folklorê xwe bixwînin û bi zarokên xwe bidin xwendin. Xasma jî, dê û bavên Kurd, zarokên xwe bi çîrokên **Folklorê Kurdî** mezin bikin. Ji wan re çîrokên rawilan bibêjin, meselokan bibêjin, pêkenokan bibêjin, serpêhatîyan bibêjin, heyranok û Payîzokan bibêjin, şîret û nesîhetên bav û kalan bibêjin, şîroveya **Gotinên Pêşîyan** bibêjin, klasîkên Kurdî bi wan bidin naskirin, herweha xwezaya Kurdîstanê jî bi wan bidin naskirin.

Guman ji gotinê re nîne ku **Çîrokên Folklorê Kurdî** rihê nijadî ne, adana jîyana netewî ne û xweşîya qulçavkên dilê kurdayetîyê ne.

Ji ber ku **Xwendina çîrokên Folklorê Kurdî**, têbînî û tîjîfemtiya mirovan gelekî xurt dikan û zanîna mirovî derdixînin asteke bilindtirîn ku tîrêjên hicirkên mixê mirov ber bi asoyeke bê dawîn ve dibezînin û wan rewantir dikan ku pê gelek geremolên di mejî-

yê tarî de zelal dibin.

BALKÊŞIYA DI ÇIROKÊN FOLKLORÎ DE:

Di **Çîrokên Folklorî** de, bi giranî ev babet hene: Balkêşî, fentezî, têkilîya kulturî, heskirina ji zimanê nijadî, nasîna nijada xwe, naskirina xwezayê, xweparastina li pêşberê belâ û siqûmatan, bawerîya bi xwe, tewrê jîyana rawilan û hwd...

Di **Çîrokên Folklorî** de tewr û terzên jîyana neteweyî, bi awayekî pir xurt cih girtine. Herweha rewşa jîyana çîneyî û perwerdekirina mirovan, xasma jî ya zarokan tê de xweş xuya dibe û astengîyeke mezin li pêşberê dek û dolabên sextekaran jî heye.

Di **çîrokan** de hin xeyal û fentezîyên derdemî hene ku ne aqilê mirov wan tiştan dipêjirîne û ne jî mimkun e ku mirov karibin wan tiştan bi hêz û birîya xwe bikin.

Di **Çîrokên Folklorê Kurdî** de, çêyî, xirabî û mirovatî, bi awayekî eşkera têne dîtin. Herweha çîrok tiştên weke şîret, nîşandana rîya rast, xweşbêjî û qewîtîne dilovan jî pêşkêşê mirovan dikan.

Di **Çîrokên Folklorî** de gelşên malbatî jî hatine çareserkin.

Ji van zêdetir, di **Toreya Kurdî** de demokratî, mirovatî, rêzgirtin û biratî, xwe bi awayekî eşkere nîşan dane.

Çawa ku tê zanîn, sînor ji **çîrokan** re tune, ew serbest in û çawa ji wan re xweş hatîye, her wisa jî xwe berfireh kirine.

Îcar eger zarokên Kurdan bi van **Çîrokên Folklorî** kame û fêrnas nebin, wê valahîyeke mezin têkeve navbera nivşên niha û yên berê ku dagirtina wê di pêşerojê de pir zehmet dibe.

Îcar ev tiştên ku di bingeha **Folklorê Kurdî** de hene, eynî tişt di bingeha **Klasîkên Kurdî** de jî hene.

Hêvîdar im ku dê û bavên Kurd, girîngî bidin ser vê yekê û pêşeroja zarokên xwe rewşen bikin.

Her şad û bextewer bimînin. ■

Pêşbazîya

Hejmara

100

Bi sedema hejmara Nûbiharê ya 100. me pêşbazîyek vekirîye. Pêşbazî di du beşan de ye: Çîrok û Helbest. Kesên ku dixwazin beşdarî vê pêşbazîyê bibin divê berhemên wan heta 31 Çileyê Pêşîna 2006ê bigihêjin destê me. Emê encama pêşbazîyê di hejmara 102. de îlan bikin.

Mercên pêşbazîyê:

- 1- Divê berhemên şandî, heta niha nehatibin weşandin.
- 2- Çîrok ji 5 rûperan zêdetir nebin.
- 3- Divê nivîs hem bi rêya e-mailê û hem jî li ser kaxizê ji me re bête şandin.



Nûbihar/Çîrok

Xelat:

Yekemîn: Plaket û 10 Cildên **Nûbihar** û pirtûkên wê

Duyemîn: Plaket û 10 Cildên **Nûbihar**

Sêyemîn: Plaket û Pirtûkên **Nûbihar**



Nûbihar/Helbest

Xelat:

Yekemîn: Plaket û 10 Cildên **Nûbihar** û pirtûkên wê

Duyemîn: Plaket û 10 Cildên **Nûbihar**

Sêyemîn: Plaket û Pirtûkên **Nûbihar**


KENT'in ışıkları

SÜRYANİLER

VE

DIYARBAKIR

**MEHMET
ŞİMŞEK**



Süryanilerin Diyarbakır'la veya diğer bir ifadeyle, Süryani kaynaklarının kent için kullandığı isim olan Omid'le ilişkisi kadim zamanlara kadar gidip orada kayboluyor. Hıristiyanlıkla birlikte Süryaniler kentte kiliseler ve manastırlar kurmuş, kentin tarihinde önemli bir renk olmuşlar. Diyarbakır, Süryani Kilise tarihinde önemli bir kent. Şimdilerde sadece 5-10 kişilik cemaati olsa da, bir zamanlar Süryani Kilisesi'nin Diyarbakır'da kalabalık, eğitilmiş ve görece varlıklı bir cemaati vardı. Tarihsel süreçte kent ve civarındaki manastırlar, Süryani Kilisesi'nde önemli eserler veren yazarlar yetiştirmiştir.

Adresimizden isteyin

Tel: 0212 519 00 09

www.kentyayinlari.com

Bindestbûna Gel

FERÎD ÎZOL

feridizol@yahoo.com

Gelê me bi gelemperî li ser ax û erdnîgarîya xwe dijîn. Ên ku koçber bûne jî gelek in. Wek tê zanîn ji ber rewşa aborî, ji bo xwendinê, ji ber zilm û zorê jî gelê me koçber bûne. Wexta ku xelkekî dibe xulam pirsgirêkên wan jî bi awayekî zêdetir dibin. Dewletên dagirker her tiştên wan wek xwe dirb û şikil didinê. Bi vî awayî cîhana bindestan tê tarîkirin. Îro gelê me rewşa xwe ya xulam pêwîst e ku baş bizane. Li gorî şert û mercan tevbigere. Li bindestbûnê, azadbûn û rizgarbûn ne hêsan e. Tahlîlkirina rewşa civakî û ji têgihîştina gel re dem divê. Ew tiştên ku weke mercên mirovbûnê tînen qebûlîkirin, li ser çi tiştî şax dide? Dema ku zanebûna xelkê tunebe û tu yê vî gelî çawa şîyar bikî?

Rêya ku li pêş mirov, bi rastî ji mirovahîyê re eger xizmet neke û ji mirov-bûnê re dijminatîyê bike, û ev rêya çewt û xwar bi ser nakeve. Armanca me li ser mirovê çê û xirab rawestandîna nîn e. Bindestbûna gel bi destê mirovan nîn e. Şert û mercên ku em tédane me bi xwe amade nekirine. Di pir alî de mirov dikare ku mafdar be; hêzên hiş de yekîtiyeke xurtirîn tune be û li hemû alîyan de bi nakokîyan û dubendîyan ev jîyana bê meşandinê di dawîya dawî de encam çî ye? Di sedemên bingeşîn de dîsa pêwîstî heye ku em jîyana gelê xwe baş binirxînin. Wateya jîyana bindestan li hemû deverên cîhanê di mabîna wan de nêzîkbûyînekî heye. He-

ke azadbûn û rizgarbûn di destê mirovan de be, bi rastî wê demê hemû tişt hêsan dibê.

Mixabin di şert û mercên xelkê me de, me ev dît ku di rewşa civakî de lawazbûn li holê ye. Guherîn û veguherîn çalak nîn e. Di seranserê welatê me de her çiqas bîna azadîyê were jî, evîndarên azadîyê jî kêman. Lewra bindest pir çaran ji azadîyê jî direvin. Ev ne ji destê wan e. Serwerên vî welatî bi awayekî çavên gelê bindest tirsandîye. Di têkoşîna gelê bindest de pêwîstî bi xebatê heye û her wisa di zîhnîyetan de guherîna berbiçav pêwîst e. Di têkîliyên gel de jî dîsa têkûzbûna gel û li ser çareseriyên nûjen rawestandîna û bi rêxistinkirina gel ve gelşan dikarin çareser bin.

Xelkê xulam heta ku bi hêza xwe ya neteweyî û vîna xwe ya azad bikar neyne ew di karên xwe de bi ser nakevin. Bêguman têkoşîna gel bi rê û rêbazên nûjen ve dikare xwe nû bike. Di her warî de şopandîna cîhanê, li ser kêmasiyên xwe rawestandîne. Bi carekî mirov nikare azad be û ji vî karî re dem divê. Wexta ku gelê me mafekî bi dest bixe pêwîst e ku wî mafî biparêze. Bi rastî parastîna mafan ji bo gelê me tiştêkî pir girîng e. Di hemû hêlan de rêya gelbûnê bi



➤ zanebûna gelê dibe. Îro gelê me jana gelbûnê dikişîne. Her janeke çi dersan dide me û pêşeroja gelê xwe, emê çawa ronî bikin. Dahûrîna (tahlîla) nexweşîya xulaman pir alî ye. Ji bo vê yekê li hember serweran bi rêk û pêk têkoşîn û xebat domandin gelek girîng e.

Di nirxandina gelê bindest de, hinek sînor hene. Ew sînor jî famnekirina jîyana xwe ye. Di rewşa xwe de bi gelemperî tiştê li ser dîsekine û mirov tê nagihîje. Di rewşa xwe ya lawaz û qels de û vala berdaneke jî cîyê xwe diparêze. Heta ku di hinek tiştan de hişmendîya xwe çêdibe, wê demê jî bi awayekî nikare ku pirsgirêkên xwe yê rojane jî çareser bike. Wexta ku mirov azad ne-fikire û evîna azadîyê nizanibe û ewê çi bike azadîyê. Heke em serê xwe li ser tiştên

berbiçav biêşînin, dibe ku em bi ser kevin. Belê, kêmasîyên me gelek in. Ji ber ku hemû mirovên cîhanê bi kêmasîyan ve jîyana xwe didomînin. Bi çavdêriyeke nûjen mirov dikare ku kêmasîyên xwe jî kêmbike.

Lêbelê, meşandina doza xulaman jî bi rastî ne karekî hêsan e. Avakirina zîhnîyeteke nû, vejîna civakeke hemdem û nûjen, bi rêxistinkirina gel, cîhana bindestan dikare bervî ronahî û serbilindîyê ve here. Bindestbûna gel û rizgarîya gel, azadîya gel û wek tê zanîn bi rewşa civakî ve girêdayî ye. Heta ku civak berpirsariya xwe bi cih neyne bira sûcdar wê, wî nebîne. Hema hema her kesê/a sûcdar e. Belê. hemû xebat bi diruşmeyan ve nameşin. Bi çalakbûna jîyanê ve mirov dikare ji guherîn û veguherînan re rê veke. ■

KENT'in Işıkları

Emre'nin tahsil hayatı bu medresede başlamıştır. O zamanki İslami ilimler içerisinde 12 çeşit ilim vardı. Bu medreselerin birinden mezun olan ve bu 12 ilmi bitirenlere "Melayê duwazdeh ilmî" deniliyordu. Bu medreselerde Mantık, Felsefe, Tarih, Coğrafya vb. her türlü ilimler okutulmaktaydı.

Adresimizden isteyin
Tel: 0212 519 00 09
www.kentyayinlari.com



Makalat
**Gıyasettin Emre
Medreseden
Meclis'e
Meclis'ten
Yassıada'ya**

Desîsa Duyemîn

SEÎDÊ NURSÎ

werger: **Mamoste Amedî**

Di mirov de hîsa tewra girîng û bingehîn, hîsa tirsê ye. Zalimên dexas, ji vê hîsa tirsê gellek îstifade dikin. Digel vê hîsê, mirovên tirsonek devbizmikî dikin. Sîxurên ehlê dunyayê û propaganderên ehlê dalalê ji vê tamara nexwendîyan, bi taybetî ji ya zanyar (û alim)an gellek îstifade dikin. Wan ditirsînin, ewhamên wan tev didin. Wekmîna, çawa ku ji bo mirovekî li ser xênî, têxîne nav talûkê, zilamekî dexas di nêrîna wî kesê bi ewham de tiştekî bi zîyan dixuye nîşanê wî dide û wehma wî bi livê dixê; hêdî hêdî heta ber qeraxa siwanekê diqewirîne, pişt re ji wir dixîne û sitûyê wî dişikîne. Herman wek wîya, bi pirr ewhamên nehêja, tiştên gellek hêja (û girîng) didin fîdakirin. Hetta, ji bona ku mêşek pêvenede, xwe diavêje devê mar.

Zemanekî, zatekî girîng –Xwedê rehma xwe like– ditirsîya ku li qeyikê siwar be. Digel wî, demeke şevê em ji Îstenbolê hatibûn ber pirê. Lazim bû ku em li qeyikê siwar bin. Erebe tunebû. Pêwistî li çûyîna Eyyub Sultan hebû. Min ritimand, lê wî: “Ez ditirsim, dibe ku em xerq bibin!” got. Min jê re got: “Gelo bi gor texmîna te li vê kendavê çend qeyik hene?”. Got: “Dibe ku hezarek hebin”. Min got: “Gelo di salekê de çend ji wan binav (xerq) dibin?”. Wî got: “Yek-du heb; sal heye ku ti yek jî xerq nebin”. Min got: “Sal çend roj e?”. Got: “Sêsed û şêst roj e”. Min got: “Îhtimala xerq-

bûnê ya ku ji te re bûye wehm û tirs, ji sêsed û şêst hezar îhtimalan yek îhtimal e. Kesekî ji vê îhtimalê bitirse, neku mirov, ew nabe sewal jî”. Hem, min jê re got: “Gelo bi gor texmîna te, tuyê hêj çendîn sal jîyan bikî?”. Wî got: “Ez pîremêr im, îhtimal heye ku ez deh salê din jî bijîm”. Min got: “Ji ber ku dema mirinê veşartîye, di her rojê de îhtimala mirinê heye. Naxwe, di sê hezar û şeşsed rojî de her roj muhtemel e ku tu bimirî. Aha, wek qeyikê, neku îhtimalek ji sêsed hezarî, belkî bi îhtimalek ji sê hezarî muhtemel e ku tu îroj bimirî; naxwe bilerze û bigirî, wesiyeta xwe bike”. Hişê wî hate serî; bi awayekî lertzokî min ew li qeyikê siwar kir. Di hundirê qeyikê de, min jêre wiha got:

“Cenabê Heq, hîsa tirsê neku ji bo hilweşandina jîyanê, berovaj, ji bo parastina jîyanê daye! Herwiha, ji bo giran, çetin, têrjan û têrêşkirina jîyanê nedaye. Ger ku tirs, ji du, sê, çar îhtimalan yek be...hetta ji pênc, şeş îhtimalan yek be, tirsek îhtiyatkarî, dibe ku meşrû (û rewa) be. Lêbelê, tirsikirina bi îhtimalek ji sih, çel îhtimalan, ewham e; jîyanê werdigerîne êş û azaran!”

Vaye, gelî birakan! Ger şelahên derveol (û ehlê îlhade), bi tirsdayînê êriş bidin ser



► we ku, da hûn dest ji cîhada xwe ya mane-wî ya pîroz berdîn, ji wan re wiha bibêjin: “Em hîzbul Qur’an in. Bi sirra

أَنَا نَحْنُ نَزَّلْنَا الذِّكْرَ وَأَنَا لَهُ لِحَافِظُونَ (1)

em di kelha Qur’anê de nin. ‘Hesbunellahu we nî’mel wekîl’

حَسْبُنَا اللَّهُ وَنِعْمَ الْوَكِيلُ (2)

sûrek qasidîne ku derdora me pêçandîye. Ji tîrsa ihtimalek ji hezar ihtimalan ku ji vê jî-yana fanî ya kurt re zîyanek piçûk wê bîne, hûn nikarin digel vîyana me, me sewq (û berpêdan)ê rêkek ji sedî bi sed hezaran zerarê digihîne jîyana me ya sermedî pêkbî-nin!”

Û bibêjin: “Gelo, ji rûyê Seîdê Nûrsî ku di xizmeta ‘Qur’anê de hevalê me, di rêveberîya wê xizmeta pîroz de ustazê me û serokhostayê me ye, me û ê wekî me ehlê heq in û di rêka heq de ji wî re dost in, kê jê zerar dîtîye û ji rûyê şagirdê wî yên xas (û aybet) kê jê zerar dîtîye ku dê emê jî bibînin û digel wê dîtîne têkevin nav tatolekan? Bi hezaran dost û birakên uxrewî yên vî birakê me henin. Bi tevî ku bîst-sîh sal e bi awayekî tesîrdar têkelê nav jîyana dunyewî (ya komelî) jî bûye, dîsa me nebihîstîye ku ji birayên me kesekî ji rûyê wî zerar dîtîye. Nemaze, wê çaxê di destê wî de topizê sî-yasetê jî hebû... lê niha di şûna wî topizî de nûr (rewşen)a heqîqetê heye. Demên berê, di Bûyera 31ê Adarê de herçiqas ew jî tevlê kiribûn, hinek dostên wî jî pelçiqandibûn, lêbelê, pişt re dîyar bû ku mersela ji hêla

kesên dîtir hatiye derxistin; ne ji rûyê wî û dostên wî, ji rûyê dijminên wî bela dîtînin. Him, wê çaxê gellek jî dostên xwe jî rizgar kiribû. Ji ber vê, neku hezar, bi tîrsa ihtimalek talûkedar ya ji hezar ihtimalan, divêt ev yek neyê bîra şeytanên wekî we, ku emê gencîneyek ebedî ji destê xwe birevînin!” bibêjin û divê hûn biçerpinin devê wan şelaqên ehlê dalalet û wan biqewirînin.

Him, ji wan şelahan re bibêjin: “Ne ku bi ihtimalek ji sed hezar ihtimalan, helaketek ji sedî sed ihtimal jî we re, dîsa jî ger bi qasê zereyek jî hişê me hebe, emê wê bernedîn û nerevin!” Lewra, bi ceribandînen pircar hatiye dîtîn û tê xûyakirin ku, ên di dema talûkê de ji birê xwe yê mezin, an ji ustadê xwe re îxanetê dikin, belaya qewimîye, pêşekî li serê wan de teqîyaye. Him, bi awayekî bê merhametî ceza li wan hatiye birrîn, him jî bi çahvekî nemerdi li wan hatiye me-yizandin. Him cesedê wan mirîye, him jî ruhê wan di nav zilletê de manen mirîye. Ên ku ceza dane wan, di dilê xwe de merhame-tekê hîs nakin. Lewra, dibêjin: “Evanan, madem ji ustadê xwe yên ku ji wan re durust û dilivîne xaîn derketine, helbet gellek nemerdi in; ne ji merhemetê re, şayan (û hêja)ê tehqîr û pelçiqandinê nin.”

Madem rastî (û heqîqet) ev e; û madem zilamekî zalim û bêvîjdan, yekî biavêje erdê û têkeve nav helwestek ku wê misoger bi lingê xwe serê wî bipelçiqîne, ger ew zilame erdê lingê wî zalimê wahşî ramûse, bi sayeta wê zilletê dê dilê wî pêşîya serê wî bipelixe û dê ruhê wî pêşîya cesedê wî bimire; hem serê wî diçe him îzzet û şayîşa wî berhewa dibe. Him, bi raberkirina qelsîya xwe ya li pêş wî zalimê cinawirê bêwîcdan, ji bo pelçiqandîna xwe wê wêrekîyê bide wî. Na, heger ew zilamê mezlûmê bin lingê wî, tûke ser çavê wî zalimî, dê dil û gîyanê xwe rizgar bike û cesedê wî wê bibe şehîd (û pakrewan)ekî mezlûm. Belê, tû bikin rûçikê bêheya ên zaliman!

(1) “Ên ku Qur’an hinartîye û ên ku wê diparêze, bêguman em in.” (Ferkera Hîcr:9)

(2) “Xwedê ji me re her bes e; ew çî wekîlekî qenc û sipehiye.” (Ferkera Alê Îmran: 173)

Zemanekî, di hengama ku dewleta Îngilîz topên Boxaza Îstenbolê wêran kiribû û Îstenbol dagirtibû, ji hêla serokkeşeyê Dêra Anglikanê ya mezintirîn daîreya olî ya wê dewletê bû, ji Meşîxata Îslamîyeyê şeş pirsên olî hat kirin. Ez jî wê çaxê endamê Darulhîkmeta Îslamîyeyê bûm. Ji min pirsîn, gotin "Bersiveke bide!" wan, li hember şeş pirsên xwe bersivek bi şeş sed bêjeyî dixwestin. Min got: "Ne ku bi şeş sed bêjeyî, bi şeş bêjeyî jî ne, heta ne bi bêjeyekî jî, belkî bi tûkekî dibersivînim!

Lewra, ew dewlet, aha hûn dibînin di vê deqîqa ku lingê xwe danîne ser gewrîya me de, li hember pirskirina keşeyê wan ê ku bi pozbilindî li ser me re rawestîye, pêwîst e ku tûkê ser rûçikê wî bikin. Tûk bikin ser rûçikê bêmerhemet ên wî ehlê zulmê!" Niha jî dibêjim:

"Gelfî birayan! Di demek wiha de, ku hukumetek cebbar ya wek Îngilîz dagirkerî pêkanibû, bi vî terzî (û awa)ê bersivdayînek bi zîmanê çapemeniyê, ku talûke ji sedî sed bû, dîsa jî parastina Qur'anê ji min re bes hatibe, helbet ji bo we jî ji sed îhtimalan bi îhtimalekî li hember zîyanên ku ji destê zalimên nehêja dertên, wê sed derence bestir were.

Gelfî birayan! Pîrrên we leşkerî kirinin; ên ku nekiribin jî helbet bihîstinin; ên ku nebihîstinin jî bila ji min bibihîzin ku: "Ên gellektirîn birîndar dibin, ewên ku çeperên xwe berdidin û direvin in. Ên ku hindiktirîn birîndar dibin, kesên ku sebatkarê kozik (û çeper)ên xwe nin, wateya îşarî ya

قُلْ إِنَّ الْمَوْتَ الَّذِي تَفِرُّونَ مِنْهُ فَإِنَّهُ مُلَاقِيكُمْ (3)

dide xuyakirin ku: "Ên direvin û firar dikin, bi reva xwe zêdetirîn mirinê pêşwaz dikin." ■

(3) "Bibêje: Ew mirina ku hûn jê direvin, bêguman wê were û xwe bighîne we" (Ferkera Cum'e:8)

Dubeytîya Baba Tahirê Uryan yek ji muhimtirîn klasîkên edebîyata me ye.

Baba Tahirê Uryan DUBEYTÎ

بابا طاهر
فرغانه

Ji lorî
Sabah Kara



Nûbihar

Çavê min derdê çavên te diçinin
Nebe ku derd di çavên te de rûnin
Min bihîst te j'xwe re yarek girtiye
Ku guhêmin bihîstin, çavêmin nedîtin

ji bo siparîşê

www.nubihar.com

Tel: 0212 519 00 09

Ceribandineke Keşxe ku Bi Gotin û Hêmayên Klasîk Hatîye Nexşandin: LEYL-name

ERGİN ÖPENGİN

*“Ey şemal hêdî bîsoj ku şev dirêj e
Ey rondik hêdî birêj ku xem gelek e”*

Leyl-name, vegotin û rave (îzah) û şîrove û tehlîl ûya şevê û şeydayê; hezkirin û vêzarî û tirs û hêvî û....ya ji şevê û şeydayê; sermestî û muşeweşî û gomgeşteyî û mecruhî û....ya ji destê şevê û şeydayê; tarîti û rewneqî û aramî û kambaxî...ya di leyl û leylayê; û....

Belê, *Leyl-nameya* Ayhan Geverî ku ji paşnavê nivîskarî diyar e ka ji kû dera Kurdistanê ye resenî (orjînalîtî) û xweserîya xwe hema ji xuyangê dide der. Kitêb li ser Leyl û Leylayê ye; bergê kitêbê bi rengê leylê (şev) ye û nîgareke gelekî eleqadarî Leylayê li ser rengê leylê ye. Her çend mirov bi rehetî nekare qîrarê bi kategorîya kitêbê bide jî, `ceribandin` wekî kategorîyeke edebî herî zêde lê têt; lewre kitêb xwerû îfade û derbirîna fikr û xîyalên nivîskarî bi xwe ne. Her wiha kitêb ji çar dergeh anku ji çar ceribandinan pêk têt; lê her çar dergeh li dû hev wekî rêzekê tên, wekî ku tenê der-

gehek e. Her wiha tişteke dî jî seyr bi wan dergeh an ew e ku her dergeh bi herfeka navê LEYLAyê dest pê dike. Ewe jî nişaneke `leylzede`yî nivîskarî ye ku dê li jêr behs lê bê kirin.

Helbet kitêb ne tenê hêma û mijarên (mesele) ku li jor bi kurtî hatine diyar kirin, lêbelê hêj gelekên din dihewîne ku xwendevan dê bi xwe di nav rûpelên kitêbê û navbera rêzikên di nava rûpelan de bibîne. Nivîskar, di jînenîgarîya xwe de, xwe wekî `leylzede` (anku yê ku Leylê lêdayî, yê ku ji destê Leylê muzdarîb) dide nasîn û bi rastî jî em wê yekê ji destpêkê bigire heta dawîya kitêbê di nav vereşînên wî yên wan azar û kulan dibînin; lewre di kitêbê de kelîmeyên ku herî zêde têne serfikirin *leyl, leyla, şev, heyv, çal/bîr, tenêtî, muşewweşî, bêdengî, mecnûnî, xem û xemgînî, hicr û cudahî û hwd.* ku hemî jî wate (mena) û pêjn û newayên `zede`bûnê (derbxwarî) dihewînin. Nivîskar hevaltîya (yekitî) şev û hîsên giran jî, li wan rêzikan bar dike:

“Bêdengî, tenêtî, kelegirî û kizgirî tên û li gel xemên kevnare yên ji şevan tarîtir, li ser dil û can kon vedigirin...”

Nivîskar bi vê kitêbê pêjn û hîsên xwe bi

Dergehê yekem (Lam) û yê dûmahîkê (Elif) li Stenbolê, yê duyem li Mehabadê û yê sêyem jî li Wanê hatiye nivîsîn û tesîra şevên li wan bajaran rasterast di nav kitêbê de eqsê xwe girtîye. Lê ew tesîr ne bi şiklê teswîr û terîfên wan bajaran, lê belê tesîra li ser derûniya (ruhî) nivîskarî ye. Tenê di dergehê duyem de (ê ku li Mehabadê nivîsandîye) ew tevna tesewwûfî û razber (soyut) hindekî zeîf dibe û teswîra bajêr û hîs û fikrên kurdewarî lê girantir dibin. Mirov dikare vê yekê wekî kêmasîyeke muhîm binirxîne ji ber ku xelekeka zincîrê qasî yê nî peyt nîn e.

ziman û şêweyeke (uslûb) helbestî li ber xwendevanan radiêxe. Wekî ku ji her tiştê kitêbê (nav û reng û şikl û naverok) diyar e di kitêbê de reng û newaya herî serdest `tarîtiya şevê, û axaftina ligel hemderd û guhdarê xwe anku şevê` ye. Di kitêbê de ligel gelek rêzik û pasajên ji ustadên wekî Melayê Cizîrî, Hafîzê Şîrazî û Elî Şerîetî, gelek ayetên ji Qurana Kerîm jî hene. Ew yek hewayeke tesewwûfî û dînî di tevahiya kitêbê de pêk tîne.

Dergehê yekem (Lam) û yê dûmahîkê (Elif) li Stenbolê, yê duyem li Mehabadê û yê sêyem jî li Wanê hatiye nivîsîn û tesîra şevên li wan bajaran rasterast di nav kitêbê de eqsê xwe girtîye. Lê ew tesîr ne bi şiklê teswîr û terîfên wan bajaran, lê belê tesîra li ser derûniya (ruhî) nivîskarî ye. Tenê di dergehê duyem de (ê ku li Mehabadê nivîsandîye) ew tevna tesewwûfî û razber (soyut) hindekî zeîf dibe û teswîra bajêr, û hîs û fikrên kurdewarî lê girantir dibin. Mirov dikare vê yekê wekî kêmasîyeke muhîm binirxîne ji ber ku xelekeka zincîrê qasî yê nî peyt nîn e. Wesa diyar e ku nivîskar hem li dû eşqa beşerî hem jî ya îlahî de ye; lê belê ew jî wekî Pîrê xwe Melayê Cizîrî Leyla`ya rasteqînê di Xwedê de dibîne û her çi `tîr û tîxên ji wî tîr` wekî minnet qebûl dike ji xwe re.

Nivîskarê dilleylî ne tenê bi helbesta kurdî lê bi referansên Quranê û helbestên faris û tirkî ve jî dûmahîka rêyê digehîne `wahdetê` anku `yekatî` yê. Dixwaze bibêje ku her

tişt yekatîya Xweda îfade diket.

Evîna Yusûf û Zuleyxayê, korîtiya Ye`qubî, gopalê Mûsa, tîbûna li Kerbelayê, qurbana Îbrahîm û Îsmailî û xwîna Îsmailî ya nerijîyayî, xwîna Huseyîn a rijîyayî, Ruknabad û Hafîz, hesreta Tûtîyê Tagore bo Hindistanê, Pêxember û Taîfî, Şerîetî û Parîs, tenê hindek ji wan referansên ji çanda cîhan û Îslamê ne ku di tevahiya kitêbê de ji wan bêhisab hene. Her çend ewqas zêde hêma û xal di ceribandinan de tîr guftugokirin jî, Melayê Cizîrî ji hemîyan bêtir tesîrê li nivîskarî dike û gelek çaran nivîskar berê hawar û qisseyaya xwe rasterast dide Mela û bi wî re dikeve diyalogan. Li cîyekî (rp. 72) nêzîkatîya xwe ya ligel Mela wiha îfade diket:

“Mela bibû Îmam û eşq dixwend, min lê vedigerand û meşq dibend”


Nivîskarê ku wiha gazî li xwe diket `Ey yê ku dilê wî ji Mecnûn cunûntir` mebest û teşkîla hebûna xwe wekî `eşq û îman` diyar diket. Bi pasajeke ji Elî Şerîetî, bêçineyî û xerabîya ji hev cudakirina eşq û îmanê vedibêje. Her wiha balê dikêşe ser paralelîyên di navbera xwe û Mela, xwe û Elî Şerîetî, û Mela û Elî Şerîetî û pirs dike bê qey ew (bi xwe jî tê de) ji hev bi xeber bûn!



► Her çî zimanê kitêbê ye, nivîskarî zêdetir `daye dû dilê xwe` û şîrînahîya form û kelîmeyên devera Geverê baş bi cî kirine. Herçend ji bo kelîmeyan ew yek çî muşkilîyan derneêxe jî, `dana dû dilê xwe` ji bo rastnivîs û rêzîmaneke standard ne helwesteke durust e. Bo nimûne, kelîmeyên wekî hind, hinde, pît, pirt pirt û berahî, cuwanî ne di kitêbê de lêbelê mirov nikare eynî tiştî ji bo bikaranînên wekî `nexilasbûye`, `neberde` an jî `desthelatdarîyek Îslamî bêje; çinku rê û rêzîkên rastnivîsandina wan êdî cî bi cî bûne û divê li gorî wan bêne nivîsandin. Her wiha hin beytên bi Farisî û Tirkî nehatine wergerandin bo kurdî, ew yek ji bo yên Farisîzan û Tirkîzan belkî ne muşkulî be, lê dibe ku herkesî pê xweş nebe. Her wiha di

tîpguhêziya beytên Farisî de jî hindekî dî hişyarî divêt...

Helbet nirxandina ceribandînên wiha, zanîneke kûr a tesewwûfî divêt, lê tiştê ku li me gelekî aşkera ye motîfên edebîyata klasîk a kurdan ji aliyê nivîskar ve gelek baş hatine famkirin û di nav ceribandînan de xwendevan tam û çêjeke tekstên klasîk peyda dike. Ew yek gelekî muhîm e ji ber ku dîsa li me aşkera ye ku edebîyata Kurdî ya hemdem nikare têra xwe sûdê ji edebîyata klasîk werbigire. Bi hêvîya ku ev kitêb bibe sebeb ku li wê kêmasiyê bê hesîn û hewlên bo telafîkirina kêmasîyan bêne dayîn...■



Bi Kurdî Behseke Eşqê

Qeys ji ber Leylayê kete çolê û bû Mecnûn. Lo dilo, ma Mecnûn hay ji te heye ku di navbera te û leylê, di navbera te û Leyla'yê de çî qewimîye... Dilo ger Mecnûn hay ji hesaba ebcedê heba, wê gavê dê wî jî zanîba ku peyvên ayhan û leyl hemkûfê hevûdu ne...

Ji navnîşana me bixwazin
Tel: 0212 519 00 09
www.nubihar.com

Mela Alî Germavî bi Bêdengî Wexer Kir

TEHSÎN ÎBRAHÎM DOSKÎ
Transkrîpsiyon: **Ayhan Geverî**

Vekoler li wê bawerîyê ne ku piştî wexerkirina Mela Ehmed Efendiyê Akreyî li sala 1958ê li Dihokê çirayê gotina ilmê şer'î li mizgeftên devera Bedînan vemirya, çunkî nema êdî melayek wekî caran kitêbên rêzê bi dersînî bêjît û feqî ji deverê û ji derveyî deverê jî qest bikenê. Belê Xwedê wesa hez kirîye ku ronahîya vî dînî her dem geş bimînît û her careka stêrek ji esmanê zanînên şer'î birêjît, stêreka dî geş û bilind bibît û ronahîyê bide-te hemî alîyan... Û li devera Badînan jî û piştî rehetî Mela Ehmedê Akreyî bi pitir ji sih salan çirayekî dî yê ilmê şer'î geş bû û stêreka dî bilind bû. Ew jî rehetî Mela Alî-yê Germavî bû, ewî berê demekê kêr û bi bêdengî li bajêrê Dihokê bi rehet çûy.

Seyda Mela Alî ewê kesereka mezin di dilên heval û nasyarên xwo de hêlay li sala 1953ê bi rex bajêrê Dihokê ve û li gundê Germava Seîd Axayî li devera Doskîyan hatibû ser dinyayê û di nav binemaleka dîndar de hate perwerdekirin. Li ser destê babê xwe Mela Nebî fêrî destpakî û xêrxwazîyê bû. Her ji zarokîniya xwe wî qesta xwendinê kir û li serî çû medresa gundî Pîromera û bo demekî li wêrê xwend... Piştî destpêkirina Şoreşa Eylûlê û têkçûna serûberê deverê mala wan bo bajarê Dihokê hate ve-



Mela Eli Germavî yek ji alimên me yên navdar bû. Roja 29 Hezîran 2006ê de li Dihokê wefat kir. Em ji bo malbat, feqî û hevalên wî sebre-ke cemîl dixwazin vê nivîsê bi muna-sebeta wefata wî diweşînin.

Nûbihar

guhastin û wî li Dihokê jî li medresên mîrî hindek ji xwendinan xwe wergirt. Paşî ilmê dînî li ber wî hate şirînkirin, lew wî dest ji medresê kêşa û qesta medresa dînî kir, ewa hingî ser bi rêveberîya Ewqafê ve. Xwendina xwe ya seretayî û navincî û amadeyî li wêrê bi dumahî îna û li ser destê hejmareka zanayan ilm wergirt, wekî: Şêx



► Ubeydê Beroşkî û Mela Alîyê Beroşkî û Mela Simaîlê Navişkî û Mela Hisênê Marunîsî.. û gelekên dî.

Piştî wî xwendinan xwo li Dihokê bi dûmahî înay li sala 1975ê qesta bajarê Medîna munewer kir li Erebestana Suudîyê, li Kolêja Şerîê li Zanîngeha Îslamî hate wergirtin û piştî 4 salan ji xwendinê wî bawernameya lîsansê di zanînên şer'î de wergirt û vegehiya welatî...

Piştî vegehiyana wî li dorê sala 1980ê wî dest bi karê melatîyê kir û li çend mizgeftên deverê bû mela û xutbexwîn û wekî mizgefta gundê Maltayê û mizgefta taxê Girê Baso li Dihokê ewa piştî hingî bi navê wî hatîye nasîn.

Û jibîlî karê melatîyê ewî bi karê dersgotinê jî radibû û çend salekan wî li sanewîya xwendinên Îslamî li Dihokê dersên tefsîrê û fiqhê û hedîsê didan û ji hejmareka mezin ya xwendekaran ilm jî wî wergirt û ez bixwe jî êk ji wan bûm.

Piştî serhildana sala 1991ê li Kurdistanê Îraqê û azadbûna deverê wî hizir li danana medreseka dînî li mizgefta xwe kir... Û ew bû li dorê sala 1994ê wî medresa xwo dana û her ji hingîwere wî bi dehan feqî pêgehandin û îcaza melatîyê dayê û noke feqîyên wî li gelek deverên Kurdistanê Başûr û Bakur bûyîne û hêja ye bêjin: Seydayî bixwe îcaza melatîyê ji Seyda Mela Hemdî wergirtibû.

Piştî vekirina Kolêja Şerîê li Dihokê -ew bixwe êk ji damezirênerên wê bûye- wî dersên eqîdê û tefsîrê lê digotîne xwendekaran.

Li sala 2000ê Seydayî bawernameya masterê li Zanîngeha Dihokê wergirt û nameya (tez) wî li ser Mela Xelîlê Sêrtî bû Menhecê wî di eqîdê de wekî ji vehênoka *Nehculenamê* xwûya dibit û pêxemet ber-

hevkirina vê nameya wî çend seredan bo Bakurê Kurdistanê jî kirin.

Piştî wergirtina masterê wî qesta welatê Lubnanê kir û li Zanîngeha Cinan hate wergirtin û dest bi xwendina doktorayê kir. Çend salan ew mujîlî berhevkirina nameya/teza xwo bû, ewa li dor jînosayda (komkujî) rêjîma Seddamî bi ser Kurdistanê de înay ya ku bi navê Enfalên hatîye nasîn, û wî xwest van kiryarên hovane jî layê şer'etî ve ruswa biket... Piştî nêzik bûyî ew nameya xwo bi dûmahî bînit, muxabîr ew bi rehmet çû û negeheştê tamam biket. Me li ber e eger Xwudê hez biket li demekê nêzik van herdu kitêbên wî li Dezgeha Spîrêz çap bikeyn.

Li 29/6/2006ê li Nexweşxana Azadî li Dihokê û piştî êşeka giran ya ku nêzikê deherojan vekêşay wî wexera xwo ya dûmahîyê kir û bi rehmet çû. Û hejmareka mezin ya xelkê Dihokê digel cenazê wî derkeftin û li goristana Şaxikê hate veşartin... Hîvîya me ji Xwudayê mezin ew e wî bi rehma xwo şad biket.

Seydayê Mela Alî dilsozê doza gelê xwe bû û her dem digel êş û azarên milletê xwo bûye, lewra ew kesekê xwoştivî bû li nik gişt milletî, jî mezinan bigire û heta yê biçûk. Çunkî ew mirovekî vekirî û qesexwos û şîrîn bû. Dergehê mala wî her dem bo heval û mêvanan vekiribû, xelkê her dem û ji hemî layan ve qesta mala wî dikir. Peywendiyên wî digel zana û rewşenbîr û xebatkerên Kurd li hemî deverên Kurdistanê nîşana vê gotina me ne.

Û hêja ye bêjin: Mela Alî bo demekê dirêj êk ji endamên çelengên Êkitîya Zanayên Dînê Îslamê li Kurdistanê bû û wî hejmareka vekolînan li dor babetên cuda cuda di kovara Zankoya Dihokê da belav kirine...

Xwudayê mezin bi rehma xwo ya berfirê digel wî biket û cihê wî vala nehêlît.■

Sabah Kara:

“Ez dixebitim ku şîrên min ‘sehîh-neseb’ bin”

Hevpeyvîn: AYHAN GEVERÎ

*Şair, dengê wijdana gelê
xwe ye, şair dengê milletê
xwe yê xweştirîn e ê di nava
orkestraya cîhanî de, şair su-
rûda xelkê xwe ye û alaya
rengîn e li ser çîyayên welatê
xwe, şair dîlana şahîyan e,
şa'ir olana şêran e, şa'ir axîna
janan e, lorîna dayîkan e...*

*Şair ronahî ye, bi rêzik û go-
tinên xwe ronî û rûşen dike...*

*Lê şair divê lal nebe, bila bi
meş'aleyê ve dilê xwe bisoje lê
divê şair ronî bike, hiş nebe...*


*Lewra şair rewşenbîr e, ro-
nakkbîr e... Şair xwedan êş e...*

*Ma êş nebe şîr dibe, şa'ir
dibe..?*

...

*Belê me jî xwest ku em êşên
şairek mezin ji devê wî, ji dilê
wî bigehînine gelê wî yê di ta-
rîyê de...*

*Belê şairê mezin Sabah Ka-
ra... Piştî ewqas bêdengîyê me
xwest ku em dengê Sabah
Abê bibihîzin... Her çend ji me
dûr bête hesabê jî ew gelek nê-
zîkî me ye... Me pê re sohbet
kir, lê me destên hev negirt û
me rûyê hev maçî nekir, lê me
dengê xwe gihande hev...*



Sabah Kara:

Eşq 'ihtîyaceke' mirov e. Mirov xwe 'nîv' dibîne û dixwaze 'tekmîl' bibe. Hin bi Leylayê tekmîl dibin; hin jî Leyla têra wan nake... Evê han li Leylaya Leylayan digerin! Yanî ev ji Leylayê derbaz dibin. Leyla tihniya wan naşkîne. 'Fanîbûna' Leylayê nîşan dide ku Leyla, ne 'DAWÎ' ye. 'Mecazî' û 'heqîqî' bûna eşqê ev e ji min re.



*Me pirsî û wî jî bi kerema xwe bersiv da.
Li ser şîira Kurdî, li ser eşqê, li ser şîira
Sabah Kara bixwe, li ser poetikaya ku heta
niha li ser nehatîye rawestan, me pirsên
xwe ji cenabê Sabah Kara re pirsîn...*

*Sabah Abê pirsên me ên dirêj bi kurtî ber-
sivandin, anko dîsa bi me da zanîn ku "go-
tinên min hemû şîir in."*

*Ez bawer im ku îdî xwendevanên Nûbiha-
rê dê dengê şairê mezin her gav bibihizin...*

*Belê hûn jî kerem bikin werin guhdariya
sohbeta me:*

* * *

A. Geverî: *Pêxemberê Xweda dibêje
ku; "Eger şîir, Xweda biîne bîra mirov ew
şîir baş û bixêr e; lê eger ne wisa be ew ne
qenc e."*

*Li aliyê din Pêxemberê me, gelek şairên
sehabe teşwîq dike, hetta ji Hesên bîn Sabit
re dibêje: "Ruhul-Qudus ligel te be." Anko
Cibraîl. Li gor qudema qesta Resûl bi Cibra-
îl û şairbûnê ligel îlham û wehîyê heye.*

*Wêca li gor we şîira Îslamî û tēkelîya wê
bixwe bi Îslamê ve çawa ye? Mirov dikare
navbera wehîy, şîir û îlhamê tiştēkî û tēkilî-
yekê peyda bike?*

Sabah Kara: *Şîir yan şîir e, yan ne şîir
e; yan şîireke baş e, yan jî şîireke ne baş e;
lêbelê şîir e. Û dema ku şîir, şîir be, îdî "şî-
îra îslamî" û "a neîslamî" nabe. Wek ku
"qundera îslamî" û "a neîslamî" nebe; wek
ku "derîyê îslamî" û "ê neîslamî" nebe û
ilh...*

*Erê ev wilo ye; lêhema divê em jibîr ne-
kin ku şîir jî cûrek "amel" û cûrek "peyvîn"
e û mirov ji her cûr amel û beyanên xwe
mesûl e. Yanî dema ku tu di şîirê de dere-
wan bikî; yan jî îftira bikî, şîirbûna peyvên
te, te jî îqab û cezayê xelas nake. Yanî wek
ku Quran dibêje: Tu nikarî bi navê şîirê de-*

*rewan bikî; tu nikarî bi navê şîirê îftiran bikî
û tu nikarî meddahî û çaplûsiya zalim û bê-
şerefan bikî. Dema ku te ev kir, tê hem li
hember mirovan "mesûl" bî û hem jî li
hember Xwedê "mesûl" bî. Yanî, wek he-
mû amelan, şairtiya baş jî "meqbûl"; û a
nebaş jî "merdûd" e. Eger şîir were redki-
rin, divê ev ne ji ber şîirtiya xwe, lê ji ber
sûcdarbûna xwe be. Kes nikare bi navê şa-
irtiyê bêşerefiyê bike. Şîir nikare peyvên
"rezîl", "ezîz" bike. Şîir jî navê xwe eşkere
ye ku "edeb" e. Erê şîir hetta dikare erotîk jî
be; lêbelê erotîkbûna şîirê jî divê ne ehme-
qane be û divê "estetîk" be.*

*Ku em bîna beşa duyem a pirsê te; erê,
di navbera îlham û şîirê de; di navbera
wehî û şîirê de bi rastî jî munasebeteke
zehf mezin heye. Yanî dema ku Pêxember
ayet ji mirovan re xwendin, mirovan bêse-
beb ew wek "şair" bi nav nekirin. Tiştên ku
wî digot bi rastî jî dişibihîn şîirê... Zaten
eger peyvên wî neşibihîyane şîirê, kesî jê re
nedigot "şair"... Erê peyvên wî dişibihîn şî-
irê, lê ew ne şair bû. Ew pêxember bû; û eş-
kere ye ku şairti û pêxemberti, ne yek in.
Çawa ku dema hakimê mehkemekê qanûn-
nan bi tertîl û şairane ji te re bixwîne tu ni-
karî behs ji şairtiya wî bikî, eynen wilo jî, tu
nikarî ji pêxemberekî re "şair" bêjî. Ma tu
dikarî ji "heddadekî" re "neccar" bêjî? Ma
tu dikarî ji "beqqalekî" re "qessab" bêjî?...
Yan jî ber'eks...*

A. Geverî: *Heta niha şîira Kurdî çî ya
klasîk an jî çî ya nûjen bi gelek mînakên baş
ve ketîye pêşberê xemxwar û xwendeva-
nên şîira Kurdî, lê çîma heta niha di dîroka
şîira Kurdî de poetikayek şîirê nehatîye çê-
kirin? Yan jî hebe hûn dikarin wê bi me bi-
dîne naskirin?*

Sabah Kara: *Poetîka (=terzê şîirê, tarîfa
şîirê; dibe ku em bêjin "felsefa şîirê") her
tim hebûye. Çî wek metnekî cihê; çî jî di şî-
irê bi xwe de "mindemic", poetîka her he-
bûye. Zaten bê poetîka, şîir nabe. Çawa de-*

ma ku avahîyek hebe, "mîmarî" jî heye; dema şîir jî hebe, poetîka jî heye. Yanî welew şair poetîkaya xwe nenvîse jî, poetîkaya wî di şîirên wî de "veşartî" ye.

Baş e; çî ye poetîkaya şîira kevin û a nû?... Cewaba vê pirsê, bi hevpeyvînekê nabe û divê meriv li ser vê mewzûyê dûr û dirêj binvîse û bipeyve.

Ezê zehf kurt bêjim:

Di şîira kevin de "zerf" li pêş "mezrûf" bû. Şair bi pîrranî li debdebeya wezn û qafîyeyan digerîyan û serê xwe li wan têşandin. Carna ji bo ku qafîyeyê li hev bînin, peyvên xwe yên delal xera dikirin. Carna jî ji bo ku wezin li hev bînin, peyvên kin, dirêj; û peyven dirêj jî kin dikirin. Yanî şîir dikirin halê îeglegê Xoce Nesreddîn...

Bî van gotinan qesta min ew nîn e ku "şairên berê qe guh nedidan naverokê"... Na! Helbet guh didan naverokê jî; lêbelê wê demê "şikl" li pêş bû, "mişkil" li paş. "Zerf" li pêş bû, "mezrûf" li paş. Lê niha xebat bi pîrranî tam ber'eks e. Şairên dema me serê xwe li ser "mişkil" zêdetir têşînin li gor "şikl"; û li "mezrûf" zêdetir digerin li gor "zerf"... Şikl û zerf bi tevayî îhmal nakin, na, lê îdî "şikl" û "zerf" Ji BO "mişkil" û "mezrûf" in. Ev herdu divê wek "dest" û "lepik" li hev bînin. Lê helbet "dest" li pêş e "lepik" li paş...

Ev mesele, meseleke dirêj e. Ezê niha evqas bêjim.

A. Geverî: *Bi xwe li gor we poetîka çîye, divê çî be û poetîkaya Sabah Kara çîye?*

Sabah Kara: Wek ku te qesta hevpeyvînekê nekiriye... Wîlo xuya dike ku nîyeta te ew e ku tu bi min kitêbekê bidî nivîsandin!

Henek li derekê; bi rastî ev mesele meseleke zehf dirêj, pêçandî, tevlihev û mişkil e. Bi vê sebebê jî ezê cewaba vê pirsê te jî bi kurtî, zehf bi kurtî bêjim:

Li gor min şîir cûreke peyivîne ye ku ew peyivîn ancax bi sayeta şîirtîyê dikare were eşkerekirin. Yanî tiştin hene bi zimanê adî

nayên gotin. Şîir îmkanê dide meriv ku hin "negotinî"yên ku bi zimanê "normal" nayin gotin, bêne gotin. Jixwe tiştek ji tiştên ku zorê dide mirovan ku wehyê bi şîirê re miqayese bikin, an jî wan bişibihînin hev jî ev e. Pêxember tiştin digotin ku bi wî şiklî nehatibûn gotin. Gotinên wan, gotinên "bilind" bûn.

Tê bêjî, 'ma çîrokvan, romanvan û nivîskarên din jî tiştina nabêjin ku bi wî şiklî nehatine gotin?'

Nexêr!

Çîrokvan, romanvan û nivîskarên din dema ku meselen dibêjin "hesp", yan "dar", yan "qelem", yan "ewr" û îlh... ew bi rastî jî yan "hesp", yan "dar", yan "qelem", yan "ewr" û îlh... in. Lêbelê dema ku şairek van peyvan binivîse, ew dikarin yan tiştên din bin, yan jî tiştin ji XWE zêdetir û kûrtir û firetir bin. Yanî şîira kurdî tam ne bi zimanê kurdî; şîira tirkî tam ne bi zimanê tirkî; şîira farsî tam ne bi zimanê farsî ye. Şîir di zimanê xwe de zimanekî nû diaferîne. "Êş" a di şîirê de êşek din; "hezz" a di şîirê de hezzek din e. Dema ku di şîirê de "ba" derbaz be, ba dikare li ruw û canê te bixe. Tu xwendevan bî, "giri" di şîirê de dikare bi ser ruwê te de dilopan bike.

Alîyê "mezrûf" e ev. Lê di şîirê de "zerf" jî zehf muhîm e.

Ronîya di zimanê şîirê de erê hebkê mubhem e û naşibihe ronîya rojê; lêbelê ew wek ronîya berqê ye... Ew dikare bi ronahîya xwe çavan "kor" bike.

Arif bêsebeb berê xwe nedane şîirê... Ma hûn ji xwe dipirsin ku çima hemû arifan şîir gotine, yan jî gotina şîiran teşwîq kirine? Ji ber ku dilê arifan li bilindahîyan digere û li "negotinîyan"...

Hasilî; ez di şîirên xwe de hem li ser



► “mezrûf” û hem jî li ser “zerf” gelek dixebitim; hem li ser “mişkil” û hem jî li ser “şikl”...

Tiştî dînin heye ku divê ez bi îsrar li ser bisekinim:

Ez tédikoşim ku şîrên min tiştên nû û orişinal bêjin; lê hema, ez bi wî heddî jî tédikoşim ku şîrên min ‘sehîh-neseb’ bin.

Ez dixwazim kesên ku şîrên min xwendin bi hêsanî têbigihin ku ez mensûbê kîjan kultur û kîjan medenîyetê me. Yanî ez dixebitim ku ez dengê xwe tevî dengê şairên medenîyeta xwe bikim. Ez dixebitim ku ez mensûbê silsilekê bim. Ez dixebitim ku ez û şairên zimanê min ê berî min, em bi hev re ‘orkêstrayêke mişterek’ ava bikin; lê helbet herkes bi sazê XWE û bi dengê XWE. Xulasa, wek ku min got, ez dixebitim ku şîrên min ‘sehîh-neseb’ jî bin.

A. Geverî: *Di navbera şîr û eql û fikr û entelektûaltîyê de çi heye? Bixwe şîrê eglek heye, an jî eqlê şîrê eglek şexsî ye? Anko ez dixwazim mebesta xwe wisa zelaltir bikim:*

Şîr û şuûr ji eynî kokê hatîne û şuûr jî çihê veşartin û parastina tiştên fikrî ye. Wêca şîr bixwe -nemaze şîra klasîk- hem kurt e hem jî bi maneyê ve tîjî ye, bi sembol û raz û remz e. Lê li hember fikrê ew hal çiqas rast e ku mîsalen Xweda di ayetek Qur’anê de ji Pêyxember (s.x.l) re dibêje: “Me şîr hînê te nekîr ku jixwe tu muhtacê wê nînî.”

Her wisa Ibnî Erebi jî di Futuhatul-Mekkîyê de dibêje: “Şîr muxalîfê beyanê ye.”... Belê jixwe Hz. Muhammed jî mubeyyîn bû, hikmet tefsîr û beyan dikir, lê şair tiştan vedîşêre. Ev hal çima wisa ye û qey mebesta şîr û şair ew e ku tu kes fêhm neke?

Sabah Kara: Bi gotina Mewlana: “Ma’nî ender şîr cuz ba xabt nîst

Çun felaseng est ender zabt nîst”

Yanî, me’na di şîre de bi qasî nesrê ne ‘eşkere’, ‘zelal’ û ‘dîyar’ e. Me’na di şîrê de ‘pêşîya-xwe-vekirî’ ye; bê qeyd û rebt e; ne ‘gol’ e, lê ‘çem’ e, ‘tofan’ e... Loma jî fêhmkirina şîrê, ne hêsan e. Hal ev bû ku pêxember diviyabû bi pirranî gelek dîyar û vekirî bêjin; loma jî ne şair, lê pêxember bûn.

Na! Şîr tiştina venaşêre! Ber’eks: Şîr tiştên veşartî dîyar dike. Lêbelê tiştin hene ewqas veşartî ne ku şîr jî ew ancax ewqas dikare ‘eşkere’ bike. Yanî di şîrê de veşartîbûna me’nayê, ne ji şîrê tê, lê ji mewzuwa şîrê tê; ku şîr li wê digere ku ‘negotînî’ û ‘nayêngotînîyan’ bike ‘gotînî’ û hûnê teqdîr bikin ku ev jî ne ewqas hêsan e.

A. Geverî: *Dîsa ligel pîrsa li jorî Ibnî Erebi dibêje ku “arif nikarin hestên xwe ji kesekî re vebêjin..” Ku Ehmedê Xanî jî dibêje: “Me eşqa Memo bo xwe kire behane..” Gelo şair însanê dunyayek din e û şîr jî dunyayek din e ku remz û raz tede hene? Li gor we şîra bê remz û raz û sembol dibe?*

Sabah Kara: Heqê şairan jî heye ku xwe ji fêhmkor û hov û ehmeqan biparêzin.

Û erê bi rastî jî şair li dinyayek din dijîn... Wek ku min di şîrek xwe de jî gotibû:

“Tu li dîyarê çîrokan dijî

[...]

Û erê zehf baş e ku tu

Li dîyarê çîrokan dijî”

A. Geverî: *Di navbera şîr û eşqê de çi heye? Mirov dikare eşqê wekî ava heyatê bibîne û hem eşqa îlahî hem jî eşqa mecazî/beşerî wekî du rûyên tiştelê dibîne? Anko li gor Sabah Kara têkelîya mecazî û heqiqî çîye?*

Sabah Kara: Eşq ‘ihtîyaceke’ mirov e. Mirov xwe ‘nîv’ dibîne û dixwaze ‘tekmîl’ bibe. Hin bi Leylayê tekmîl dibin; hin jî Leyla têra wan nake... Evê han li Leylaya Leylayan digerin! Yanî ev jî Leylayê derbaz dibin. Leyla tihniya wan naşkîne. ‘Fanîbûna’ Leylayê nîşan dide ku Leyla, ne ‘DAWÎ’ ye.

'Mecazî' û 'heqîqî' bûna eşqê ev e ji min re.

A. Geverî: *Di şîira Kurdî ya klasik de te-sîra tesewufê çawa çêbûye li gor we?*

Sabah Kara: Tesewwif jî hema li wê digere ya ku şîir lê digere. Yanî hedefa herduyan gelek dişibihe hev. Şîir û tesewwif 'cê-wî' ne. Ma te mutesewwifek naskirîye ku minasebeta xwe bi şîire re nebûye?

Ma ev gelek tiştan eşkere nake?

A. Geverî: *Şîira nûjen çawa dinirxînin?*

Sabah Kara: Bi bawerîya min şairtî xebata herî bi zehmet a mirovahîyê ye.

Ez bawer im ku Xwedê şairan sirf jî ber 'şairbûna' wan divê bişîne cennetê. Ji ber ku jîyana şair zaten bi zatihî CEHENNEM bi xwe ye.

Îcar bifikire ku şîira nû divê çawa 'ciddî' be!

Bira wellah şa'irtî ne îşê herkesî ye!

(Mirovno ji kerema xwe bi neheqî de'wa şairtîyê nekin. Lo wellah şairtî ne îşê keyfê ye. Eger hûn bi vê bawer nakin, ji kerema xwe li tarîxê binêrin. Na eger hûn nikarin li tarîxê binêrin; ku bi rastî jî gelek ji we, hûn nikarin li ti tiştî binêrin; lexwe li halê şairan binêrin ku ew çawa dişewitin!)

A. Geverî: *Sabah Kara, Dubeytîyên Baba Tahîrê Uryan, Rubaîyatên Xeyyam wergerandine Kurdîya îro, çendek jî ji Mesnewîya Mewlana jî... Wêca di vî warî de xebatên we yên nû hene? Sabah Kara tiştan dinivîse... ji bo zarokên Kurdîstanê ku li gundan çavên wan li devê şair û qelemê Sabah Kara, hûn dikarin çi bibêjin?*

Sabah Kara: Min ew tişt jî bo ku ez nîşan bidim ku meriv dikare wan tiştan bi kurdî jî bêje, terceme kirin. Ji bo ku hêvîya me tevan zêde bibe û ji bo ku dijmin 'bipeqîn'...

Îcar, eger 'teleb' hebe, 'erz' jî dibe. Lê bi rastî jî:

"Çi b'kim ku çewî kesad e bazar

Nîn in qumaşî ra xerîdar"

[...]

"Ger îlm tamam bidî bi polek

Bûm Siwarê Xeyalan

ABDULKADİR ÖNKOL

*Bedewê rabe serê sibê
tu xema serê dila
roj û êvar li hev gerîya
bûm siwarê xeyala*

*bê deng im bi evîn im
stranan çawa dînim
ew êşa şûna şûre lê
te di nav spi bibinim*

*keser hat ji peyman
roj kete ber êvara
temenê dilê şewti
bûm siwarê xeyala*

*xanimê tu bayê xerbî
bi ava ferêt nemrî
evdilqadir dibêje
tu heval bî û tim hebî
tu hogir bî û her hebî*




Bif'roşî tu hîkmetê bi solek

Kes nakete meyrerê xwe Camî
Ranagiritin kesek Nîzamî"

(Heyf e ku em jî piştî 300 salan, wek Ehemedê Xanî van tiştan dibêjin!)

Îcar eger zarokên kurd 'şîr' û 'şîir' dixwazin, divê ji kerema xwe hebekê devê xwe vekin!■





Sê Rîsale bi kurdî

Ji bo siparîşê

www.nubihar.com

Tel: 0212 519 00 09

Xezel*

MEWLANA CELALEDDÎNÊ ROMÎ

ji farisî: **H. ACAR**

*Dilo, nezî kesî rûnê ku wî ji dil xeber heyê
Bimeş ber bi wê darê, ku kulîkên wê nî terr heyê*

*Li vê bazara 'ettaran me'r her derê wek bê karan
Li dikana kesî rûnê ku'l dikanê şekir heyê*

*Terazûya te ger nebe, dê rê li te bigir herkes
Yek ê pelikkî bi te de, tê bê gelo ev zêr nîye?*

*Te'l ber derî dirûnîne "va tê'm" dibê bi derewan
Tu'l benda wî derî nebî, belkî malek du derî ye*

*Her beroşa ku dikele, tevî tasê'l ber rûnenê
Lew her beroşa dikele, belkî tiştekin din tê'd heyê*

*Ne her qamiş şekir heyê, ne her binî ser jê'r heyê
Ne her çav re nêrîn heyê, ne her derya gewher heyê*

*Binal ey bilbilê nalan, lewra di nalîna mestan
Li teht û kevir û latan, eser heyê, eser heyê*

*Ser bihêle ku'b cîh nebî, ku d'nava qûla derzîyê
Eger ta te'r derbas nebe, ji vê ye ku ser pê'r heyê*

*Çira ye ev dilê huşyar, wê dibin dawa xwe bispar
Te'j vê ba û hewayê çi? Hewa, fîtne û şer heyê*

*Dema tu'j bayê buhurî, birûne'l serê kanîkê
Hevaltîya hevalkî ke, ku di dil da kanî heyê*

*Ger di dil te kanî hebe, mîna dara hêşîn î tu
Ku ew dar, ber bide daîm, derûnê dil sefer heyê*

* Mewlana Celaleddîn-i Rumî, Kulliyat-i Diwan-i Şems, (Neşr-i Bediuzzaman Fruzanfer), Intişarat-i Behzad, Tehran, 1329 h.ş., Cild:1, rûpel:199, Xezel no:563

Wek ku Gunehekî xwe Veşêre

FELAT DILGEŞ

*Ez ji bav û kalan ve wî dinasim,
Dizanim ku dayika wî,
Wek dayika min a reben,
Gotinekê jî bi Tirkî nizane.
Ji roja ku ew bû peyayê Tirkan,
Wî dev ji dê û bavê jî berdan.
Belê min,
Tu car dest ji pêşîra wî berneda.
Loma ez,
Li her dera ku wî dibînim
Jê re bi Kurdî dibêjim,
Ew bi Tirkî li min werdigerîne.
Bi ser de rûyê xwe tirş dike,
Enîya xwe diqermiçîne.
Bi awirên xwe yên tûj
Li min dixwe gef,
Ji hêrsan, dora devan tije dibe kef.
Çi ye ku ez bi Kurdî dibêjim.*

*Ez jê re bi Kurdî dibêjim,
Yên derûdorê lê dimînin şaş!
Çimkî bi salan Kurdbûna xwe veşartîye,
Wek ku gunehekî xwe veşêre.*

Stenbol-1999

Du Şêr Du Xezal

HAMÎT GEYLANÎ

*Serborîya Cizîra rengîn
Du bira Mem û Tajdîn
Du xwişk Sitî û Zîn
Du şêr du xezalên dilbirîn.*

*Pîrozbayîya cejna Newrozê de
Her wekî çar gulîyên rihanê
Dilek aram hatin meydanê*

*Destegul pêşkêş hevdu kirin
Gulên biheştî yên geş
Vay li mîn ji bo qedera pîrr reş.*

*Gustîlên xwe yên durr û cewahir
Veguhastin ser eşqa ku bûye jehir*

*Sitî desgirtîya Tajdîn
Keserên wî de bûye dîn
Tajdîné mêrxas
Sembolek belengazên pêxas*

*Zîn welatê gulistan
Mem jî gelê bindestan
Bêbextîya Bekoyê ewwan
Mixabin kete dojeha zîndan
Mîna mûmekê helîya, dilê wî zîz e
Evîna Zîné bo wî pîr ezîz e.*

*Zîna kezabêş xwişka mîr bû
Birca belek de
Kul û kovanên Mem de pîr bû
Ey welatê xemgîn Cizîra Botan
Rojên rizgarî û azad nêz in
Hewl û quweta Yezdan*

*Em wê helbestê diken Xelat
Bo Mamoste Ehmedê Xanî
Ew darçinarek gelek ciwan î*

Pîpik

BENJAMIN FRANKLÎN

Jî Îngilîzî: **SIDIQ GORÎCAN**

Zarokekî heft salî bûm. Hêj di bîra min de Zeye, di tatîlekê de hevalên min bêrikên min teji sifir kiribûn. Ez jî rasterast çûme dikaneke ku pêlîstîkên zarokan lê tê firotin. Di rê de bi dengê pîpîkekê şa û kêfxweş bûm ku min di destê zarokekî din de dît. Min hema jidil hemî heyina xwe da, pîpîk ji xwe re kirî. Dû re ez hatim mal, li pîpîka xwe dixim û domedarê mal û baxçe de bi pîpîka xwe şa û bi kêfekê xweş diçim û tîm. Tabî mîletên mal jî vê hîne ji min û ji dengê pîpîka min têr bêzar in. Birê min, xwuşkên min, biraziyên min hemî ji danûstandin û kirîna pîpîkê hesiyabûn û ji min re digotin ku min çar car ji bihayê wê zehftir daye. Paşî hat hişê min ku ger min ewqas giran nekirîbûya ew pîpîk, wê min bikarîya pê/bi perê mayî jî pir tiştên baş û spehî bikirîya. Lê çûye. Hemî ji bo nezanîn û ehmeqîya min kenîyan. Ez jî bi dilekê şikestî, poşman û melûl ji xwe re têr girîyam.

Lêbelê piştî vê bûyerê ku bandorekê mezin li ser min hiştibû, gava min hewl-daya xwe û nîyet bikira ku tiştekî nelazim ji xwe re bîstada, min hema di demê de ji xwe re wiha digot: "Ji bo pîpîkê zehfî perê

xwe nede" û min bi vî awayî jî diravê xwe digirt û mesref nedikir.

Dû re wextê ez mezin bûm û gava min tevger û jîyana mirovan raçav kir, min zanî ku ez bi zehf kesan binas im ku ew kesan jî ji bo pîpîkekê pir mesrefker in. Dema ku yekê/î ji bo hin kêfên dîtbarî û muveqet pir hirsdar û dilxwaz dibînim ku dikare hemî wextê xwe, nîrxên xwe, aramîya xwe, azadî û yekaneîya xwe, belkî jî hevalên xwe feda û qurban bike ji bo ku ew tiştên bîhêz, xwe bi xwe re ez wiha dibêjim dîsa: "Vî merivî jî bo pîpîka xwe zehf zêde daye".

Dema ku merivekî tama û xesîs nas dikim ku heke xweşahîya jîyanê, dilaramîya qenciyên ku li însanên din tê kirin, hemû qîmet û hîrmetdarîya xwe û kêfa hevalbendîyekê hasbî bidin û feda bikin ji bo malê dinyayê, xwe bi xwe dibêjim: "Evdê reben û belengaz, te heqîqeten bi bihayekî pir giran pîpîka xwe kirîye".

Gava ku merivekî rûken dibînim ku derfetên tendurîstîya xwe, hişmendîya xwe û heyina xwe dabite sirf kêf û zewqa xwe a bedenî û dinyayî, ji xwe re dîsa dikenim û dibêjim: "Evdê ehmeq û xafil, tu tenê ji xwe re êş û elem diçinî, ne hizûr û sûrurê. Pîpîka ku tu lê xwedîyî, nahêje ewqas ked û mesrefa ku te lê kirîye".

Ger ez yekê/î dibînim ku bi libasên xwe ên xweşik ve mezin û kubar e, ku bi mobilye û avahiyên xwe ve piç û mexrûr e, li ser van hemûyan re jî ku deyndyarîya xwe û dawîya karîyerê xwe amade dike, lê ku haya wê/î pê tune; "Alas" dibêjim, "tu yeqîn bizan ku wê/î, delalîya xwe û hêjahîya xwe firot ji bo pîpîkekê erzan".

Bi kurtasî, ez bawer dikim ku kul û kovan û nexweşiyên mirovahîyê, bi piranî, ji qîmetdayin û teqdîrkirina hin tiştên beredayî, edna û nehêja didere, ango bi pirdayina ji bo pîpîkeke erzan û piçûk çêdibe. ■

Diçim

GULISTAN ÇOBAN

Ji bo Canan

*Li rojhilat nûbihar e
Nûbiharek birîndar e
Stêrek nû xew ve çûn
Wê hêdî hêdî zelal be dinya
Wê ro were ramûsanê bide gulan
Ew gulên sor û sipî
Ew gulên xew nekîr
Heta sibe girîyan
Na na,
Ne ji bo mirinê zû ye
Ne ji bo çûyîné
Ne jî ji bo evînê
Waye ez weke Diclê serê xwe digrim
Û ber ve rîyên dûr ên bê vejer ve diçim
Diçim...
Çav neke rêya min
Diçim, lêxe serê evîna min
Diçim neyê dinya min
Neyê xewna min*

*Li rojhilat nûbihar e
Nûbiharek evîndar e
Evîn birîn e
Evîn êş e
Evîn giran e
Diçim bask şikestîme
Westîyame
Diçim nema xêra min
Xira bû hêlîna min*

*Tu bûy tu evînê!
Wek mahkûma li çîyayê dil ma şevînê
Li bin ronahîya hîvê
Xwîn herikî ji birînê
Li ber agirê şivana dilorînî
Û di hembêza xwe de hesretan dihewînî
Evîn destê xwe bide destê min
Em biçin
Ne ji bo mirinê zû ye
Ne jî ji bo çûyîné*

Sivan Perwer

Min bi kurdî kilam gotin, ev 30 sal in sirgûn im..!

Hevpeyvîn: **SALIHÊ KEVIRBIRÎ**
salihkeviri@hotmail.com

Ji bo biranîna 50 salîya Şivan Perwer

Şivan Perwer... Hewce nake mirov ji bo navekî wisa pêşgotinê binivîse. Hunermendê kurd ê ku ev 30 sal in fermalûbûnango sirgûn bûye para wî 30 sal in terkese-rê dinyayê ye. Her çiqas bi awayeke fizîkî ne li nav welatê ku lê hatîye dinyayê û xortanîya xwe lê derbas kirîye be jî, tu caran ji rojeva kurdan derneket. Ne tenê raya giştî ya kurdan, her wisa piraniya caran kete rojeva Tirkîye û Ewropayê jî Şivan Perwer... Gelek caran hate nîqaşkirin, rexnebarankirin bû hingava qisedanên li dijî kesayetîya wî.

Şivan Perwer li gorî nasnameya fermî di 23 yê Rêbendana 1955 an de li Gundê "Sorî" ya bi ser Siwêrega Rihayê ve ye hatîye dinyayê. Li gorî vegotina ku diya wî jê re kirîye, sala ku Şivan hatîye dinyayê, "sala ku berfa sor lê hatîye" bixwe bûye! Di pêvajoya hunera 30 salan de mohra xwe li bin zêdetirî 20 albûman daye, li seranserê cihanê konserên çak pêşkêş kirîye, di warê huner û

muzîka kurdî de wekî "Qasidê Hunera Kurdî" tevgerîyaye û bûye xwediyê gelek xelatên girîng û hêja. Heger em ji wan xelatan behsa duduyan bikin; yek ji wan "Nîşana Barzanî" ye ku di 3yê Hezîrana 2001ê de li bajarê Hewlêrê, bi merasîmekê li Parlamenta Kurdistanê hate dayîn. Dudu; Xelata "Akademîya Charles Bross" ku li Parîsê di 18ê Sermaweza 2004ê wergirt. Perwer, ev xelat di beşa "Muzîka Cîhanê" de, bi albûma xwe ya bi navê "Min bêriya te kirîye" heq kir. Di merasîma xelatdayînê de Şivan Perwer kurteaxftinek kiribû û wiha gotibû: "Li welatê ku jê hatîme, qedexekirî me, lê li vê derê tême xelatkirin..!"

Me got hewce nake, mirov ji bo "Şovalyeyê Muzîka Kurdî" pêşgotinê binivîse, lê va ye me dîsa nivîsand. Ji xweber hate nivîsandin. Hûnê di vê hevpeyvînê de rastî "Fehengoka Şivan Perwer" werin. Perwer dê bi çend gotinan wateya peyvên ku me diyar kirîye bide...

Li Brûksela Belçîkayê me pirsî, Şivan Perwer bersivand...



Şivan Perwer

Salihê Kevirbirî

Gelo tê bîra te, cara yekem te kengê rahişt sazê?

Helbet tê bîra min. Heşt salî bûm wê demê. Rojekê min qûtîkeke dîmsê vala kir. Postê ku dîya min dabû ber tavê û hişk kiribû ligel darekê min dest bi çêkirina saza xwe ya yekem kir. Dema dîya min çû bajêr, min jê re got; "Ji min re têl bîne!". Rûniştim, min bi tena serê xwe ji xwe re sazê çêkir. Li gorî zanîna xwe, min akorda wê tekûz kir. Dema bavê min hatîye malê, saza li ser tûrikên genim dîtîye. Ji dîya min re gotîye: "Xêr e gelo, dê kurê me bibe qereç?" Rahiştîye saza ku min çêkirîye û henekê xwe pê kirîye. Dîya min bi zor û heft bela sazê ji destê bavê min derxistîye. Xwestîye bişkêne. Wê demê ez ne li malê bûme...

Ji ber vê sedemê te qet lêdan xwarîye?

Erê çawa? Min ji bavê xwe lêdan xwarîye gelek caran. Tim ji min re digot; "Tê Qûranê bixwînî!.." Mamekî min hebû. Mele bû. Dersa Qûranê dida zarokan. Herçî ez bûm, min dixwest biçim dibistanê. Wê demê 6-7 salî bûm. Bavê min digot: "Tê Qûran bixwînî!" Min digot: "Na! Dixwazim biçim mektebê!" Çi kir, ez ji ya xwe nehatim xwarê! Ji ber vê yekê min ji bavê xwe gelek lêdan û kotek xwar.

Dîyar e, navbera te û feqetîyê tunebûye...





► Mixabin navbera min û feqetîyê qet tûnebû. Ne ku feqetî tişteki xerab bû, na! Min xelasîya xwe tê de nedidît. Min dizanibû ku feqetî, min ber bi armancên min ve nabe. Dê feqetî, dinyayê jî baş bi min neda fêmkirin. Xewn û xeyalên min ên gelek mezin hebûn. Pêkhatina van xeyalan, bi hevnasîya cîhaneke pêşketî û modern mimkûn bû li gorî min. Sedem her ev bû. Ne ku li dijî dîn û bawerîyan bûm. Di rastîyê de mirovekî

dîndar jî bûm. Min limêj dikir, bi dengekî xweş min azan (bang) dida. Dema zarok bûm gelek caran min mûezîntîya gundîyan dikir...

Pirsekî klasîk e, lê dîsa dixwazim bipirsim; Şivan Perwer hunera xwe çawa bi nav dîke?

Jîyan pirreng e. Huner jî vê yekê tîne zimên. Heger huner ne pirreng û pirdeng be, ne huner dibe, ne jî hunermend. Her dem, li bersiva pîrsa "guherîn çawa dibe?" gerîyam. Muzîka min, ji bo ku jîyanê biguherîne, li ser bingehên çak û pêşketî hatîye avakirin. Lewre jî muzîka xwe bi nav nakim û kesek jî nikare bi hêsanî bibêje; "Muzîka Şivan ev e!"...

Gelo em dikarin bibêjin; Muzîka Şivan Perwer, harmonîya dengbêjîya klasîk û muzîka modern e?

Pira di navbera dengbêjîya klasîk û muzîka modern, pira di navbera muzîka kurdî û muzîka cîhanî, pira di navbera meqamên kurdî û meqamên dinyayî, pira di navbera guherînen li cîhanê û kurdan... Tu dikarî tevahîya van taybetmendîyan bibînî di muzîka Şivan Perwer de...

Her kesê ku temaşeyî te dîke, li te guhdarî dîke bi xisûsiyetekî te dihese; gava ki-

FERHENGOKA ŞIVAN PERWER:

Sehne:

Sembola hunera min.

Çepik:

Kêfxweşîya gelê min û hûrmeta wî ya bo min.

Muzik:

Reng û dengê jîyanê.

Evîn:

Tiştê ku mirovan dide jîyandin.

Yar:

Hevrêyê/a jîyanê.

Jîyan:

Bi qasî ku bersiva wê bê dayîn ne watedar e.

Riha:

Memleketê min... Bajarekî gelek kevin û hêja... Bajarekî lê hatime dinyayê û lê mezin bûme...

Diyarbakir:

Kemilandina sazûmankariya kurdîtiyê...

Stenbol:

Bajarekî dîrokî. Gelek caran bûye wargeha kemilandina kurdîtiyê...

Evropa:

Jîyanên modern... Dergûşa ronesans û reformê...

Brüksel:

Bajarekî ku hin endamên malbata min lê dijîn...

Parîs:

Ji bo min bîranîneke gelek gelek girîng....

lam-stran dibêjî çawa ku dikeví zikrê. Çine hestên te yên wê demê?

Heger konsantre nebim, nikarim hestên xwe tev li melodîyê bikim. Nikarim bi qewimîna ku vedibêjim re bibim yek. Heger li ser nefikirim, hestîyar nebim û negirîm, nikarim stran û kilamê biafirînim. Di sala 1986ê de, piştî konsereke xwe ya li Los Angelesê, hunermendê navdar ê Îranî Darîyûş hate cem min û got: "Xaşxaşê baş dikişîni haa!.. Ez jî jê hez dikim lê te zêde kişandîye Şivan!" Bi şaşwazî min lê vegerandibû: "Xaşxaşa çi?" Dîsa bi nîvheneke got: "Konsantrasyon û performans te gelek baş e, dîyar e te gelek kişandîye vê mîratê!" Min berê xwe dayê û min jê re got: "Kekê min, min di jîyana xwe de xaşxaş nekişandîye. Ne cigare, ne jî alkol vedixwim..!" Şaş û metel ma rebeno...

Sir an jî efsûnekî vê konsantrasyonê heye gelo?

Binêre kekê min, dema ez kilama "Xezal" bibêjim, divê wekî evîndarê Xezalê bibêjim. Divê ez lê bigerim ku evîna di dilê

Xezalê de bînim zimên. Dema kilama "Helebçeyê" bibêjim, divê bibim yek ji qurbanên jehrên kîmyewî. Divê li wê demê bijîm. Dijîm jixwe. Sedema meseleya "zikr"ê ev e bawer im...

Cara yekem te guh da kîjan lorî, çîrok û zêmarên kurdî?

Dema zarok bûm, heta ku çîrok ji min re nehatina gotin, di xew re nedicûm. Dayîka min digot. Xaletên min, mamên min, metikên min, xalên min dihatin cem me. Em malbateke mezin bûn. Dema ku dîya min nedixwest çîrokan ji min re bêje, ji xaleta min re digot: "De ka çîrokek ji kurik re bibêje, bila razê!" Nikaribûm bêyî guhdarîkirina çîrokan razê. Çîrokek carek tenê jî bihata gotin, di serê min de dima. Min ew ji ber dikir.

Xeyaleka te ya mezin hebû ku pêk nehat?

Min her xwestîye ku sazîyeke tenê ji bo muzîkê ava bikim. Bi vê yekê armanca min ew bû ku di navbera kurdan û cîhanê de pi-reke hunerî ava bikim. Di vî warî de bi ge-

Köln:

Bajarê ku jîyana min lê guherî û bajarê ku Serxwebûn lê hatîye dinyayê...

Stockholm:

Cihê ku min piranîya jîyana xwe lê derbas kir. Bajarê ku min piranîya xebatên xwe lê kirin. Û bajarê sar ê ku hevalê min ê herî nêzik Mehmûd Baksî tîne bîra min...

Amerîka:

Hêza Super!

Mozart:

Sembola mejî û birewerîya muzîkê... Mirovekî ku ji bo muzîkê dîn bibe...

Kawîs Axa:

Serdar, lûtke, delalî û welatperwerîya Muzîka Kurdî... Dengê herî xweş, bêhempa...

Mihemed Arif Cizrawî:

Qedîfe, nexş û rengînîya jîyanê. Gelek di bandora wî de mam... şahê sazê...

Şeroyê Biro:

Dengê herî xurt yê kurdên qefqasan...

Mehmûd Baksî:

Nexşa jîyanê... Pir baş bû, pir xerab bû! Pir modern bû, pir klasîk bû... Her tiştê wî ketibû nav hev... Lê bi her awayî de-

lal bû... Mirovekî wekî wî êdî tune ye, mixabin nabînim... Terka min kir û çû!..

Gulîstan Perwer:

Dîya kurê min...

Serxwebûn:

Kurê min... Jîyana min... Pêşeroja min...

Sîyaset:

Rengê azadî û aştiyê...

Zembîlfiroş:

Dirûstîya mirovan, evîna malbatê û sembola li dijî zilmê...

Derwêşê Evdî:

Sembola yekîtî, girêdan û mêrxasîyê...



► lên din re têkilîdayîn bo min yek ji armancên sereke bû. Min wiha min her xwestîye ku li ser muzîka kurdî lêkolînan bikim, muzîka kurdî di warê modernîteyê de derxim asta rajortirîn.

Yek ji sedemên "sirgûn"îya te jî "Konsera Sûrûcê" bû. Wê rojê çi qewimî?

Sal 1976 bû. Li seranserê welêt me konseran dida. Em çûn Batmanê. Dizanî, stranek heye ku dibêjim: "Ez çûm gundekî Batmanê, keçeke kurd ji min re got lo bira..." Li Batman û Merdîne em gelek gerîyan. Haya kesî ji me tunebû. Em çûn Erzeromê, Qaxizmanê, Agirîyê. Li konsera Bazîdê gelek kes hatin binçavkirin. Em çûn Diyardîne. Leşkeran nehişt ku em bilivin. Me



xwe li sînorê Îranê xist û çend rojan em li wir man. Paşî em vegerîyan hatin Enqereyê. Armanca me ew bû ku em tûrekî xweş bikin.

Wekî te jî anî ziman, me li Sûrûcê li sînameyekê konserek pêşkêş kir. Derdor tije polîs û leşker e. Kî derdikeve tê binçavkirin.

Edûlê:

Mînakeke gelek xurt a jinan... Nazik, dirûst û birûmet...

Îsot:

Bêyî wê nabe!..

Seddâm:

Dîktatorî... Navekî din ê enfalê...

Karapetê Xaço:

Şêweya dengê gelek xweş û pak... Temendirêjî... Lê lê dayikê tîne bîra mirovan!

Şakiro:

Bi rastî jî kûrahîya dengbêjîya klasîk...

Radyoya Erîvanê:

Yek ji damarên herî girîng ê muzîka kurdî... Mejîyê çanda kurdî...

Neşet Ertaş:

Hunermendekî tirk... Deng û saza wî gelek li hev tê... Jê gelek hez dikim...

Celal Guzelses:

Sembola dengê xweş... Dîyarbekirî, lê ji bo muzîka kurdî mînakekî xerab... Kilamên kurdî, di legena "turkce"yê de şûşt û kir "turku"..!

Zekî Muren:

Ji bo gel û muzîka xwe sembolekî mezin...

TRT:

Ji bo gelê xwe weşangerîyê ke baş....

Quleya Eyfelê:

Şahesereke mezin... Navekî din ê Parîsê...

Şivan Perwer:

Hunermendê gelê ku hewcedarê aşî û azadîyê ye... Hunermendê gelê ku tê perçiqandin... Bîr û boçûnên wî gelî çî be. Şivan Perwer jî ew e...

Saz:

Heger ew tunebûya dê nekarîbûma bijîm. Saza min her dem bû hevrê ji bo min. Her tişt çû, her tişt mehkûmê bidawîbûnê ye. Tiştê bimîne saz e! Her dem dengê yê xweşik û mafdar e...

Gazî min kirin ku îfadeya min bigirin. Komîteya amadekar hat ji min re got: "Heger tu neyê, dê me hemûyan bigirin û têra dilê xwe li me bixin. Divê tu îfada xwe bidî!" Min jî got, "Armanca wan ne îfadedayîna min e. Ez herim dê min bigirin û mesele jî safî dibe. Ez îfade nadim!" Yekî ji nav wan got: "Heger em tev bêne îşkencekirin jî em te teslîmê wan nakin. Emê çareyekê jî vê yekê re bibînin. Her der tijî leşker û polîs in. Kontrolekî ecêb heye. Gel ji bo te li derve, ji bedenên xwe bend ava kirîye, nahêlin ku polîs bikeve hundir.!"

Derketim sehnê û min kilamek got. Qîyamet rabû! Tevlihevîyek çêbû. Polîs xwest guhdar û beşdarên ji hev belav bike. Çawa bû min baş fêhm nekir, ji nav gel hin kesan ji paş ve ez derxistim û revandim. Xeyal meyal tê bîra min. Qulek vekiribûn çî bû!? Em revîyan û me xwe li zevîyeke pembû veşart. Me li nav zevîyê kir sibe. Berîya ku roj derkeve, me li derîyê hin malan xist. Ji tîrsa derîyên mala xwe ji me re venekirin. Digo-tin: "Em qûrbana we ne, niha leşker werin dê me hemûyan bigirin û bibin. Ji ber vê yekê em ji wir derketin û çûn ciheke din. Piştî demeke din jixwe serpêhatîya me ya sirgûnê destpê kir..."

Şivan Perwer di kîjan salê de terka welêt kir?

Di 15ê Hezîrana 1976ê de mecbûr mam, terka welatê ku lê hatime dinyayê û lê mezin bûme bikim. Wekî din çareserî tunebû. Ji dîtina gelek dost û hevalên xwe, ji wê rojê heta niha bêpar mame...

30 sal çêbûye! Ne hindik e... Kilamgotin, bedela kilamgotina bi zimanê kurdî hewçend gîran e?

Belê giran e ku hê jî fermalû me, sirgûn im! Bi kurdî strangotina te, belavbûyîna dengê te bo her derî, strangotina li ser aştî, azadî, serhildêrî li vê erdnîgarîyê ne hêsan bû. Helbet berdêla wê jî dê giran bûya! An ezê biketama hepsê, an jî ezê derketama

derveyî welêt û minê li wê derê stranên xwe, kilamên xwe bigota. Di nava meselê de mirin û jiholêrakirina min jî hebû. Min tu kesî nekuştibû. Min li dijî mirovahîyê tu sûcî nekiribû. Min bi tenê rastîya xwe, rastîya gelê xwe anîbû ziman û stranên gelê xwe vegotibû... Erê birako! Min bi kurdî kilam got, ev 30 salî in sirgûn im!..

Derketina te ya bo Ewropayê tesîreke çawa li hunera te kir?

Helbet Ewropa bandoreke mezin li min kir. Çavên min ji jîyanê re vekir. Helbet alîyên xerab yên Ewropayê jî hene. Ew ji me re ne pêwîst in. Li hêla din min kurdewarîya xwe, netewetîya xwe tu caran jibîr nekir. Alîyên ewropî û alîyên kurdewarî di kesayetîya min de baş rûniştine.

Bo nimûne, wekî hunermendekî kurd li Ewropayê di warê dîtina mijaran de tengasî derdikevin an na?

Na dernakeve! Dema tu cîhanê baş bişopîni di vî warî de dê tu zehmetîyan nekişîni. Îro tora ragihandinê, teknoloji gelek bi pêş ketîye. Her pêşketina diqewime mirov yekser jê agahdar dibe. Meseleya entegrasyonê dibe ku carinan mejîyê we tevlihev bike, bes ew e û hew! Li hêla din her di dilê min de ev hebûye. Her dem li Rihayê bûme, li Batmanê, li Dîyarbekirê, li Enqerê, li Stenbolê, li Edenê bûme. Dema wiha be, rastîya Tirkîye û Kurdistanê hewçend berbiçav be, di warê meseleya dîtina mijarê de jî dê zehmetî tunebin...

Kurd, bi çavekî çawa nêzîkahî li muzîka xwe dikin?

Muzîka kurdî dewlemend e û ev dewlemendî bala mîsyoneran, bala zanyaran, bala folklorîstên navdar dikişîne ser xwe. Lê mixabin haya kurdan ji bayê felekê tune. Haya wan jî vê yekê tune! Diçî mala kur-



➤ dan, rastî muzîka farisan, ereban û tirkan têtî. Kurdî jî heye, lê temaşe dikî avêtine qorzîyekê. Heyf e, şerm e... (kurtedemek bêdeng dimîne, paşê berdewam dike) "Hûn çima wisa dikin ezbenî!", dibêjim. Bersiv amade ye: "Ev xîtabî dilê me dikin, gelek xweş behsa evîne dikin, orkestrayê gelek baş bi kar tînin. Yê me vê yekê bi gundîyane dikin..!" dibêjin... Maf didî wan an nadî wan, ew bi ya te maye. Lê bi ya min, dema mîletek bibêje; "Filankes baş in, yê me xerab in !" wî mîletî wî wî kirîye, qedir nade xwe...

Dema serê xwe datîne ser balgîvê, mûhasebeya xwe ya wîcdanî dike Şivan Perwer? Piştî hewqas salan wîcdanê te rehet e gelo? Tiştê ku wekî kûl di dilê te de ma, heye?

Hinek tişt hene belê... Min dikaribû hin karan baş organîze bikira mesela. Derfetên min jî hebûn. Min dikaribû saltanatek ava bikira. Bendewariyên gel hebûn ji min. Min dikaribû hinekî din bi sergirani tevbigeriya. Bala xwe didim rabirdûya xwe dibînim ku min zêde wext daye kesên nehêja! Gelek caran difikirim ku divê kêmtir bigeriya. Gelek caran bûm qûrbane zewqên xwe. Bo nimûne, jinek gelek ji min hez kirîye, li pey min gerîyaye. Divê min daxwazên wê, wekî daxwazên normal nedîta û nêzî wê nebûma. Divê bersiva min, bi aliyê min ê hunerî bûya. Divê min bi awayekî insanî nêzikahî lê bikira. Divê min wiha ji wan re bigota: "Ez ne li gorî te me! Min wekî Şivan Perwer bibîne, evîna xwe di dilê xwe de veşêre!" Divê bi armancên din min nêzikahî lê nekir û min destê xwe neda wan. Hinek caran min bi awayên din nêzikahî li wan kir, lê paşê gelek poşman bûm. Jin evîndarê min dibûn, ji bo min digirîyan. Ez bi vê yekê diêşî-

yam. Min di dilê xwe de digot; "Wiha nabe! Tiştên wisa qet ne baş in Şivan! Te çima wiha kir?" Di dawiyê de min li xwe dixist... Dema zewicî bûm jî, têkilîyên min bi jinan re çêbûn. Li ber jina xwe diketim. Min her digot; "Min çima wisa kir. Ev îxanet e, ev zilm e..!" Lê jina li hember min dev ji min bernedida, gelek dixwest, perîşan bibû...

Lê mûhasebeya wîcdanî, di vî warî de rehet î?

Belê di vî warî de wîcdanê min gelek rehet e. Lê di warê teorîk de min hunera xwe bi pêş ve nebîr. Zêdetir di warê pratîk de min karê xwe kir. Divê min kompozîsyona xwe, bi xwe bikira. Hê jî mecbûr im ku hin kesên din van karên min bikin. Min zêdetir dema xwe da, gel, ger û sîyasetê. Min jîyana xwe nexist nava tekûziyê. Di warê teorî de min xwe bi pêş nexist mesela. Di demên berê de min gelek kitêb dixwendin. Lê di demên dawî de gelek kêmtir dixwînim. Helbet kitêba min, civak bixwe ye. Bi gelek mirovan re rûbirû mam, bi wan re axivîm. Bi pîrsgirêkên gel re rûbirû mam, ev bixwe jî wekî xwendinê bû ji bo min...

Hêja Şivan Perwer, gelek spas ji bo terxankirina demê û bersivdayîna pîrsan... Spasxweş, çavê min î... ■

Raman û Hêvî

BERHÎM PAŞA

di girtîgeha mêjîyê min de
raman jê dizên û oxil didin
her hucreyek min dibe pêtiga hêvîyan
hêvî

carna dibin êga umr
jehrê berdidin rayê min
jan li dilê min dixê
di binê heft tebek erd de
diqîrim
tarîya şevê qêrînan dîl werdigre
şev

ax şev herûher şev
hêvîyên herî xweşik
di tarîya şevan de pêk dihat
lê îşev
ne sayî ye xem e kerb e
û dêwê heftserî ye
mîna keftaran diranan li hev dixê
bi tirs û sawir di ser min de têt
dibim hezar perçe
bi her perçeyekî xwe ez
li benda berbangê me
berbang hêvîyek din e li aso
ma gelo têgîhan mimkûn be

tav bi renekî din heltê
di bin perdeyek mij û dûman de
lêbelê dîsa jî ez
bi bervî tavê dibezim
tav bervî rojava

sî dirêjtir aso sortir dibe
vediciniqim
tavilê bi gavên gir dimeşim
dikevim radibim dibezim
diwestim ji qam de dikevim
û
vedikevim li cîhekî bêezman

Texmîs*

ABDULKADÎR BÎNGÖL

Ma dizanî bo çî her rondik ji çavan rêz dibî,
Her dem û daîm dinalim, şev heta danê sibî.
Wer bipirs da tu ji vê raza ecaîp hîn bibî:
Ey dilê meskenê derdan, ma tu zanî ku çibî?
Ew Seîdê can fîda j' dînê mera j' kîsê me bî.

Canfida bû qehreman bû, dest bi şûrê ilmê dîn,
Nur dixwend û Nur dirêt û her zaman û an û hîn.
Ger bixwazî wî binasî, wer Risalên wî bibîn.
Beyreqa ku wî hilanî jibo vî dînê mubîn.
Me çîqa pîrsî û seh kir vê demê kes dî nebî.

Kes nemabû dîn vegota wê dema zulm û zecir,
Nalenala ehlê dîn bû, ehlê dil, ehlê zikir,
Ew li ber wê zulma rabû lê bi tedbîr û sebir,
Çepera dîn girtibû, pakî ji keskî nedikir,
Heq dizanî, heq digot û heq dikir; herdem we bî.

Tirs nebû jê ra ji lewra bê sekin, daîm digot,
Herkesê carek bidîta kufr û nîfaq jê dişot,
Sohbeta wî ya mibarek cerg û mêlak tê disot,
Ew dikana ku wî danî, ew metaê difiro,
Ew li Şam û Misr û Bexdayê niho peyda nebî.

Ne li Delhî, ne li Tehran, ne li Şîraz, ta Giver,
Yek nebû ehlê dîyanet lê kira qîr û mefer.
Sal hezar û nehseû şêst mahê rojî dem seher,
Çû wetat kir, çî mûsîbet! Sedhezar rehmet li ser,
J' ehlê vî dînê mûbîn ra çî nimûnek taze bî.

Cadeyek nû wî vedanî boyî xortên ummetê,
Ew di Barla û Emîrdax xerq dibû nav xizmetê
Wî di umrê xoy ezîz da guh nedabû lezetê,
Sêsed û heftî û neh piştî hezarê Hicretê,
Dergehê baxê Biheştê keremê l'ber wî vebî

Ebû Cehlên vî zemanî, zalimên hêc û bitir,
Şandibûn Afyon û Barla, Qestemon û Eyrîdir.
Ew gula Kurdên reben bû, lê nehiştin ew li vir
Ew li Nursê hate dinya, wî li Urfayê wefat kir,
Ew şehîr bû, ew bedî' bû, ez çî bêm, serdeste bû.

Sahibê "ilmê Ledûn" bû, dafi'ê hizna beşer,
Xwendina Nûra Îlahî nedida zêr û zeber,
Fırqeta Wî em helandin sed hewar, ax û keser,
Ey Seîdê herdu dinya, dîtina te bû keder,
Em j' Xwedayê xwe dixwazin: L'axretê em l'cem te bî.

Em ji derdê fırqeta Wî bûne jar, bûne zebûn,
Şubhetê mecnûn dinalîn qet nema sebr û sikûn,
"Dilkula!" firset li dest e, wer Rislanê Nûr bixûn!
Ey 'Elî, ger çî Seîd çû, lê Risalê Nûr neçûn,
Sed emanet min li te, da tu ji wan mehrûm nebî.

* Ev texmîs, li ser şê'ra Seyyid Elîyê Findikî hatiye çekirin.
Herdu misreyên dawî yê Seyyid Elî ne.

Kall Haco

DILŞAD MUTÎ

dilsad_muti@hotmail.com

„Emîne Emîne, nazdar û şêrîn e
Îro tu ji min dûrketî yarê, çavê-m te nabîne“

Bi tembûra xwe re bi dengê xwe yê nazik distrînê Ciwanê me. Hê 13-14 salî ye. Li milê dî bi dengê teq û reqa qedeha re, ji bo Ciwan dengê tezewratê ji nav civatê tê, “bî-jî Ciwan! bîjî“

Pê şa dibin û pêre pêre cesaret didinê. Lewra hê di vî umrî de qebîlyetek wiha, nişana serkeftina Ciwan ya pêşerojê ye. Hê di dema zaroktayîya xwe de di bin tesîra muzîka Mihemed Şêxo de dimînê û dest bi tembûr û strandinê dike. Heta domahîya tehsîla xwe ya Lîseyê bi vî awayî ji xwe û derdora xwe re li temburê didê û distirîne. Piştî xwandina xwe ya lîseyê tê Almanya û li vir di zanîngeha Boçumê de sê sala perwerdeya muzîkê dibînê û li vira bi awayekî profesyonel dest bi muzîkê dike.

Dem dema şoreşgerîyê ye. Cihan du şiq e. Li alîyekê bloka Sovyet li alîyê dî Emrîka. Fikrê sosyalîstî di nava gelê bindest de hikim dike û hespê xwe di nava wan de dibazînê. Ciwanê min û te jî herwekî dilxwazekî kurd di bin tesîra sosyalîzmê de ye û dixwaze bi muzîka xwe xizmeta da'wa xwe bike. Di xebata xwe ya yekemîn de bi giştî van neqşa dîneqşîne:

“Te ilmê Markîs te xwand
Te ilmê Lenîn te xwand
Ji bo rizgarîyê, dijî kedxwarîyê

Guevara! Guevara! Ey heval Guevara...“

“Karkeran cotkeran sosyalîstan komonîstan.

Ev dema aşitî xwaza heyyy!


Markîs û Lenîn rabûn

Keçê kurdan şiyarbûn, xortê kurdan şiyarbûn...“

Ev xebata wî di nava kurdên li Ewrûpa de tê ecibandin û cîyekî girîng digire. Seb ku tesîrê li hêstên wa dike û xwastek û daxwazên wan tîne ziman. Ev yek jî cesaret didê Ciwan û berê wî didê xebatên nû û cida. “Çima ne tişteke nû! Çima ne tişteke baştir?” bi vî fikrî rê dikeve û dest bi xebatnên cida di muzîkê de dike.

Ciwan têkilîyên xwe bi gîtarîstekê ereb yê Misrî re çêdike û herdik bi hev re dest bi xebateke nû dikin. Di vê xebatê de bi neqş û motîvên rojhilatî re rengê rojavayî li nav dixin. Xebat bi melodiyên melenkolîk û xemgînî, hestên şoreşvanî û evînî tîne ziman. Cara yekem e ku Ciwan helbestek bê wezin dixwîne û vî rengî tevî muzîka xwe, belkî jî tevî muzîka kurdî dike. Helbest ji şairê serbestnivîs Rojan Barnas e:





Ciwan Herçiqas

derketiye û bi awayek xweser, xwe didê pêş. Balam ev stîl cara yekem e, ku di dîroka tembûrê de tê lêxistin. Loma jî hin derdorê kevneperestên tembûrê rexneyên nakokî tên, çima saz di stîla gîtarê de hatiya lêxistin.

Gotinên stranên dî, bi piranî ji helbestên Cegerxwîn pêktên. Wekî li ser her stranbêjê kurd, li ser Ciwan jî tesîra şairê bi nav û deng Seydayê Cegerxwîn balkêş e û di albûmên piştî vêre jî ev yek xwe dide xwiyakirinê. Helbestên seyda bi weznin û ji lêkirina melodîyan re birêk in.

► “Min navê xwe kola li bircên Dîyarbekir gava ku stêrik li ezmana stûxwar gava ku ney û bilûr û tembûr û dahol û zirne sar bûn, sar bûn”

Bi jan û zehmetkêşiya gelê Kurd re, bindestî û jariya gelê Filistînê jî nayê jibîrkirin. Biratîya van herdu gelên bindest tê zikirandin û herwekî din stranek bi zimanê erebî jî tê xwandin:

“Bîlad arabîye, Filistîn el muhtilla
Unşuûda sewrîye, Filistîn kubrîya

Ihnemeek ya Filistîn, a tura bel kadihîn
Ihnemeek ya Filistîn, mûanîn cainîn...”

Di vê albûmê de giraniya gitar a klasîk û tembûrê li pêş e. Tiştê herî balkêş tingênîya tembûra Ciwan e, ku ji sînorên tembûrê

Herçiqas ev xebata Ciwan çî girseyek balkêş ya guhdarvana nagirê jî, ew ji ya xwe nayê xwarê û di çarçoveya xwe de guhartinên nû diceribîne. Belê ev yek kirîye serê xwe de ku sînorên muzîka kurdî ya klasîk bi herifîne. Hevalên wî yê muzîkçêker yê Ewrûpî çêdibin û têkiliyê muzîkê di nava wan da xurt dibin. Bi halatên muzîkê yê cida herkes ji qabilîyeta xwe tevî vî awayê muzîke dîke û îcar ji vir pêde tarzek muzîkek nû, “muzîka Ciwan û hevalên wî” jîn dibe. Wekî her yek ji wan ji hidama xwe ve, xwê û biharatên xwe bavêjin sîtil a nîskê û tam û lezetek nû û cida derdikeve hole. Ji albuma “Gula Sor” bigire heta bi “Destana Egîdekî” Ciwan her diçe û xwe li tiştêk nû diqewimîne. Ji van xebatan yek naşibhe yekê lêbelê ji çarçoveya stîla “muzîka Ciwan û hevalên wî” jî naderkeve. Gih soksafon li pêş e, gih bas gîtar, gih elektro, car tembika misrî, car car jî tembûra Ciwan ya xweser.

Ciwan li piranî yan jî hindikbûna guhdarvana nade berçava û muzîka xwe ya xweser çêdike. Ev cidabûn muzîka wî ku mirov nizane ji kîjan malbata muzîkê ye, qaliteyekê didê muzîka wî. Herwekî dî mînak û

hefkufiya vê muzîkê kê mî tê xwîyakirine.

Di muzîka Ciwan û hevalên wî de, xet û xîşkên Beatles, Pink Floyd û Miradê Kinê berçav in. Hem di gotinan de hem jî di melodîyan de. Wekî "money" a Pink Floyd û "pere" ya Ciwan Haco. Herwekî di jî Mirado gotinên erotîk rîtmê kemaçeya wî di çend helbestên Ciwan de eşkere ye. Di her sen'etî de, wekî wêje, wêne, heykel hwd., di muzîkê de jî ev tiştêk tabîî ye. Sen'et bi sen'et radibe.

Melayê Cizîrî jî di bin tesîra Hafîzê Şîrazî de maye lê jî wî derbasdibê û heta pişt re wî qaçeboyî meydanê dike;

*Ger lûlûyê mensûrî jî nezmê tu dixwazî
Wer şîrê Melê bîn, bi Şîrazî te çî hacet*

Sebebê ku Mela di cîhanê de, bi qasî Hafîz ne meşure, ne ku jî Hafîz kêmtir e, lê jî Hafîz bêxwedîtir e. Seb ku bi zîmanekî bê xwedî, yanî bi kurdî nivîsiye.

Her çiqas Ciwan di bin tesîra hin muzîkçêkera da mabê jî, bi ya min li wan zêde kirîye. Lewra tarzek cîda û xweser vejînkirîye. Muzîka wî mirov dikarê ne bi rock, ne bi folck, ne bi jazz, ne bi bluese ne jî bi merengue nav bike. Hek ku The Beatles lê guhdar bikira, wê destê wî biramûsa, hek ku Miradê Kinê li heyatê ba wê jî Ciwan re bi gota "afîrim birazî" seb ku wa yê jî qalîteya vê muzîkê fehm bikira. Yanî "Durrê bidin durrnase"

Gelo pîvana qalîteya muzîkeke çîye? Pîranîya guhdarvana ye an pîr firotina albûma ye? Girseya li qonserte ye an jî seviyeya guhdarvana ye? Bi ya min qalîteya muzîkê yan jî ya muzîkvan seviyeya guhdarvanê wê kifş dike. Tenê guhdarvanên întelektuel dikarin muzîka muzîkçêkerên heyî payabilind wekî Wolfgang Amedeus Mozart (1756-1791), Ludwig van Beethoven (1770-1827), Johannes Brahms (1833-1897) û çendekê di yên wekî va, guhdarbikin. Herçiqas stîla muzîka va şexsa cîda be jî, di dinyaya muzîkê de wekî hîmê muzîkê hati-

ne qebûlkirin. Ger ku meriv albûma Kamkarsa ya bi navê „Xak“ li yekî ku guhê wî hî-nî muzîkê nebûyî bide guhdarkirin, herçiqas ev albûm bi sinet û hostatîyek pîr bilind hatîye çêkirin jî, wê tehemula wî nebe wê albumê jî serî heta binî carekê guhdarbikê û dibe ku wê di pencerê re jî bavêjê.

Dema ku mamostayê minê gîtarê yê Alman ku li Zanîngeha Freiburgê 4 sal tehsîla muzîkê girtîye û niha mamostatîya gîtarê dike, li strana Ciwan ya bi navê "Xatûn" guhdar kirî, lê heyran ma û xwest ku ez wê albûmê dîyarî wî bikim. Çikû wî sinet û neqşê di wê helbestê de hatî neqîşandin dîtibûn.

Wek mîsala Melê, sebebê ku Ciwan nabûye muzîkçêkerê navnetewî ne ku jî qelsîya wî, lê jî bêxwedîtîya wî ye. Wî jî bi zîmanê bêxwedî, bi zîmanê kurdî strandîye.

Herwekî muzîka xebatên wî, tekstên muzîka wî jî cûrbecûr bûn. Helbestên şaîrên kurd wekî Cîgerxwîn, Qedrican, Ahmet Arîf, Rojan Barnas, Seydayê Gerok, Fazîl Xîznewî hwd. wateyek felsefî, gih mîstîk û tewe-wûfî, gih polîtîk, gih jî hewayek erotîk li muzîka Haco werdikir. Gava mirov li strana "Dil ji min bir" guhdar dike, efsaneya Şêxê Senanî û Keçîka Gurcî tê bîra mirov.

.....
Wê dil ji pîran jî revand
Perde nema wê nedirand
Sofî ji kuncê zîvirand
Ji ser û dil îman firand"

Ji bilî tekst û muzîkên xwe Ciwan, car jî stranên gelêrî xwendine. Lê ev stranên gelêrî di nava xebatên wî de, cîyekî hindik digirin. Yê heyî jî li gor xwe guhartine û bi uslûba xwe ya xweser xwendine. Ev yek jî hostatîya wî dide xwîyakirinê.



➤ Ciwan herçiaqas li muzîka xwe enstrumanên nû zêdekirin û hewldanên xebatên nû di muzîka kurdî de kirin jî, di serî de di nava gelê kurd de çiyê xwe yê layiq negirt û baş nehate naskirin. Seb ku muzîkan Ciwan li guhê wa xerîb dihat û gotinên muzîkan jî ji her guhdarvanî re nedihatine fehmkirinê. Muzîk bîyanî, wateya gotina kûr û felsefîkbû. Di ser vê de devokê Ciwan yê Torê û daqurtandina wî ya gotinan ev yek hê zehmettir dikir. Li himberê vê jî, wî dest ji xebatên xwe neberda. Ji nivê salên 90 pêde hêdî hêdî ji Ciwan re girseyak guhdarvana çêbû. Lewra di zanîngehên Tirkîyeyê de xwendevanê kurd zêde dibûn û guhên wan li vê muzîka nû vedibû. Herwekî dî pêwistîya va ciwanan bi nûbûnê hebû û her nûbûnek di çanda wa de ji wan re balkêş bû. Piştî çend car guhdarkirina sitraneka wî, hem wateya gotinan dihate fehmkirinê hem nji ya harî balkêş ew e ku muzîka wî gir ji guhdarvanê xwe re çêdikir.

Alaqa û hesjêkirina Ciwan her çîqa diçû di nava xwendakarê kurd de mezin dibû û heta ev yek di nava xwandakarên tirk de jî belav dibû. Dema Ciwan cara yekem hatî Batmanê ev yek hê ji nûve bi çavê xwe dît û ew bi xwe jî ecêbmayî bû.

Li ser vê yekê Ciwan xwest ku guhdarvanên xwe mukafat bike û muzîkek nû dîyarî wa bike. Ji lew dest bi muzîka elektro-rîtmîk kir da guhdarvane wî çêtir bikaribin xwe li ber muzîka wî hilkutin. Lê Ciwan nizanîbû ku ew girse girseya „Blûra min“ bû, lê ne ya „Sê sê“. Hê nûka ji vir pêde, xortên ku fêhm nedikirin ka çima birayên wan ewqas qedir didin muzîka Ciwan û lê guhdar dikin, heq dane wan. Ji xwere gotin „Emrîkîno! Vaye muzîka me jî ya pop heye“. Lewra hê nûka ji vir pêde malbata muzîka wî çêbû û

muzîka wî ya nû ji xweserîyê derket û ew bi wek muzîkek ku her muzîkvan bikaribe bi rêya enstrumanê elektronîk çêbike. Dema guhdarvanên Ciwan yê kevin li „Derya“ guhdarî kirin, ji xwe re gotin; „Xem nake. Ev Ciwan e. Her di xebatek xwe ya nû de xwe li tişteke nû diqewimîne“. Lê hinga dipeyî vê re „Na na“ û „Off“ di eynî tarzê de derket, xeyalîkestî bûn û vekar gotin; „Ciwan kall bûye.“

Belê Ciwan bi van xebatên xwe yê dawî girseya guhdarvanên xwe ferehtirkir lê pêre yên kevin jî enirandin. Lê ev yek ne ji pîrbûna wî ye, ne jî ji bêtaqetbûna wî ye. Bilekis ji „Ciwan“bûna wî ye ku her dixwaze guhartinan di muzîka xwede çê bikê û muzîka xwe can bikê. Herwekî dî emrê muzîkê nîne. Îbrahîm Ferrarî di muzîka salsa-latîno de yekî ji herî bi navûdeng bû û wî heta dawîya emrê xwe muzîka xwe domand û ji qalîteya wî çî kêmasî çênebû.

Me xwastibû ku em bi Ciwan Haco re li ser wî û muzîka wî sohbetekê bikin, lê mixabin hinga me Ciwan dît ew nerehetbû sohbeta me jî pêk nehat. Dema ku ez ji cem vegeyîyam ji radyoyek almanî ya beşa kurdî du hevalên dî dixwestin pêre hevpeyvînekê pêkbînin. Wa ji min pirsikir ka hevpeyvîna min pêre çêbû an na. Min ji wan re got: „Kurê mala Haco Axa ye bavo. Hingî bitir e, ji xwe li xwe neniha bi mere jî bi axivê“

Wan hevalan li min vegeand; „Sucê we kurdên başûrê mezin e bavê min. Hûn bi 300000 insanî wî pêşwazî bikin, ji xwe forsa wî ya çêbe.“

Min ji xwe re got „Xem nakê ku Ciwan bitir bê. Ev yek lê tê û ev heqqê wî ye. Lewra ew „Kall“ê muzîka kurdî ya modern e. Na na hê hevqas insanên dî ji wî re kêmbûn.“

Lê me soza sohbetekê ji Ciwan standîye û me dil heye ku em vê dî pêşerojê de bi we re hevpar bikin. ■

Evîn Şahê Hemî Welatan e

CANKURD

Tevîya bajêr li bin balkona wî bû
Lê ji wî ve dûr dixuya
Tenê çemekî biçûk ê hêdî-hêdî di nav
re diherikî
Ji wî ve nêz bû
Pir nêz bû
Wek damarek a şîn dilê wî...

"- Ro pir mezin e
Ji wê mestir tişteke tune..."
Şagirda panzdeh salî û porzêrîn tilîya
xwe hilda.
"-Mamoste, ma hîç tişteke ji royê
mestir tune?!"
"-Li min biborînîn... biborînîn...
Tenê hezkirin jê mestir e."
Û çavêd wî yên pîrbûyîne yekser şil
bûn.

Sînor û serhedên zevîyan hene
Yên bax û baxçeyan hene
Yên mîrnişîn û welatan hene
Lê sînorên evîne tunene...
Evîn welatê bê sînor e
Baxê bê tixûb e

...û zevîne bê serhed e.

"- Gava tu di ber mezelê Şêx re biçî,
Devê xwe bigire, nepeyive û nekene."
Va gotina dayikê dîsa hat bîra wî.
Li rûyêd hogiran nêrîya,
Yek û yek di ber mezelê Şêx re derbas
bûn.
Ji tîrsa Şêx, tev wek çirîyan zer
bûbûn
Ji nişka ve kenîya...
Kenê wî bi ber zinarên newalê ket.
Lê ji wî pê ve
Dîyar bû ku kesekî kenê wî nedibihîst
Giş li pê mirî bûn.

Bûyer:

"Tozek mejîyê te heba
Te wilo nedikir!"
...û destê xwe da ser piştê wî
Bî derve de têve da.
Li derve tenê heyvek rûpaqij û berken bûyî
li wan dinêriye.



➤ NAME:

"Eger li şûna min bavê wê ba...
Tu yekser dikuşt, tu parçeparçe dikir. "

Hefteyek derbaş bû...
"Tu çawa wilo bêtirs hatî razanga
min?"

Ma tu şêt bûyî?...
Di wê şevê de
Ma evîné tu kûr kirî?
Dayika min ji zû ve tu dîtibû...
Ew tirsîyabû, ku tu ji hembêza min
dernekevî.

Silavek ji dil. "

Name du car dî xwend
Da ser dilê xwe
Gelek caran maç kir
...û avêt nav kizotên agirî...

Bo her demekê şahek heye
Bo her welatekî şahek heye
Lê hezkirin şahê her deman û hemî
welatan e...

"Tu çima kezeba dayika xwe reş dikî?
Tu keça mamê xwe nabî
Çavê te her li keça taxa jorîn e..."

"-Dayê kezeba te ji zarotîyê de reş e.
Hingê ne ez hebûm, ne keça taxa
jorîn..."

Erê dayê... kezeba te ji berê de reş e
... û ya tevîya mirovan jî. "

Tevîya êvarê
Li ser sewkîya malê
Li bin heyvek çardesalî
Ji gundîyan re şîrove kir
"Zevîn wek goyekê ye
Gilok û gilover e..."

Lê kesekî bawer nekir
Pîrsek ji girê reş mestir her hebû:
"Çawa ewên li alîyê binî
Ji zevîné ve nakevin?. "

Nîvşev
Li ser doşeka xwe ya rayêxistî
Li bin stêrkên kadizê
Westîyayî û pîrbûyî
Xwe dirêj kir û cigareyek kişand
Dawî gote wan stêrkên, ku bi milyonan
diçilvilîn
...û çav tijî pîrs bûn:
"Ez im yê şaş... ez im yê şaş... "
Nivîn kişand serîyê xwe û di xew ve
çû...

Xewek kûr û dirêj
...û carek dî serîyê xwe ranekir.

01. 05. 2006

Zirav û Tîj

FAHRETTİN İNCE

Li qiraxa wê de xwêdan
Û li derazîngê de rondik
Pêlek zirav û tîj e jîyan
Û behrek pir bi kef
Gotina dawîyê nade te
Û tu dê westîyayî bikevî
Wextê tu lê difikirî
Wêca rake serê xwe, bikeve rê
Awirên xwe li neynûkan bide
Bila gulên sor ên jîyanê biweşîne ser enîya te
Û paşî vegere kitêbê
yek û yek bixwîne cumleyên wê
xiz bike binên kenên îtalîk
aha wê gavê tu dê hevbûna roj û şînkatiyê bibînî
hilveşîne axînên xwe yên te zû da bû terk kirî
û paşî belav bike li ber bayê deryayê wan axînan
dîsa vegere nava kitêbê
bixwîne wan gotinên te çav lê badidan
belê ew pêla zirav û tîj dê bikeve dûv te
gotina dawî nadete te
wî serê xwe yê çemyayî hilde
lê binêre ka dilê te li kû ye û paşî
nerewe ji tellalên demê ên ketine dûv te
herê
te di qiraxê de xwêdan û di derazîngê de rondik rêt
lewra di anafora jîyana zirav û tîj de sirr veşartîne...

12 Tîrmeh 06

Lûleper

ÖMER DILSOZ

Lûleper

Li beyarekê, li taldeyeke veder
Bi kîjan êşê vedihewînî bêhna xwe
Ji kîjan keserê,
Ji kîjan rondikê,
Ji kîjan dilopa xwînê;
Ji dilê kê diniquî?

Lûleper...

Êşan nede der
Ev, taldeya veder
Ew, wargeha bêserober
Ev, rûgeha rengqemer
Ew, dilgeha birîn bi xencer...

Lûleper

Demsal di nava demsalê de, li çaleke
bêbinî
Kêliyên herî watedar dinixumîne
Kêliyên ji temenê evîna min a talankirî
Evîna min a bizmêk lêkirî
Evîna min a di nava wan kêliyan de
jibîkirî

Ax Lûleper,

Were, xwe nede alîyê veder
Ev, em ên ji hev belav
Ew, em ên bê sîtav
Ev, em ên wekî ribadan hev xur
Ew, em ên li dij hev wekî şûr

Erê Lûleper,

Ji êşan dizên kahnîyên vê axê
Di malzaroka kovanan de
Kêliyên bêdestûr têne ber
Gana vê dîrokê heram e
Bi tovîkê janê hatiye meyandin

Lûleper...

Êşan nede der
Ev, taldeya veder
Ew, wargeha bêserober
Ev, rûgeha rengqemer
Ew, dilgeha birîn bi xencer...

Lûleper...

Ax Lûleper,
Zimanê min ji bo çî bigirê tê
Peyv dîxesin
Di nava hilmijîna windakirinê de
Nayên rêzê gotin,
Nakevin dû hev
Saz nabin hevok
Asê dibe...
Ev dûrdikeve, dibe ew
Ew winda dibe, dibe ewê dîtir
Ewê dîtir xwe li tu asoyan ranagire
Veder...
Derbeder...
Bê şûn û bê dever...
Ax Lûleper!
Nayê gotin, nayê gotin ka çend giran e
ev keder.

Lûleper...

Kêliya herî rast,
Bizaveke serbest;
Bêyî ku li tûrê demê bialiqe
Di nava henasa min de diqerise
Hilmijîneke bêqîmet
Di rondika çavê min de winda dibe
Ev...
Hemû ev ên min winda dibin
Hemû...
Hemû ev ên min terka min dikin
Çî xerîb e ne wisa;
Li valahîyeke veder,
Li vederîyeke vala;
Di nava hilmijîna kêlikekê de pûç
dibim.

Lûleper,

Çî ecêb e ne wisa;
Kengî bixwazim winda bibim
Bêhna te seh dikim
Kengî bixwazim te bêhn bikim
Te winda dikim
Tu jî çî zû diçilmisî Lûleper!

dilketîyê te aniha çi mame?

BAMED SERDAR

*dilketîyê te aniha çi mame
du tew li çavên te belkî
di şewqa heyveke cemidî de mame*

*aqubeta min
dûr xwe dispêrim bextê te
bajarê ku di bêhna te de şikestî
kêm dirêj dibin kolan
bendewarî raxistîye li navbera me
ez xeta pêşî ya kilê te
tu êşa şikestî ya çavên min*

*dilketîyê te aniha çi mame
xewle û li te hindik mame
di her bîranînekê de xwe kûr dihonim*

Nûbihar

DILŞAD MUTÎ

dilsad_muti@hotmail.com

Wêje durr e, edeb durrdane ye
Abî-heyatî li meyxane ye
Heger tu têhn û lebteşne ye
Keremke vexwe ji Nûbiharê

Serkaniyek zelal û bê teref
Morîya lê bi reqs e, sef bi sef
Ji yaqut û hin ji almas û sedef
Li xeml û gerdena Nûbiharê

Ger tu aşiq î û divit evîn
Li dergê evînê bikit civîn
Ji şerbeta işqê vexwit bi vîn
Bi tas û qedeha Nûbiharê

Baxçeyek tev bi çîçek û reng e
Şalûla lê xweş awaz û deng e
Hem bi mitrib, saz û ney û çeng e
Yek gull ji baxçê Nûbiharê

Li gulê aşiq ger tu bilbil î
Wekî min Dilşadî dil bi kul î
Hewce nakit çi gazinc û gilî
Merhem l'eczexana Nûbiharê

Ji şerqê der dema şahê exter
Ji zilmetê namînit çi eser
Cehlet li zanîne nabit serwer
Zanyarî ronîya Nûbiharê

Herdemê ku sê car hiltê hîlal
Şibhetê herçar mewsimên li sal
Qitre qitre ji deryayek zelal
Di nuqtîne li ser Nûbiharê

Her çar demsalên ji hev cida
Peywestene bi emrê Xwida
Yek ji wan şah, yê dî li dor geda
Ismê xwe neqşand li Nûbiharê

Li payîz û havîn û biharê
Hem li vistan û seqem û sarê
Pesin pûç e lew kesek nikarê
Bihar e herdem li Nûbiharê

Tîrmih 2006/ Breisach

W.K Merdimîn ra Şîrî

Qenaet

Bêbawan ra ca ra çirey pird nêbeno
Pê lomeyan merdim çirey gird nêbeno
"Qenaet xezîneyêka bêpeynî ya"
Çimvêşan dinya de çirey mird nêbeno
Sibate-2006

Ez a

Eke kewt reye wayirî karwan ez a
Peso vîndîbîyayî rê gawan ez a
Bêvengey bêkesan wa to nêxapîno
Fekê tat û lalan d' qal û ziwan ez a

Sibate-2006

Ti

Roşnayê asmen û erdan Ti yî
Tik û têna darûy' derdan Ti yî
Dem û dehran de, binê behran de
Wayir ganî û bêganen Ti yî

Sibate-2006



Cu û merg

OMER FARUK ÇETİNKAPLAN

Bê zerrî û bê haya
Reyeyê ma kewt na dinya
Ma barê xo na ro
Merg ra cu, cu ra merg
Hem cu, hem merg...
Ganî ra merde, merde ra ganî...
Huner oyo ke ti bizanî
Beşkî biwanî...
Kam yew sînayeyî ma merd,
Taye hêvîyê ma zî tede berd.
Hinî kamî se kerd.
Her kesî goreyê xo şimit û werd.
Meşkê xo tede şa,
Tayên kilm, tayên derg
Keye kerd.
Ge qehrîya, ge bi şa..
Viraşteyê Homayî her ganî
Mûr û mar, gend û gemar...
Merd û namerd, sîm û zerd...
Emrêko pê mavite vîyarna
Ha kilm, ha derg
Cuwîya û merd.
Xo vîr ra meke, bizan!
"Kullu men 'aleyha fan!"*
Belê!
Payîzo peyen ê emrê xo de
Ma çend ling şa erd,
Ma se kerd, nêkerd
Heme çî xo rê kerd derd...
La,
Peynîya peyên de
Homayî
Sey xo kerd!

Gulane-2006

Mewlid-Yûsif û Zelîxa - Qesîdeyê Kerbela

ROŞAN LEZGÎN

No kitabê ma yo erjaye verê cû, serranê 1970an ra nata bi alfabeya erebkî ame-yo nuştiş û destnuştayê ey vila biyê zî la esas, bi hawayêko tekuz qismêk hetê W. K. Merdimîni û qismêk zî hetê Mehmet Uzun ê Paliyî ra tiranskiribeyê alfabeya latîni ya kurdî biyo û 2004 de İstanbul de hetê weşanxaneyê Vateyî ra weşanîyayo.

Verî ke ez derheqê muhtewaya nê kitabê ma de malumatan bida şima, ez wazena nuştuxê nê kitabê ma, yanî Mela Mehmed Eliyê Hunî bi şima wendoxanê delalan bida şinasnayiş.

Mela Mehmed Elî 1930 de Hun de ame-yo dinya. Lacê Mela Husênî yo. Nufus de nameyê xo M. Ali Öztürk o.

Hun, yew nehîyeya Pali ya. Dewlete nameyê aye bedilnayo, kerdo "Bayhan". Hun, Pali ra teqrîben 50 kilometre dûrî de miyanê Dara Hênî û Pali de, verê royê Muradî de yew nehîye ya. Xetê tirêne ke Xarpêt ra şina hetanî Tûx (Tatvan), uca ra vîyarena.

Mela Mehmed Elî gelêk medreseyanê welatî de feqîtiye kerda. Verê zaf mela û seydayanê namedaran de wendo. Mela Mehmed Elî, dewa xo Hun de 25 serrî îmamtiya fexrî kerda. Hema des-diwês serre biyo ke eşqê wendişî pê girewto. Ey Dîyarbakir, Silîva, Bismil, Batman, Sêrt, Perwarî, Şirnex, Misirc, Mardîn û Cizîra Botan

de wendo. Ey verê melayanê namedaran ê wextê xo de, sey Muftîyê Erxenî Mela Evdi-
semed, Mela Mehmed Gurhuseynî, Şêx Mehmed Emîne Çermûgî, Şêx Seydayê Cizîre het wendo.

Mi gore, Mela Mehmed Elî yew şairo xas o. Xulqê xo ra wayîrê damara şairiye yo. Hema qijekîya xo de kewno wendiş û nuştişê edebîyatî dima. Gama ke Dîyabekir de waneno, pêhesêno ke Seydayê Xasî *Mewludê Kirdkî* nuştio. Nara wexto ke Farqîn de, dewa Qurtê de waneno, kewno nê Mewlidî dima û şino reseno Hezan. Şino verê Seydayê Xasî ke yew *Mewludê Kirdkî* peyda bikero.

Nika merdim şeno bi rehetî vajo ke nê heme çî delîlê sehîh ê, ke Mela Mehmed Eliyê Hunî yew şairo esîl o. Biyayîşê xo ra wayîrê yew damara edebî yo.

Wexto ke Seydayê Xasî zîyaret keno, Seyda destê xo dano paştaya ey ro û duayî keno ke o zî bibo yew şair.

Seydayê Mela Mehmed Eliyê Hunî derheqê nuştişî de fikrê xo wina îzah keno, vano:

"Gelî birayan,



➤ “Tarix qeleme ra ibaret o. Wexto ke nê kelîmeyî ke mi hetanî tiya vatî, eke nigêriyaynî qeleme, eke yew ca de nêameynî zeftkerdiş, ewro roj şima rê nêameynî vatîş. Yew çiyô ke gêriya qeleme, sey yew seydi yo ke tapişiyayo; yew teyra ke ha destê to de, zereyê qefesî de ya, çi wexto ke ti biwazî veradanî, çi wexto ke ti biwazî xo het verdenî. Tarix zî naye ra ibaret o. Her çî tekerur ra ibaret o. Elî şino, Welî yeno. Welî şino Ehmed yeno. Ehmed şino Mehmed yeno. Bawkal şino babî yeno, babî şino ewlad yeno. Ewlad şino torin yeno”(r. 4).

Û derheqê heskerdişê welatî û ziwani de zî hêna nê çiyayn sey şîretî ma rê vano:

“Wetenê xo ra heskerdiş îman ra yeno. Yew merdim îmanê ey bi, wetenê xo ra heskeno.

“Însano bîaqil xo şinasneno, milletê xo şinaneno, ziwane xo rê xizmet vînenno. Milletê xo rê xizmet vînenno. Wetenê xo rê xizmet vînenno”(r. 5).

Seyda Mela Mehmed Elîyê Hunî ke, dewijê ey ci ra vanî Hecî Xoce, verî ke ez behsê kitabê ey bikera, ez vana Homa ey razî bo ke, ey bi ziwane ma yo şîrîn no kitabo erjaye ardo meydan.

Kitab de, heme hîrê qismê nuştayê Mela Mehmed Elî, yanî ‘Mewlid’, ‘Yûsif û Zelîxa’ û ‘Qesîdeyê Kerbela’ menzûm ê, yanî bi nezm (şîrkî) ameyê nuştiş. Labelê verî ke nê dest pêbikerê, rîpel 3. ra hetanî 12. Mehmet Uzunî derheqê cuyê Mela Mehmed Elî de, derheqê huner û eseranê ey de yew nuştayo derg nuştô û tede malumatane muhîman dano wendoxan.

Nêyî ra dima, yew roportajo ke W. K. Merdimîn û N. Celalî roja şîyêsê menga desine ya serra 2003 (16. 10. 2003) de seydayê Mela Mehmed Elîyê Hunî reyde kerdo û

verê cû kovara Vate de weşaniyayo, rîpel 13. ra hetanî 33. dewam keno. Xora, heme nuştayê ke no kitab de estê verê cû humanê kovara Vate de zî weşaniyayê.

Nameyê roportajî bi xo zî manîdar o. Yew ifadeyê Mela Mehmed Elî ra ameyo girwtiş ke, vano “Ziwanê Ma Weş o, Feqet Malesef Aliman Hetanî Nika Îhmal Kerdo”.

Rast a ke ziwane ma hetanî nika hetê ma hemîne ra îhmal biyo. Bêguman sebebê xo zaf ê, la yew tira îhmalkariya alimanê ma yo. Zafê alimanê ma ziwane bînan de he ta ti vaji ehend mahir ê, la ziwane xo de ney! Ma zî wayîriye ro ziwane xo nêkerdo. Labelê, Homa hes bikero, îşallah tiya ra pey ma heme ro ziwane xo wayîriye bikerin. Ma bi ziwane xo biwanin, binusin, qisey bikerin. Û bi taybet zî ma domane xo reyde bi ziwane xo qisey bikerin. Çunke, ziwano ke domanî (qijî; tutî; gedeyî) pê qisey nêkerê çend serrî ra pey mîyan ra wedariyeno!

No roportaj de derheqê cuwîyayîş û fam û ferasetê nuştîşê Mela Mehmed Elî de malumatê dewlemendî, fikrê muhîmî estê ke ewro ma tira derse bigêrin. Mesela, derheqê standardbîyayîşê zazakî de, yanî seba ke yew ziwano standard viraziyo, W. K. Merdimîn Melayî ra perseno vano:

“Kirdkî de fekê muxtelîfî estê. To dî ca ra ca bedilîyenê. Mîyanê kirdkîya ma û a Pali, Swêregî, Çermûg de ferq esto. Her kes sey kirdkîya dewa xo binuso yew standard nêno orte! To dî tirkî de vanê ‘İstanbul Türkçesi’, yanî nuştîş de aye esas gênê û şinê. Nika ê ke Vate de xebitîyenê pêruno unîversîte qedênaya, her yew çend hebî ziwanan zano. Mintiqeyê înan ciya yê, fikrê înan ciya yê labelê ameyê têhet û vanê, “Ganî ma yew kirdkîya nuşteki ya sitandarde virazin.” O ke kird o, wexto ke nuşt, ganî tira fam bikerô.”

Fikrê Mela Mehmed Elî zî no yo ke vano:

“Û hetanî ke deyn zî nêbo, nêbena. Za-

zayê Palîyî zazayanê Çewlîgî ra gerek kelîman deyn bigîrê. Nara, hem zî fedakarîye bikerê, yanî qebul bikerê.”

Dima ra hêna W. K. Merdimîn vano:

“Her kes rikdar bo, yanî înad bikero û vajo ‘Îlla ê dewa mi!’ nêbeno. No fikrê to zaf muhîm o. Her kes ganî nêvajo ‘Ez ke esta, ez a!’ û gerek fedakarîye bikero”.

Seyda cewabê xo de vano:

“Hem deyn, hem zî fedakarîye. Yanî, qebul bikerê. Fedakarîye, qebulkedişî rê vanê. Mesela şîrê mi de yew qafîye nêameye ci, mi zîwanê Çewlîgî ra, zîwanê Licê ra, zîwanê Swêregi ra girewta. Gerek ez fedakarîye bikerî, aye zî qebul bikerî. Ez vajî, na zî zaza-kî ya. Na zî yew şîve ya.”

Belê, seke şîma zî vînenê, nê vatişan de ma rê şîretê muhîmî estê.

Mewlid

Seke mi verê cû zî va, Mela Mehmed Elî dewa Palîyî Hun ra yo. Bêguman zîwanê ey zî fekê Pali yo. Labelê tena qîmê xo bi zîwanê dewa xo nêardo. Senî ke Ehmedê Xanî zî wexto ke *Mem û Zîne* nuşta, ey zî heme şîveyanê kurmanckî ra îstîfade kerdo, Mela Mehmed Elî zî, herçiqas bi fekê Palîyî nuşto la ey zî sey Xanî fekanê bînan ê kurdîya zazakî ra zî îstîfade kerdo.

Mewlidê Mela Mehmed Elî panc qisman û 266 beytan ra yeno meydan. Ez wazena her qîsmî ra çend beytan şîma rê binawna.

1.Qismo verên ‘Qıcey Peyxemberî’ ya. No qîsim de newês (19) beytî estê. Wina dest pêkeno:

“Bîsmilâhîrrehmanîrrehîm,

Vernî de vac namey Homayî, Muhammed lac, pî û mayî

Gerguş bişan ayî-ayî, wi yewekê pîy û mayî.

Muhammed Peyxembêr ma yo, Muhammed lac Amîna wo,


Gerguş bişan ayî-ayî, wi yewekê pî û mayî.

Muhammed ik est yew şah û, Muhammed lac ‘Ebdullah û,

Gerguş bişan ayî-ayî, wi yewekê pî û mayî.”

2.Qismê dîyîne, ‘Mewlidê Peyxemberî’ yanî bîyayîşê Peyxemberî yo û 70 beytî te-de estê. Ez nê qîsmî ra zî çend beytan şîma rê nawnena. Mela Mehmed Elî vano:

“Namey Homay vaj hêverî, pey namey Homay ak berî.



Xebêr Mewlid weş xeber î, biwan Mewlid Peyxemberî.

Peyxembêr zaf aşiq resnaw’, yê qelbê aşiqan veşnaw’.

Mewlid Peyxemberî beşnaw, biwan



➤ **Mewlid Peyxemberî.**

.....

Yew şîret ken ez qey tu rî, dewam bikir
Quran xu rî

Ti wazen cennet de hûrî, biwan Mewlid
Peyxemberî.

Peyxemberî r' ame Quran, sukey Mekki
d' iney bizan

Cuzey Quran ra pey meman, biwan
Mewlid Peyxemberî."

3.Qismê hîrêyîne 'Duayî' yê. 15 beytî no
qism de estê. Vano:

"Ya Reb we bî heqqî'r-Resûl, ya Reb
Mewlid ma bik' qebul!

Ya Reb ti ma nikîr melul, ya Reb duan
ma bik' qebul!

Ya Reb ti ma zelîl nêkî, ya Reb ti ma rezîl
nêkî!

Muhammêd ma r' delîl bikî, ya Reb duan
ma bik' qebul!

Qey xatirî namey Celîl, qey xatir Îbrahîm
Xelîl

Muhammêd ma r' bikîr delîl, ya Reb duan
ma bik' qebul!"

Ma zî vajin îñşallah Homa duayanê ey zî
û ê ma zî qebul bikero.

4.Qismê çarine de 'Mîracê Peyxemberî'
esto. No qisim de zî neway û hîrê (93) bey-
tî estê. Mela Mehmed Elî vano:

"Ti hêvêr namey Homa vaj, ti namey yi
r' benî muhtac

Peyxembêr ard panc wext nimac, Pey-
xembêr ma vêca Mîrac.

Ti pey zikir aker berî, ti pey şikir bid' xe-
berî,

Ti pey fikir şû dinyay verî, Peyxembêr
ma vêca Mîrac."

5.Qismê pancine zî derheqê 'Wefatê
Peyxemberî' de yo. Nê qismê peyên ê
Mewlidî de zî vano:

"Namey Homa ben rehbêr ma, pey Ho-
may abên xebêr ma

Merg ha yenû vêr ber' ma, dinya ra şî
Peyxembêr ma.

Merdîm nezan ti vûn verg û, wi vûn "Ra-
har mergî derg û".

Çend weş bimanî peynî d' merg û, dinya
ra şî Peyxembêr ma.

Dinya bena fanî-fanî, nêbena mal qey însanî

Mîren çiqas însan ganî, dinya ra şî Pey-
xembêr ma."

Peynî de zî vano, 'Serra 1971ê mîladî de
ameyo nuştîş' û bi no qayde qismê 'Mewli-
dî' beno tamam.

Hîkayeta Yûsif û Zelîxa

Mewlidî ra pey zî nara hîkayeta 'Yûsif û
Zelîxa' esta. No qisim, Mehmet Uzunî alfa-
beya erebkî ra transkirîbeyê alfabe ya latînî
kerda. Tarîxê nuştîşê na menzûme 1982 yo.
Na menzûme de 152 beytî estê.

Seke şima zî zanê, na hîkayeta 'Yûsif û
Zelîxa' mîyanê şaranê Rojhilatê Mîyanênî
de, mîyanê zaf mîletan de yew hîkayeya
meşhûr a. Quran de 'Sûreya Yûsifî' de yena
qiseykerdiş. Mi gore Quran de meseleya
tewr edebî, qiseya tewr weşe na hîkaye ya.
Nara, seyda Mela Mehmed Elîyê Hunî, Ho-
ma ey ra razî bo, ey bi zîwanê ma nušta. Ez
wazena qismêk na hîkaye ra zî şima rê ne-
qil bikera. Vano:

"Bîsmîllah", vac ak Quranî, akir sûrey
Yûsif, banî,

Heketey Yûsif biwanî, hey veyn Yûsifê
Kenanî.

Mi heketey Yûsif cawut, pey nezma za-
zakî nawut,

Şima birarû rî şawut, hey veyn Yûsifê
Kenanî.

Ena heket mi ra beşnaw, destê mi ra bi-
şim yew aw,

Veyn Homa Quran id se vaw? Hey veyn
Yûsifê Kenanî.

Homay vaw, "Ehsenul-qesas", rindey heketan bik hewes

Beytî ma se w pûncas, di bes; hey veyn Yûsifê Kenanî.

.....

Yew ruc lacî bî asparî, va "Bawko ma şin cey warî

Yûsif berşaw wa bik yarî", hey veyn Yûsifê Kenanî.

Yaqûbî va, "Cey warû dur î, tersen vergî z' Yûsifî bwûrî!"

Yîn va, "Meters, ma ûn tu rî", hey veyn Yûsifê Kenanî.

Yîn Yûsif eşt zerey yew bîr, ecêb bena, yeno kûm vîr!

Yî şûn d' amey, yî bermay pî r', hey veyn Yûsifê Kenanî.

.....

Yîn yew deme ena vîyarney, cînyûn mîrû qalî çarney

Zelîxa ser lomey varney, hey veyn Yûsifê Kenanî.

Cînyû va, "Zelîxa barî, ya nizûn tepîş yarî,

Senî zerr kewt xizmetkarî?" Hey veyn Yûsifê Kenanî.

Cîni mîrû zaf bib' serdî, Zelîxa yî dawet kerdî

Tikê fêkî ardî, yîn werdî, hey veyn Yûsifê Kenanî.

Zelîxa say û may ardî, ney yîn dest a yew-yew kardî

Yîn Yûsif dî, tekbîr ardî, hey veyn Yûsifê Kenanî.

.....

Emanet k' yî va abî, girot sawit çiman babî

Çimê babî uca d' abî, hey veyn Yûsifê Kenanî,

Birey bînî z' amey reseş, yew deme mênd barî weney

Vêr xu tada hetî uceş, hey veyn Yûsifê Kenanî.

Welat xu ra yîn xu wepîşt, hey na rahar

Misir tepîşt

Resey Misir Yaqûb ronîşt, hey veyn Yûsifê Kenanî."

Axir peynî de zî vano:

"Melay Hunî vûn, "Ya mubîn!" Vûn, "Teweffena musulmîn,

We el-hîqna bîs-salihîn." Hey veyn Yûsifê Kenanî.

Qesîdeyê Kerbela

Badê ke hikayeya 'Yûsif û Zelîxa' qedêna nara 'Qesîdeyê Kerbela' estê. Nê qesîdey zî hîrê heb ê: **1.**Weqayê Kerbelayî: Hesen, Huseyn (20 beytî ya). **2.**Weqayê Kerbelayî: Hezretî Hesen (20 beytî ya). **3.**Weqayê Kerbelayî: Hezretî Huseyn (30 beytî ya). Her beyta na menzûme şîyês (16) hece ya. Heme hîrê qismî zî 1970 de ameyê nuştîş.

Seke yeno zaneyîş, tarîxê îslamî de 'Weqayê Kerbelayî' esta. Kerbela de mîyanê di hetan de yew pêrodayîş virazîyayo û yew mesela tirajîke uca qewimîyaya. Na mesela ser o gelêk çî ameyê nuştîş, tabî Mela Mehmed Elî zî nuştî la bi zîwanê ma nuştî.

Mela Mehmed Elî 'Qesîdeyê Kerbela' qismo yewin de, yanî qismê 'Weqayê Kerbelayî: Hesen, Huseyn' de wina vano:

"Pey namey Homay biwan, Homay vaw "Îhdel-husneyeyn"

Yew pey axû yew zî pey guyn, dinya ra şî Hesen, Huseyn.

Hesen, Huseyn eyîl şêr î, eyelanî yî ra vêr î

Wir dî tornê peyxembêr î, dinya ra şî Hesen, Huseyn.

Sukey peyxembêr Medîna, wir dî tede amey dinya

Wir dî qey dîn îr bî feda, dinya ra şî Hesen, Huseyn.

.....



➤ Homay va, "Ya hebîb, mijdan; Hesen, Huseyn şehîd bizan

Kîşttox wir dîn îz bêwîcdan!" Dinya ra şî Hesen, Huseyn.

Hecî Xoca vûn sey melî, ya Reb ti yê bik yew welî

Hesen, Huseyn; ewlad Elî, dinya ra şî Hesen, Huseyn."

Mela Mehmed Elî 'Qesîdeyê Kerbela' qismo diyîn de, yanî qismê 'Weqayê Kerbelayî: Hezretî Hesen' de zî wina dewam keno:

"Vac, "Pey namey Homay wanen", vac "Pey namey Homay ez wen"

Mevac, "Dinya d' ez nêmiren!" Dinya ra şî Hezretî Hesen

Hezretî Hesen lac Elî, Hezretî Hesen pîl yew welî

Wefat yî biwan sey melî, dinya ra şî Hezretî Hesen.

.....

Hesen ven da "Huseyn bira!" Va, "Ha merg bon nîzdî mi ra!"

Va "Hîn xatir wazen tu ra." Dinya ra şî Hezretî Hesen.

Hecî Xoca vûn sey melî, Hezretî Hesen lac Şêr Elî

Ya Reb, efû bik qey vil telî, dinya ra şî Hezretî Hesen."

Mela Mehmed Elî 'Qesîdeyê Kerbela' qismê hîrêyîne de, yanî qismê 'Weqayê Kerbelayî: Hezretî Huseyn' de zî bi no qay-de dewam keno:

"Vatiş namey Homay bi deyn, tu namey Homay qic meveyn!

Wefat Huseyn beşnaw, rind veyn; dinya ra şî Hezretî Huseyn.

Huseyn lacî Elî Şêrî, Huseyn tornê pey-xemberî

Werre eya dinyay verî, dinya ra şî Hez-

retî Huseyn.

.....

Yew fesadey kewt Kerbela, şarê ucay zaf dî cela

Yîn dî bela, yîn dî xela; dinya ra şî Hezretî Huseyn.

Dinya d' bêbextey çine bîn, wa ena dinya d' bext bibîn

Dinya bişîn Huseyn nêşîn, dinya ra şî Hezretî Huseyn.

Hecî Xoca Mehmed Elî, Weqay Huseyn van sey melî,

Pîl yew şehîd, pîl yew welî, dinya ra şî Hezretî Huseyn".

Nê qesîdeyan ra dima zî, rîpel 84. ra het-anî 119. kopîyê destnuştêyê orîjînalî ke Mela Mehmed Elîyê Hunî bi alfabeya ereb-kî nuştê, estê.

Verî ke ez nuştêyê xo biqedêna, seba zehmetdîyayîşê embazanê erjayan ke amadekerdiş û çapkerdişê nê kitabî de keda înan esta û no kitab kerdo xizmetê ziwan û şarê ma, ez hemîne rê sipas kena. ■

Şûrê Qetlê li Milî Rehma Xwedê li Dilî

A. MERETOWAR

Carekê ez, serê pêşî bi kelîmeya “malavahî” ji R. Lezgîn re dibêjim merheba û dîsan bi gotina “Ez xeta, şaşî, derewînî û çewtîyên xwe jî qebûl dikim” lêborînê ji xwendoxên Nûbiharê dixwazim.

Digel vê yekê hin darêzên mîna “Zimanzanê me yê hêja yê ku gramera sê dîyalektên kurdî dizane” û çend şîroveyan wî yên din hewaleyî wicdanê xwendoxan dikim.

Ji ber ku rexnegir, qicix (li hîletê wî ketîye; ango ruhê wî ji sernivîsê çûye) ji sernavê nivîsa min a qaşo lêkolînî – bi gotina wî- girtîye, min divê ku ji vê derê dest pê bikim.

Sê armancên min hene bi vî sernavî:

Yek: Armanca sereke, balkişandina ser vê mijarê ye.

Hîna di wextê zarokatîya min de, hostayê dîwarê xaniyê kalê min û peyre jî hostayê dîwarê bavê min ango hosteyê xaniyê me, rehmetyê Kazim Oste û hemû şagirtên wî bi dimilkî dipeyivîn û bûbûn kirîvê me. Gava min sala 1980, li Qubîna ser Batmanê dest bi feqîtîyê kir, hevalên min ên feqîtîyê, ciwanên dimilî bûn. Bi hatina min a Unîversîteya Dicleyê re, careke din di nav 35 hevalên pola min de, hevalên min ên ku em bi hev re bûn dost, dîsan gişt dimilî bûn. Min li vê derê dest pê kir, xwe da hînbûna dimilkî. Nesîbê min hat bajarekî dimilîyan û hemû dostên min ên malbatî, li vî bajarî dimilî ne. Serê çardeh-panzdeh salakî ye ku dixwazim hînî

dimilî bibim; mixabin hîna jî baş pê serwest nebûme. Min jî mîna gelê frengîyan got ji bo hînbûna vî karî, divê kitêbekê amade bikim.

Pirê dimilîyan bi kurmancî dizanin; lê belê kurmanc kêm bi dimilî dizanin. Min jî xwest li gor qeweta xwe, rê li ber hînbûna dimilkî vekim. Ji bo vê yekê jî min çavê xwe li cîyên hêsa gerand, çend neqeb û derbasek dîtîn. Hema bi temamî ne rast bin jî, bû sedem ku bi “xişîmî” lê biqelibim.

Didu: Min xwest ku di hêla gramera van her sê kurdîyan sereke û mezin de kevirekî dênim ser kevirekî û berê zimanzanan bidim ser danîna vî dîwarî.

Sisê: Min li unîversîteyê, dersa ku sê-çar dîyalektên zimanê turkî didin ber hev û din dît. Ji min re bûbû kul û derd ku li gor wan rayîşan, hindik be jî, xerc dênim ser maleya hosteyên zimanê kurdî.

Çar: Armanca min ne ew e ku ez bi tena serê xwe rabim, vî barê giran dênim ser pişta xwe ya ku di bin piştîyên bipelûpînc de xûl bûye. Şikir ji Xwedê re ez bi heddê xwe dizanim. Dibe ku bi kirina vî karî, ji heddê xwe derketibim; çî heye ku gelek hez dikim ji dimilkî û min rika xwe li hînbûna wê danîye.



➤ Kitêba Prof. Qanatê Kurdo ku li ser kurdîya soranî û kurdîya kurmancî bû, hîna berî çend salî balê kişandibû ser vê hêlê. Min got belkî bi destpêkirina vî karî, rûhê rehmetyê Qanêt hinekî şa bibe.

Gava min dî ku li ser vê "ceribandî" rexneyekê, mil daye ber vê xebata min a bifeqîrî, bivê nevê vebîşîrîm û kêfa min hat; lê belê her ku bi xwendîna rexneyê ve çûm, mil û mêx li min şikîyan; di cîyê xwe de sar bûm wisan şemîrîm.

Rexnegirê me yê kedkar, dî serê rexneya xwe de behsa "lîteraturê" dike. Gava min xwe da xwendîna nivîsê, ev kelîmeyên mîna "la.., lewitandî, sergoyê genî, qaşo nivîskar, sergo, pûç, fiyasko, derewîn û çend navlêkirinên bitinaz, bifesk û firûsk, bivê nevê, digel dilfirehîya xwe ya bêsînor jî, ji xwe re sar mam.

Wê mînaka "metnî" ya ku berî rexneya xwe daye, bi yek carekê dişibe "me'nî-yên/hincetên êrîşê" ango ji bo ku rê li ber lêdanê veke, ji xwe re li hincetan gerîyaye. Tu dibêjî qey di dilê xwe de weha gotîye:

"Pa tu bisekine ku ez dê çawan bikim ku tehma şîrê xîç bê ji bin zimanê te!"

Di dawîya vî metnê ku meriv nizane ka pêdivî pê hebû gelo yan na, dibêje ku "*Gelo xwedîyên van nivîsan li pey çî ne...?*"

Malnexerabo, Xwedê heye. Ka te qet dest xwe dananîye ser wicdanê xwe? Mesafeya navbera dest û wicdanê te çend fersah bûye?

Ev koma nivîskarên ciwan, pirê wan jî di nav bêderfetîyan de, fedakarî dikin û di nav ew çend gêjahîyên vî welatî de, bi zimanê xwe re serê xwe dêşînin. Ka wê li pey çî bin gelo?

Ez bi xwe, di ber karê xwe yê eslî de, karê kurdînivîsandînekê dikim. Ango ev karê ni-

vîskarîyê, karê min ê ber dest e. Xwezî îdareya me bi karê kurdîparêzîyê bibûya...

Mentiqa sernivîsa min, ji ber ramanêke dûr û dirêj tê. Gelo gramera van her sê kurdîyên me, dê bi çî awayî bîn hînkirin? Em dikarin çî karî li serê bikin? Divê em çî bikin û mîna van pirsan. Temam min ew hildaye dest; lêbelê mîna ku rexnegirê me "bi tinaz, fesk û firûskan" diyar kirîye, bi temamî "zellalkirin" nîn e.

Rast e, nivîsa min li ser pirsên ku bi bersivan nizanîm ava bûye. Ê baş e, gelo kovarên me, ne cîyên pirsan in? Armanca derxistina kovaran ne ew e ku rê li ber gur û geşbûna pirs û bersivan veke?

Rexnegir R. Lezgîn, bêhna xwe teng dike, mûyê xwe gij dike û kulma xwe bilind bike, hetta Xwedê bidê, bi şid bibêje gurm û derbeya kuştinê li nivê orta çavê min bixe ku nikarim ji cî bilebitim û av negihîje min: *Heyran, tiştê ku zêdeyî qeweta cenabê we be, "xwe lê qerese mekin", baştir e.* dibêje.

"Şûrê qetlê li destê te; rehma Xwedê li dilê te."

Ev gotina, gotina pêşîyên me kurdan, wer dixuyê ku qet nehatîye bîra kekê.

Em bîn ser gotina ku "Dev ji gramera her sê diyalektên kurdî berdî, min bi xwe tu gramerek di wê xebateke weha de nedît!" dibêje.

Ka tu dê çawan bikaribî bibîni ronîya min? Jî hêrsan, dunya tarî bûye li ber çavê te gidî!..

Bi rastî jî quretî qet tune ye li cem min. Heta jî min tê, ez nefsa xwe dişkênim. Di warê nefspiçûkîyê de, kesî bi ser xwe re qebûl nakim. Tiştê herî zêde li ber çavê min reş e jî, bê guman "quretî" ye; îca gramera her sê kurdîyan jî, dizanim ku ji min zêde ye. Tenê tiştê ku di hêla dengzanîn, peyvikanîn û hevoksazîyê de hîn bûme, weke çirayeke ku hemanikan diçirise, min vexistîye. Wan rojên ku Kursê Kurdî li Dîyarbekirê vebû, bû nesîb ku ez jî bi mamosteyên wê derê re bi-

xebitim. Di wan çend mehên xweş û geş de, bi xêra kursîyeran ez jî li ser hînkirina kurdî-yê hînî hin tiştan bûm. Hinek wêrekî bi min re çêbû. Li wê gorîyê min jî rabû berê xwe da vê rêya dûr û dirêj.

Pêşî min bi vî çavî li avasazîya gramerê nihêrt:

1-Taybetiyên dangan

a)Taybetiyên tîpên dengdar

b)Taybetiyên tîpên dengdêr

2- Taybetiyên dariştina peyvikan

a) Pêvekên(qertafên) peyvçêkirinê

b) Pêvekên(qertafên) kişandina peyvikan

3-Taybetiyên cûreyên peyvikan (weke navdêr, rengdêr, lêker, cînav û yên din)

Li gor rexnegirî, pirsar min a qure û qerase ku "Gelo van zaravayên kurdî, di kîjan sedsalê de dest pê kirîye?" jî, pirseke wisan e ku meriv dikare ji her zimanê her gelî bike.

Dibe ku ji aliyê mentîqa vegotinê ve min xeletî hebe. Serçavê min. Ez, bi dil û can vê çewtîya xwe ya vegotinê qebûl dikim; bes min mebest jê ew bû ku bala zimanzanan bikşînim ser tarîxa zimanê kurdan. Heta niha tenê di kovara bi navê "War"ê de li ser "Etimolijîya" kurdî xebat hatîye weşandin. Îca ev xebat jî pê bisînor ma.

Gelo ne hêja ye ku em meraq bikin ka kurdîya qedîm, çi çax û çi hîyamî li van zaravayên sereke belav bûye?

Vegotina rexnegirê me, bi neheqîyan dagirtî ye. Serê her mijarê li sûfê min ketîye û tu dibêjî qey heyfa xwe hiltîne:

Hewldana berbihevebirina kurdîya kurmancî ku bi xêra xebata "Koma Kovara Vate" tê kirin, kî nizane gelo. Berhemên ku vê koma hêja, serê çendik û çend salan e, bi awayekî profesyonelî dane, -berhemên R.Lezgîn bi xwe jî di nav de- li ber çavê me ne. Dîsan jî xwezî min jibîran nekira û navê wê xebatê/hewldanê bidaya.


Em werin ser xetayê min ku bûye sedema ba, bahoz, gêdûk û pûkê...

Rast e, ew hevoka min a ku dibêje "Di se-

rê peyvikan de gava dengdara "x"yê hebe, di kurdîya kurmancî de hebe, di serê heman peyvika dimilki de dikeve." çewt e; îca raveyên ku birêz R. Lezgîn li ser vê xalê kirine jî, heta meriv bibêje bes û xweş in; çi heye piştî vê nivîsê bi çend rojan ez, bi vê xeletîya xwe hisiyam û tavilê min heman rastî ji Bul-tena Enstîtuya Kurdî ya Amedê re (hejmarada diduyan) şand û mala wan ava be, vê zivistanê çap kirin.

Dîsan jî li ser vê xalê ew bi xwe jî ketîye xeletiyê. Mînakên ku mi dane, ne şaş in. ■

9 CILD, 94 HEJMARÊN NÛBIHAR



ARŞÎWEKE HÊJA

ji bo siparîşê
www.nubihar.com

Rojhat û Berxika Sawa

ROJBÎN ÖZKAN

Bi navê Xwedayê mezin.

Hebû tunebû, demek ji deman di gundekî de mêrikekî tevî sê zarokên xwe û xêzana xwe dijîyan. Navê zarokan Rûgeş, Rûken û Rojhat bû. Karê mêrik cotkarî bû, jinik jî diçû bêriyê. Dîsa wekî herroj mêrik çû çolê ser karê xwe. Jinik jî çû bêriyê. Zarokan jî mîna her tim bi hevalên xwe re nav gund ji xwe re dileyîstin. Dema bû êvar hersê zarok ji çûne berderê malê û benda dayîk û bavê xwe man. Dema dayîka zarokan hat hambêza wê de berxikekî sawa hebû. Rojhat û xwişkên wî çûne pêşîya dayîka xwe û gotin:

– Dayê tu bixêr hatî. Te bo çî ev berxika anî vira?

Dayîka wan bersiva zarokên xwe da. Got mixabin maka wê berxikê mir. Min jî ew anî malê. Hûn lê bibin xwedan.

Zarokan gotin:

– Dayê tu qet meraq neke, em dê li vê berxikê bibin xwedan. Paşê hersê zarokan berxika sawa ji hambêza dayîka xwe girtin. Hinekî pê şa bûn. Jinik jî çû aşxanê zad pat.

Dema mêrik hate malê. Zarokan berxik birine gomê. Hatin destê xwe şuştin. Alikariya dayîka xwe kirin. Sifra raxistin û

bi hev re rûniştin. Nanê xwe xwarin. Piştî şivê, zarokan dîsa harîkariya dayîka xwe kirin. Sifre rakirin, jinikê got:

– Ez bo alîkariya we gelek sipas dikim. Birastî di bêriyê de pir westîya bûm. Piştî jinikê peyva xwe xilas kir, keçika wê ya mezin Rûkenê jê re got:

– Dayê tu bixwazî ez û Rûgeş em sibê bi te re bîn bêriyê û harî te bikin.

Jinik ji gotina keçika xwe re gelek hêsdar bû. Herdu keçên xwe hambêz kir û got:

– Baş e madem hûn dixwazin sibê bi min re werin bêriyê, bila kekê we jî li berxikê bibe xwedî.

Paşê bavê zarokan bang bi zarokan kir û got:

– Sibê gelek şola me heye emê zû rabin herin destê xwe û diranên xwe bişon, werin razên. Hersê zarok piştî gotinên bavê xwe, çûn diranên xwe û destên xwe şuştin. Hatin dayîk û bavê xwe re gotin, sevbaş em diçin dirazên û çûn razan.

Sibê bi banga mele mêrik şiyar bû û çû camiyê nimêj kir. Hat alîkariya xêzana xwe kir bi hev re taştê amade kirin. Paşê mêrik çû oda zarokan. Hêdîka hersê zarokên xwe ramûsa û got, siba we bixêr, dê rabin em tiştê bixwun. Zarok ji xewê şiyar bûn çûn dest û rûyê xwe şuştin û hatin. Hemû bi hev re rûniştin ser sifrê taştê xwarin. Mêrik çû çolê bo karê xwe yê cotkarîyê, jinik û

keçên xwe Rûken û Rûgeş, bi hev re çûn bêriyê.

Piştî ku Rojhat wana birêkir çû gomê berxika sawa girt hambêza xwe derket derve, paşê bi fikar berxikê nihêrt û got, ezê niha çawa li te bibim xwedî. Hinekî wext derbas bû dengê hate guhê Rojhat derûdorên xwe mêze kir dît waye cînara wan Xaleta Gulê li ber derê xwe mîhekê diçêrine. Hêdîka li cihê xwe rabû çû ba jinikê got, rojbaş xalet, tu bo çi îro neçûyî bêriyê?

Xaleta Gulê bersiva wî da û got:

– Rojbaş kurê min eva mîha min mixabin berxika wê mir û mîh jî hinekî nexweş bû ber wê yekê min jî ew anî malê heta ku hinekî dem bibore ezê bibim têkilê birra şivan bikim. Niha bêje ew berxa hambêza te de çîye bo çi ba maka xwe nîne?

Rojhat got:

– Xaltika Gulê ew berxika min jî maka wê mir, dayîka min got tu çend rojan lê bibe xwedan heta ku hinekî mezin bibe emê teslîmê berxevan kin, lêbelê ez nizanîm ezê çawa xwedan kim.

Xaleta Gulê kenîya û got:

– Çi barekî giran kirine hustîyê te lê tu qet mereq neke ezê alîkarîya te bikim.

Rojhat hinekî şaş bû got:


– Tu yê çawa harîkarîya min bikî Xaleta Gulê.

Xaletê go:

– Ewê mîha min bê berxik e berxika te jî bê mak e, tu berxika xwe bide min ezê wê bi mîha xwe bimêjînim paşê ezê bêm dîya te re bêjim, êdî hewce nîne ku tu li wê berxikê mêzekî.

Rojhat gelek şa bû got Xaleta Gulê ez ji te re sipas dikim bo vê alîkarîya te, tu jî çî wextê bixwazî ezê bêm alîkarîya te. Xaleta Gulê bersiv da got, tişteke nîne dema şuxulekî min bikeve alîyê te ezê ji te re bêjim.

Paşê Rojhat sipasiya xwe dubare kir xatir xwest, hate ber derê hewşa xwe dît ku



waye pisîkeke piçûk li wan deran digere hêdîka xarê erdê bû pisîk girt hambêza xwe jê re got, merheba pisîka delal ez navê te nizanim lê ezê te re bêjim Morî, belê ji vir şûn de navê te Morî ye.

Rojhat demekî xweş bi pisîkê re derbas kir, bû êvar dayîka wî û herdu xwişkên wî jî bêriyê hatin. Dayîka wî jê re got, êvar baş kurê min însaallah te îro gelek zahmet nekişandîye li ber berxikê.

Rojhat dayîka xwe mêze kir bidengekî bilind kenîya got:

– Dayê birastî ez qet newestîyam.

Paşê dayîka xwe re behsa Xaleta Gulê û mîha wê kir, dayîka wî gelek şa bû û got, ezê paşê biçim xwişka Gulê re sipas bikim.

Jinik wekî herro çû aşxanê zad pat, mêrik jî hat xêzan giştî bi hev re rûniştin ser sifrê bi kêyf û xweşî nanê xwe xwarin.

Jiyana xwe bi bextewarî domandin. ■

20. Cotmeh. 2005

Nûbihar

RAÎFÊ BÊÇARE

Nûbihar gula bihar.
Hêşîn dibin çêre dar
Tu ewqas şîrînî jî
Çima ev gel li te sar

Kulîlk bi rengê xwe ne
Çivîk tev refê xwe ne
Kurdno ji xwe şerm nekî
Gellê bê ziman tine

Di payîz da Nûbihar
Dîsa pel vedike dar
Rebbê Ehedê Semed
Li me te bike sitar

Kê xwendibe dizane
Ziman tev Xwedê dane
Qedexkirna ziman
Ne mafê tu evdane

Şêxê Ehmedê Xanî
Navê te wî lê danî
Rêya pîroz da here
Bikişe mîna kanî

Binvîsin û bixwînin
Nîsk û noka biçînin
Ku roja bêderê hat
Hûn keda xwe dibînin

Motkî Xelîl Xeyalî
Kurdî ra wî kir alî
Li ser bingehê ajot
Nûbihar sêzde salî

Piçûk sêzde salîne
Ji gunehan xalî ne
Ehmedê Xanî nas ke
Em nevyê wî kalî ne

Gorname

MUAMMER ÖZKAN

Ji Tirkî: **Murad Pola**

YEK

Gor dîrok e. Gor pîrtûk e. Gor lewheya Gîbretê ye. Hema bira meriv bikaribe bi çavê dilê xwe bala xwe bidê, goran bi rûhê xwe ve îdraq bike. Gor ocaxa terbîyeyê ye. Gor warê mûhesebeyê ye. Gor cîhên zelal in ku meriv dikare li wir bi pîvana wehy û bi hesabê yalê din biryarên bi îsabet bide, dikare hestên nazik bi Qur'an û sunnetê binirxîne. Gor, li ber kent û însanên watê û armanca jîyanê jîdestkirine bajarên herî sax, herî candar, herî bi wate ne. Gor sax in, gor candar in...

Dema em ji xwe û em ji hundirê xwe li goran dinihêrin, vegotina bêgotin ya ku herî kamil dibînin. Ka hela hûn herin li wan deran û seba bi yên li wê derê re hevnasî-nê bixebitin û yek bi yek guh bidine rabirdûya wan ya kurt. Darên li wê derê şîretan li we dîkin, kevirên goran jî dipeyivin. Xwe xûz bikin, xwe xûz bikin da ku bi guhê xwe yê dilsoz yê gîyanê xwe guhdarîya dengên tîn bikin. Her guhê, li gor nêzîkbûna esil hinek tiştan ji wir bibihê.

Çavên dizanin lê binihêrin, guhên dizanin bibihên, ma çi nabîne, ma çi nabihê ji goran.

Vêga em li ser gora ku di birra 2., parsê-la 1008, jimara 1280yî de nin. Kurê Namik, hevserê Xetîcê, Hesên Şenol. Ji dayîkbûn: 1938 Mirin: 1984

Herhal di van demên nêzîk de merivên wî hatine ser, çiçekên danîne ser hê hişk nebûne. Li kêleka meqber du heb destmalên kaxizîn yê qurçimî ku pê bêfil yan hêsti-

rê xwe paqij kiribûn hebûn. Kê dizanibû ev nîşana vegotina kîjan hestan bû?

Bilî xwelîyê hê tiştê nedabûne li ser meqber. Hatibû temekirin, dê van roya bi-hata mermerkirin. Min bihîstibû yê tîrbê bi mermer kin, bi mermerê çilûsipî bêçêkirin, gelo wî bi xwe jî haj pê/hay pê hebû?

Gelo ku zanibûya dê gora wî bi mermer bêteçêkirin, dê şa bibûya? Gelo dê li gorên bêmermer binihêriya, bi gora xwe ya bi mermer bipesinîya?

Bi mebesta xeberê bidime wî, min bi pistepîst got: "Dê gora te bi mermer çêbikin!". "

Tu dibêjî qey qêrîna wî ya, "de here lo, mermer ji min re çî!" di dunya min a hundirîn de olan da.

Rast digot, çi şixulê wî bi mermer hebû? Ha gor bi mermer çêkiribûn, ha çênekiribûn çi xêra wê ji wî re hebû? Vêca wanê merzel bi mermeran çêdikirin, ev ji bo kê çêdikirin?

Ez bi xwe jî bi sefêkiya pîrsa xwe kenîyam. Ma ne dîyar bû, ji bo kê çêdikin, dê ji bo kê çêbikin?

Ma bi fikr û fikara "êl û alem çi bêje", ji bo îtibara xwe, ji bo nav û dengê xwe, ji bo rûmeta xwe çenedikirin?

Ma ev merivana him ji ser erdê û him jî ji bin erdê bêhay nebûn?

Carekê dîsa min li gora ku hê di halekî sade de bû nihêrî. Hesên Şenolê di Bayindi-



➤ ra qeza Izmîrê ji dayik bûye, hê heştalîya xwe de li gel malbata xwe li Îzmîrê bi cîh bûye. Mirîyê ku heya dibistana navendî xwendîyê, li Amedê leşkerîya xwe kirîye, di sala 1963an de zewicîye. Ji vê zewacê yek keç yê din kur du zarokên wî çêbûne. Lê hûn nepirsin ka bi çeka kurdaşîyê çend zarokên xwe, ji ber kîjan gunehî kuştîye yan daye kuştin. Lewra wekî ku hûn dizanin dê Perwerdekarê me wê bipirse...

Hesen Şenolê bi îdîa perexwarinê ji banqeya lê dixebitî hatibû avêtin, li taxa lê rûdinişt qehwexanek vekiribû, heyata xwe kudandibû. Hesen Şenolê ku rastî merivên cûr be cûr dihat, bi wan re di babetên cuda cuda de xeber dîda, merivekî wisa bi xeberdanbû, mîzac û xeysetekî wî wîsa hebû li cîyê lêbû xwe heqdar didît, heqdar derdixist.

Herçendî di qehwexana xwe de xûmar didalîstin, şerab didavexwarin, leke nedianî ser mislimanîya xwe û hergav digot qelbê min paqij e. Dema çar sal mabû ji Bag-Kurê teqawût bibe, kîngê pêrgî merivê di rûçîkê mislimanan de bihata, digot: "Piştî ez teqawût bibim, ji ber van karan ezê tobe bikim, dest bi nimêjê bikim."

Lê tiştê bû, di nîsana 1984an di hefta pêşîn şeva paşînê qewimî. Çaxê li gel hevaleyê xwe yê berê li kêleka masê şerab vedixwar, ketibû navçîtîya pevçûneke ji ber hesab derketibû û ji çar cîyan hatibû kêrkirin.

Gava ew di nav xwînê de dibirine nexweşxanê, pêrgî rûçîkê mirinê yê sar dihat, çaxê mûhasebeya jîyana xwe dikir bêgav fikir dikir.

Ma ev çaxê mirinê bû!

Hê yê tobe bikira, yê şerab û qûmar bi terikanda.

Di vê rewşê de, him jî şerabvexwarê dê çawa têketa qebrê, dê bi kîjan rûyî derketa pêşberî Xwedê?

Keça wî kete bîrê. Di dilê xwe de derbas kir; "Xwezila min destûr nedaba da ku bibe

manken. "Rastî! Çima destûr dabûyê bibe manken, wêdera xwe, vêdera xwe veke, nîşanî mêrê xelkê bide? Kir ku wê gotina; "Kuro lawo tu qewat î" hate ber devan, bi diranê xwe yê sa gezke, bihêre.

Çaxê kurê wî kete bîrê, tu dibêjî qey derba, pêncsa, şeşa, hefta xwaribû. Çêr kir, xeber got... Careke dinê, careke din dîsa ji kurê xwe yê ku wî xwe mezin nekiribû, wî terbiye nekiribû çêr kir. .

Dîsa li ser xwe de vegeyîya. Divê nemira, bikira nekira nemira. Di dilê xwe de derbas kir; "Heke bifilitim pêşîyê ezê dest bi nimêjê bikim. " Ji bo dest bi nimêjê bike ev çar salên han ji kû derxistibû?

Ev însan e!. Çi zane dê çar salan nemire?

Lê hankêva bimire!

Lê hankêva bimirim!

"Na, na divê nemirim, bîna reqîya çawa pîs ji devê min tê... "

Dengê mêrikê serê wî girtibû bihîst:

- Birako zû bajo, mêrikê bimire. Gellek xwîn jê diçe...

"Kê dê bimire? Ezê bimirim? Ma ezê bimirim?"

Gotî ez nemirim, gotî ez bijîm.

Lewra ezê tobe bikim, lewra ezê nimêj bikim, lewra ezê hiqq... Gotî ez nemirim, ez dê nemirim, ez dê nemirim... Qet meriv şerabvexwarî dimire?

Xwezila min venexwara, xwezila min tobe bikira, xwezila min nimêj bikira, xwezila..."

- Birê êdî ne hewceye tu zû herî, mêrikê reben mir!.

Bi vê kurtejiyanê em dîsa li gora Hesen Şenol dinihêrin. Û deng tê me ku dîsa qêrîna "xwezîyê" bi heman jîndarî û bi heman candariyê tê dubarekirinê.

Xwezila. .


Xwezila....

Xwezila..... ■

Perwerda Zarokan

MAMOSTE AMEDÎ

Zarok; fêkîyên zewacê, şahîya mal û malbatan, pêşeroja gel û welatan e. Ew, dewlemendiya civak û cihanê ne. Kes û civakên ku ji perwerda zarokan dûr disekine û jîyanek bê zarok dimeşin in, di rastiyê de ew, ji armanc û mebesta mirovbûne ji bêparin û herwiha bi nîfşên xwe ji korocax in. Naxwe, ji bo me nîfş û neslekî ideal pêwîste. Ji bo vê yekê jî, divêt hemû dêwbavên me (ebeweyn) van şîret û destûrên jêr jîbîr nekin:



∞ Ji hêz û qeweta wan zêdetir ji zarokên xwe tiştêkî nexwazin. Lewra ev yek, di zarokan de hest û ramanên xwepiçûkdîtin û netiştûnê hişyar dîke

∞ Dêwbavên ku li hember zarokên xwe ên sûcdar, bêyî ku wan guhdarî bike, dest bi qîre vîrê bike, ev yek dibe sedemê nefêmkirin û nefêrbûna çavkanîya sûcan. Ev rêk û ev rêbaz, ne rêka çareseriyê ye. Çareserî, di guhdarkirin û famkirina zarokan de ye

∞ Divêt dêwbavan, li hember zarokên xwe yeksan û wekhev tevbigerin. Ger ne wiha be, di zarokan de tevger û helwestên

nerewa (anormal) wê hişyar bibin. Wekmînak, xwesteka xwekuştinê, dexesî, serhişkî, asêbûn, dijminatî û wek nevinê, ne saxlemî û keşmekeşiyên gîyanî wê peyda bibin.

∞ Ger zarokên we hêj pitik be, dîsa jî dema hûn li nêrîna ser û kincê wan, an mijandin û bin paqijîya wan dikin, bi wan re bipeyivin. Herçiqaş hûn, li hember peyvên xwe bersiv nestînin jî, lê dîsa jî bizanin kû weslê wan ên wergirtinê vegrîne; ji deng-



► dayîn û tonaja dengên we, bi dilovanî û têkilmendîya we dihesin. (Têzanîn ku pitik, peyamên xwe, bi girî ji dayîka xwe re dîde hesandin. Bêguman, li hember vê girîne dema dayîk bi bersivê erênî têkilîya xwe nîşan dide, ev yek di saxlembûna gîyana pitik de rol û bandorekî girîng dileyize.)

☞ Bicîhanîna her xwestekê zarokan, dibe sedemê mizmozî û nazikmezinbûna zarokan. Evyek jî di rojên pêş de dibe sedemê zîyanên nayên serrastkirinê. Lewra ev jîyan, bi rastî û realîta xwe ne tenê şahî û kêfxweşîyan, jî gellek jan û êşan jî pêk hatiye, jî bo vîya, derdor û civak wek dêwbavan nîkare naz û mizmozîya ev babet zarokan bikşînin. Di encamê de, zarokên wisa, di nav hestên bedbînî, reşbînî û xeydokî de wê bijîn.

☞ Carna, dêwbavan, bi nirxandînek şaş û çewt, jî bo zarokên xwe delalî ranekin, hezkirinekê jî dil ve raberê wan nakin û naxwazin nîşan bidin. Ev helwest jî wek helwesta nehezkirin û netêkilîyek bi qesdî zîyanê dide.

☞ Bavên ku li hember zarokên xwe bê elaqe tevdigerin û herawa nêrîn û mijilbûna bi zarokan re tenê peywîr û berpîrsîya dayîkê dibîne, ne bavê îdeal û numûne ne.

☞ Gellek dêwbav henin ku di neqandin û hilbijartina pîşe û meslegan de kotekî û îpoteka xwe datînin ser zarokên xwe. Dêwbavên ku dibêjin "Ger kurê/keça min mezin bibe, ewê bibe ev tişt û ew tişt" bila zanibînin ku bi vê helwestê mêjîyên zarokên xwe dişon û pêşeroja wan tarî dikin.

☞ Ger ku dêwbav dixwazin helwest û tevgerên xweşik û qenc bi zarokên xwe bidin fêrkirin û qezenckirin, pêwîst e ku jî wan re qad û firsenda serxwebûn û serbestlivîne bidin naskirin. Herwiha, divêt

helwestên biryargirtin û qerardayînen mentiqî bi wan bide qezenckirin. Bi vî awayî, zarok hem bi jîyana civakî re hevnas dibin, hem jî bi serê xwe dikare kesayetîyek civakî bi dest xwe bixin.

☞ Hevalbendîya lîstikan, rêgez û hîmekî bîngehîye. Zarokên bê heval mezin dibin, xwe her dem bi mezinan re pîvan (û muqeyese) dikin. Evyek, jî bo zarokan zîyanek gellektirîn mezin e. Lewra, ti zarok nabin mezin û jî ber ku zarokîya xwe nejiyanin, wê ev yek di geşbûn û pêşveçûna kesayetîya wan de û di çalakî û livanên wan de roleke nebaş bileyize. ■

Evîna Wenda

ÎZZEDDÎN QOSERÎ

*Ez bang dikim, ma tu dihisî
Gazinan herf bi herf dinivisî?
Were agirê dilê min vemirîne
His û raman li pê te digrîne
Hêsir jî nava dilê min dibarîne
Ne mal ne star û ne hêlîn e
Ez im ê evîndar tu evîn e
Dixwazim yek car tu wer ba min
Bi sed carî goranê te canê min
Were derman ke jana min
Bibe ronî û makesa min*

20.05.2004 Îst

Ji bo Edebîyata Trajîk Nimûneyeke Baş: Mijabad

ZILKÎF XWEŞHÊVÎ

Trajedî yan jî tragedya têgeheke şanoyê ye her weha beşek ji şanoyê ye ligel komedyayê. Dîroka vê peyvîkê digîhije 6000 sal berîya zayînê. Trajedî ji herdu peyvên tragos(bizin) û oîdîa(stran) pêk tê ku tragoîdîa tê wateya "strana bizinan". Ev nav ji ber di şahiyên Dîonyos(1) de beşdarvanên koroyê ku şeklên wan ji navokê jêr (ji van peykerên wisa re "satyr" tê gotin.) dimîna gîskan derketîye. Ev peyvik ji wê demê heta evro maye lêbelê di wateya wê de guherîn çêbûye. Îro peyvîka trajedîyê ketîye jîyana rojane û pir kes vê peyvîkê bikartînin. Di zimanê rojane de trajedî di wateya bêçaretîya bi êş û azar de ye, di edebîyatê de jî nêzîgê vê wateyê de tê bikaranîn. Lehengên berhemên edebî ku di navenda bûyera edebî de ne eger di nav du tercîhên jihev xerabtir de bîmînin û ji neçarî yekê tercîh bikin û berhem bi vî rengî temam bibe ev tişt dibe trajedîya edebî; dîsa eger dawîya lehengan, berhema edebî de bi kambaxî bi encam bibe her weha bûyera navendîya berhemê jî bi vî rengî temam bibe ev jî dibe trajedî.

Gava mirov li edebîyata kurdî dinihêre li rastê edebîyatek seranser trajîk dibe. Ede-

bîyata devkî ya kurdî bi taybetî stranên dengbêjan piranî li ser çîrokên trajîk in her weha meqam û rîtma van stranên jî di rengê girîn û hewarê de ne. Nimûneyên vê babetê gelek in û hêjayê xebateke serbixwe ye. Li aliyekî din şahesera kurdî "Mem û Zîn" berhemeke trajîk e. Cenabê Xanî bi hostatîyeke pir mezin trajedîya evîniya Mem û Zînê bi trajedîya milletê kurd ve hundandîye û esera xwe kirîye yekemîn berhema trajîk di edebîyata kurdî de.

Binyadên Berhemên Trajîk:


Eger mirov li şopên trajedîyê bigere digîhije destpêka jîyana dinyayê ku li gorî bawerîya me bi Adem û Hewayê dest pê kirîye. Ji bihiştê derxistin li dinyayê awarebûn trajedî ye, dîsa di pirtûkên pîroz de trajedîya hin kes û civatan bo şîret jê girtinê hatîye behskirin. Tewrat di aliyek de seranser trajedîya Israîlîyan qal dike ku ev îzahatên di Tewratê de motîvasyoneke pir xurt e ji bo Israîlîyan. Quran behsa qewmên qelandî dike ku ew ji rêşaşîya xwe tuşî gelek karesatan bûne. Dîsa di lîteratura dînî de rabûna qîyametê nîşan dide ku dawîya dinyayê jî trajedî ye. Gelek eşkera ye Xwedê bo-

(1) Dîonyos: Di mîtolojiya Yunan de xwedayê mey û xwezayê ye, heman katî de Dîonyos navê olek e. Pêgirtên vê olê bi vexwarina meyê xwestine bigîhin rastîya xwe û deriyên alema efsûnî vekin. Ji pêgirtên peyayên vê olê re "Satîrus", jinan re jî "Bakkha" tê gotin.

► na ku peyama xwe baş bi mirovan bide famkirin behsa trajediya qewmên qelandî û derbasbûyî kirîye ku kartêkirina wî li ser mirovan gelek e. Xuyaye mebesta behskirina trajediye û wateya wê bi şîurkirin û bîrewerkirina mirovan e.

Eger mirov li berhemên edebiyên cîhanî yên pêşî binihêre dîsa trajedî derdikeve pêşberî mirov. "Romeo û Juliyet" a Shekspere, "Faust" a Goethe berhemên sereke ne her weha "Leyla û Mecnun" ku cografya Îslamê de bi hemû zimanên milletên musulman wek mesnevî hatiye nivîsandin berhemêke trajîk e. Belê eger em vegezin ser pîrsiyara xwe, derdikeve meydanê ku berhemên trajîk li ser êş û azara şexsî, civatî, neteweyî û mirovahiyê ava dibe. Evîna neçara Romeo û Juliyetê, Leyla û Mecnunî, Mem û Zînê, Faust û Margarettayê wek êşa derunîya hemû mirovan bi qelma hostayên mezin paydar bûne. Her êş her karesat hem ji bona şexsan hem ji bona milletan her çi qas kavilî û derbederî bin jî li dû xwe derfet û keysên mezin jî dihînin. Nivîskar û helbestvan wek wijdan û heşê miletek yan jî hemû mirovahiyê êş û azara ku dîtine yan jî şahidiya wê kirine bi dehayê mezin di çarçova qaîdeyên berhemên edebî de pêşkêşê beşeriyetê kirine. Vê rastiyê Seydayê Xanî wisa raber dike: "Şerha xemê dil bikim fesane/ Zînê û Memê bikim behane"

Em weku milata kurd bi taybetî vê sêsed- çarsed salên dawî de ku jana wî hêj jî berdewame tuşî gelek karesatan bûne û di dîroka mileta me de ev serdem hêja ye ku mirov bibêje serdama trajediye ye. Ji bo bîdestxistina azadiyê serhildanên bêjimar, çewisandin, şewitandin, koçberî, sirgun, enfal, Helepçe û xewna şikandî Mehabad...Belê mileta me van karesatan bi têra



xwe dîtiye wêranbûn derbederiyê heta hes-tiyê xwe hîs kirîye lê mixabin ji van karesatan qasê ku jê tê hêvîkirin îstifade nekirîye. Her çi qas sîya van karesatan li ser serên me, têna wan di laşên me de, bîranîna wan di dilên me de bin jî ; me vana wek berhemên edebî dernexistiye meydana edebê. Yanê me trajediya xwe raberî wijdan mirovahiyê nekirîye her weha me ji mileta xwe re nekirîye hişyarî û ronahî. Erê Ehmedê Xanî li gora dema xwe wek kesekî anakronîk şaheserek dîyarî milletê xwe kiribe jî vê "bîd'eya" wî nehatiye berdewamkirin. Belam van salên dawî de berhemên hêvidar jî aliyê helbestvan û nivîskarên kurd ve têne nivîsandin. Yek ji vana jî di bawerîya min de romana Jan Dost "Mijabad" e.

Wek Romaneke Trajîk: Mijabad

Mijabad 2004'an de li Amedê ji aliyê weşanxana "Belkî" yê ve hatiye weşandin. Di serî de berga pirtûkê hêjayê pesnêye xuyaye çêkerê bergê, romanê baş fam kirîye û

wek hunermendekî naveroka romanê li ser wêneya bergê neqîşandîye. Li ser zevîyeke keska berdara fotografê meşhur ê ku Komara Mehabadê tê îlankirin. (Sê kes li pêş, alaya komarê hildane li pey wan, di serî de Mela Mistefa Barzanî û civateke mezin bi rêzê rawestîne.) Li jorê perspektîfa zevîya kesk de ezmaneke ewr tahl û di nava ewrên tahl de sê masiyên kesk û sor melevanîyeke xeyalî dikin.

Mirov dikare bibêje ku Mijabad harmônîya trajediyê ye. Di romanê de trajedîya şexsî, neteweyî û trajedîya mirovahîyê bi hostatî li hev hatîye hunandin. Her çiqas mijar li ser bûyereke neteweyî be jî romanus lehengên romanê qurbana mijarê nekirîye, yanê êşa evîne qurbana hestên neteweyî nekirîye ev jî ji bo romanê xaleke erênî ye. Em dikarin di romanê de unsurên trajediyê bi vî şeweyî raber bikin:

Mijabadê de Trajedîya Evînî û Şexsî:

Badînê Amêdî: Yekemîn lehengê romanê ye û roman ji bîranînên wî pêk hatîye. Badîn hem mexdûrê evîneke dijwar û bêhavlî e hem jî sêwîyê trajedîya netewî ya kurd e. Kalikê wî Mela Qadir ji ber doza neteweyî ji aliyê Osmanîyan ve tê darde kirin. Bavê Badîn Unîsê Amêdî jî beşdarî Şoreşa Şêx Mehmud Berzencî dibe û şehîd dikeve. Badîn bavê xwe nedîye her weha ji ber ku di katê zayînê de Hamêsta dîya wî diçe ser dilovanîya xwe wê jî nabîne, li Amêdîyê li ber destê dapîra xwe mezin dibe. Wexta bi xortanîya xwe dihesa dil berdide keça metaxwe, lê ji ber ku her du xuşk û birayên şîrîn zewaca wan qedexe ye. Ev bandoreke pir mezin li ser herdu xortan dike. Keçik heşê xwe wunda dike, Badîn jî ji kerban terkeser dibe. Badîn li Silêmanîyê dest bi jîyaneke nû dike lê li vir dikeve kemîna evîneke gelek xedar. Navê wê Jale ye. Badîn bi şeweyeke bêsalix bi hemû hebûna xwe ve bi Jaleyê ve tê girêdan. Vê evîna dilhej wî sews û gêj dike lê dawîya vê çîrokê riswatîye ku Badîn dibêje: "Riswayê îşqê tenha ne ez

bûm/ Kes dî zemanan hub bê melamet" Belê ev malik encama trajedîya evînê ye bi şeweyeke giştî.

Jale keçeke ku bi rindîya xwe navûdeng daye, heta tê gotin şairê meşhur Goran wan helbestên xwe yê xweşik û lîrîk ji ber evîna Jaleyê nivîsandîye. Jale keçeke gelek çalak û serbest e. Badîn û Jale du-sê sal li Silêmanîyê bi hev re dijîn; lê Jale xezaleke kovî ye bi ciyekî ve nayê girêdan, pêşî diçe Bexdayê beşa zimanê Îngilîzî dixwîne paşê jî, ji binî ve terka Badîn dike. Badîn bi wundakirina yara xwe adeta serxweş dibe dilê xwe yê wêranbûyî û seqamgirtî dide ber agirê şoreşa kurdî û beşdarî refê pêşmergeyên Barzanî dibe. Şer dike tê zîndankirin dawîyê de ligel pêşmergeyan bi serperîştîya Barzanî derbasî Mehabadê dibin.

Badîn şaireke kurmancînus e, hevalên wî li Mehabadê şairên meşhur Hejar û Hêmin in. Di dibistanekê de dest bi mamosteyîyê dike li vir Mujdeyê nas dike Mujde jî mamosteye. Badîn hêdî hêdî bi Mujdeyê ve tê girêdan ew û Mujde ji hev hez dikin êdî behsa wextê nîşanîyê dikin. Lê hevalê Badîn Kerîmê Şikakî ku Mujdeyê re bavîti kirîye wê mezin kirîye bê dil e. Kerîm tevî malbata xwe her weha tevî Mujdeyê diçin Şînoyê cîwar dibin. Badîn ji yara xwe tu xeberê nagire. Dawîyê de Mujde bi Kerîmê Şikakî re dizewice. Piştî vê bûyerê Badîn ji dunyayê bi temamî sar dibe weke miriyekî li ser pîya digere. Ji bo halê Badîn wisa tê gotin: "Yek çaran herifîna evînekê ji sed mirinî xedartir û diwartir e." (229) Tevî jana têkçûna evîne rewşa berew têkçûna komarê jî bandoreke gelek xedar li Badîn dike. Badîn ji binî de bê hêvî dibe xwe dihavêje mala xwe û xwe dispêre mirinê.

Jaleyê Hewramî: Lehenga duyemîn e di romanê de her çend Badîn ji bilî Jaleyê ji



► keça meta xwe û Mujdeyê hez kiribe jî evîna wî ya sereke Jale ye. Di romanê de di nav Jaleyê û dîya wê de pevgirêdanek tê çêkirin. Dîya Jaleyê Hadile di Silêmanîyê de bi rindîya xwe nav û deng daye. Wusa ye ku ji rindîya wê kes newêre pê re bizewice. Dawîyê de Hemzeyê Paştmalîyê Caf pê re dizewice. Gorî ku tê gotinê Hemzê çil roj ji hundir dernakeve. 1914an de Hemze dibin enîya şer. Piştî mawayekê Hadile bi wê rindîya xweya bi navûdeng hew dikare raweste û dibe jineke ketî. Dostikê wê efserên Osmanî û bi taybetî efserên Îngilîz in ji tîrsa efseran kes nikare destê xwe bide Hadileyê. Wexta ku Şêx Mehmud dibe Melîk, Hemze ji enîya şer vedigere. Hemze jîna xwe ya ketî dikuje û ji kerba, xwe jî dihavêje Çemê Sîrwanê. Şêx Mehmud bûyerê dibihîze û Jaleya berşîr teslimê maleke Hewramî dike. Çîroka Jaleyê jî nêzî serpêhatiyên dîya wê ne. Jale jî bi rindîya xwe deng çaye, xwazgînên Jaleyê jî mîna dîya wê gelek in. Jale têra xwe bi Badîn nayîne wek xûyeke îrsî têtîkîya wê jî bi Îngilîzan re çêdibe hin kes dibêjin Jale li ser hesabê Îngilîzan sîxurî dike. Balkêş e Îngilîz di wê serdemê de hem welatê Badîn wêran dikin hem jî evîna wî wêran dikin. Dawîya romanê de Badîn Jaleyê li Mehabadê li mala Sultana cihu ya ku jinan dide xebitandinê dibîne, Badîn bi çavê serê xwe bawer nake lê a ku dîtîye Jale bi xwe ye. Di vî alî de jî aqibeta wê mîna ya dîya wê ye. Di romanê de Jale evîn e, têtîkîya e, mirin e, dijmin e, Îngilîz e, axir qîya-meta Badîn e.

Keça Stranbêj: Di şexsê vê keçikê de çîrokek trajîk û evînî tê çalkirin. Ev keç cîranê Badîn e li Mehabadê. Badîn tenê dengê strana wê dibihîse ku her gav heman strana ku gotinên wê ji xezelek Hafîzê Şîrazî ye dînehwirîne. Di romanê de ji stranê vê ma-

lîka Farîsî (Çendan kî guftem xem ba tebîban/ Derman nekerdend miskîn xerîban) sê car wek leitmotîfek tê dubarekirin.

Ev keçika dilşewitî bi vê strana xwe şîna evîneke mêrkuj digire ku kuştîyê vê evînê birayê wê Heme Resul e. Çîroka Heme Resul hemû Mehabadî dizanin û kinukurtîya vê çîroka kambax Hejar ji Badîn re dibêje. Heme Resul evîndarê keça xiristîyana bi navê Wêlmayê dibe ku bavê wê nujdar e li Mehabadê. Wêlma bi cil û bergên tengên frengî û bi bedewîyek bê salix dilê hemû xortê Mehabadî direvîne. Lê Heme Resul bi şeweyek nexweşîyê bi Wêlmayê ve tê girêdan. Nexweş dikeve wî dibin nexweşxaneyên Tewrêz û Tehranê lêbelê rizgarîya wî ji destê vê evînê tune. Rojekê ew ji bo dermanekî li Mehabadê diçe dermanxaneyek li wê, ji nîşgav de di ber de Wêlma derbas dibe û di wê kêlîyê de Heme Resul ji pîyan dikeve û dimire. Belê Mehabad wisa bajare ku çîrokên bi vî rengî tê de diqewimin; ev çîrok di romanê de asta trajedîya evînî û kurahîya Mehabadê zêdetir kirîye di bawerîya min de.

Di Mijabadê de Trajedîya Neteweyî:

Yek lehengê romanê jî Mehabad e. Mehabad kurd e, Mijabad e, xewna têtîkîyîya gelekî ye. Nivîskar wisa dibêje: "Mehabad şarê mijê ye, MIJABAD e, ne tenê mija xwezayê lê komara ku saz bûye bi xwe di nava mijêke sor de digevize." (19) Mehabadî di nav şahî û şayîşê de diçin û tên. Di xewnên xwe de dîkên serjêkirî dibînin, li Meydana Çarçirayê nivê şevê dîk bang didin, qîre qîre dikin, Mehabadî di xewnên xwe de barîna qetê werîsan dibînin û qirika hemû Mehabadîyan de şopên werîsan heye. Ev dîmen rûyê şayîş û tîrsê ye li Mehabadê. Li aliyekî din li çayxaneyên Mehabadê ji gramafonan dengê strana "Heta mirdin weku bende li hizmet şahî Kurdistan/ Heyatî xoy fida ka bo hemû emrêk û fermanî" bilind dibe. Hemû Mehabadî bi hestên neteweyî ji xwe çune adeta, berberêkî Me-

habadî ji Badîn re dibêje: "Min sond xwarî-ye ji pêşmergan û mamostan heqdestê xwe nagirim." (127)

Di kolanên Mehabadê de Emîral Axa (ev nav ne tesadufîye) di destê wî de satil, avê pars dike, di çayxaneyan de mase bi mase digere avê dixwaze û paşê avê dibe dirijîne Çemê Sablaxê. Di wê bawerîyê de ye ku bi zêdebûna avê Sablax dê bibe derya. Emîral Axa ji mirovên çayxaneyê re wisa dibêje: "Derya, ne derya be komar hîç e." (20) "Çemê Sablaxê têra keştîyên mezin nake, ji Pêşewê re bibêjin: Bê derya nabe." (21) Kesên ku ava wan tunebe Emîral Axa di şuna avê de tiştêkî din dixwaze "Hêsiran, birijîne hêsiran, bû dereng, divê berî zivistanê em xuşîna pêlên deryayê bibihîsin, kilîtên demê di destê yekî xwedê nenas de ne." (170)

Ez dikarim bibêjim Emîral Axa di Mijabadê de sembola herî resen û trajîk e. Nivîskar êşa dewletnebûn û biserneketina Kurdan di şexsê Emîral Axa de weku dûrbûna cografyaya kurdistanê ji deryayê da-ye nişandan. Lêbelê nivîskar weku me nimûneyên wî li jor dîyar kir bi awayekî humermendane û bi hestekî dilşewatane vê êşê bi sembola Emîral Axa derdibirîne. Çendîn Emîral Axa mîna dînekî xuya bike jî di rastîyê de filozofê êşa neteweyî ye. "Her kurdek tê kuştin gotina wî ya dawî "xwezî" ye lê ez nahêlim Pêşewa bibêje xwezî eger rê gelekî li komarê teng bû wê Pêşewa li gemîyekê siwar bibe û xwe bigihîne peravîne dût." (105) Lê Emîral Axa têk diçe dilê xwe ranagire, diçe kenarê Sablaxê û gotinên xwe yên dawî dibêje: "Ji nişkê ve satila xwe avête çem û berê xwe da me û qêrîya: "Bê derya nabe, ev neh meh in ku ez dibêjim, lê we guhên xwe sewax kirine." û xwe avête nava avê. Berî xwe biavêje nava avê, min bi çavê serê xwe dît ku ew bi xwe bû av..." (217)

Sembola diduyan a Mehabadê Kalê Werîsfiroş e. Badîn wexta werîsfiroş dibîne sar dibe, heşê wî tevlihev dibe. Kalê Werîsfiroş

ji wek rastîyek tazî gava çavê wî li Badîn dikeve behsa werîs, mirin û têkçûnê dike. "Ev werîs, ev werîs wê kenê Mehabadîyan rawestîne." (96) Efserek Îranî berîya ruxandîna Mehabadê tê dikanê werîsfiroş û sê werîsan jê dikire û vê tembîhê lê dike: "Her sîyan têxe nava zeytê û bila emanet bin li bate, heta ez careke dî tîm." (204) Lê Kalê Werîsfiroş dawîya romanê de, di dest de werîsên zeytkirî, xwe di nava derîyê dikana xwe de xwe darda dike. Werîsfiroş di romanê de sembola aqîbeta komara Mehabadê ye li tenîştê hêvî û xwezîya Emîral Axa rastîya reş û tahla Mehabadîyan e.

Her çisqas di navenda bûyera romanê de Komara Mehabadê hebe jî bi wasita lehengên romanê Serhildana Dêrsimê û Agirîyê her weha Serhildana Simko, Şoreşa Şêx Mehmed û Şoreşa Barzanî jî tê bahskirin. Ji van lehengan her lehengek nişana birîneke neteweyî ye û di romanê de çiro-keke trajîk e. Bêguman behskirina van bûyerên dîrokî di çarçova berhemeke edebî de romanê dewlemendtir kirîye, her weha wêneyeke rasteqîn e ji trajedîya mileta Kurd.

Serhildana Dêrsimê: Di romanê de trajedîya Dêrsimê bi heneyê hatîye simbolîzekirin. Şahid û lehengê serhildanê Heme Reşîd e. Heme Reşîd ku navê wî yê rastî Hisênê Kanzade ye di Silêmanîyê de Badîn nas dike û dibin dost. Heme Reşîd li Dêrsimê şahidê pir tiştan bûye. Gava efserek û du serbazên Tirk dest dihavêjin xuşka wî, xwe wunda dike û wan dikuje, xuşka wî jî li wê dimire. Piştî vê bûyerê direve tî Silêmanîyê. Dibêje: "Tirk li min digerin segên xwe berdane welatê xwedê, şopa bêhna heneyê diajon." Hene bêhna Serhildanê ye, bêhna serhildêran e. Gava Seyid Riza tê dardakirin bûk û keçên Dêrsimê porê xwe hene dikin



► û dibêjin: "Em serên xwe naşon heta Seyîd Riza desturê nede." Eskerên Tirkan van keç û bûkan yek bi yek dihavêjin çemê Munzurê heta mehekê jî heneya bişaftî çem reş dike. Heme Reşîd misêwa dikesire û digirî, rojekê ji Silêmanîyê jî serê xwe hildide û diçe.

Serhildana Agirîyê: Di romanê de trajedîya Agirîyê Mujde temsîl dike. Gava serhildana Agirîyê derdikeve bavê Mujdeyê Zilfoyê Celalî keça xwe ya biçûk û jina xwe radeştê dostê xwe Kerîmê Şîkakî dike û beşdarê serhildanê dibe û êdî hew vedigere. Mujdeya çar salî⁽²⁾ gava pîrsa bavê xwe dike dêya wê: "Bavê min li kû ye? –Keça min tu wî çîyayê porsipî dibînî? Bavê te li wir e. Çi dike? –Berfê dihelîne. Çima? –Ji bo em ji sermê nemirin." (67) Ev diyalog nimûneyeke baş e ji bo çawanîya behskirina trajedîya di romanê de.

Serhildana Şêx Mehmud: Silêmanî bi xwe şahidîya Serhildanê dike. Hej bîranînên Serhildanê di nav xelkê Silêmanîyê de teze ne; heta dizanin Şêx li ku birîndar bûye û xwe sipartîye kijan kevîrî jî. Gotinên Şêx di devê xelkê de digerin. Şêx gava serhildanê daye destpêkirin gotîye: "Lem niştimane da yan min yan îngilîz" (15) Di alîyê dinê de bavê Badîn Unisê Amêdî beşdarê serhildanê bûye û bi qehremanî şehîd ketîye.

Serhildana Simko: Ev serhildan bi wasîta Kerîmê Şîkakî tê qalkirin. Kerîm kurê Simko ye. Ji ber hindê serhildan ji bo Kerîm birînek du alî ye. Kerîm kuştina Simko Axa bi vî awayî vedibêje: "Dema Simko Axa kuştin, nalîneke weke barebara karîkên şîr ji darên Şînoyê, Urmîyê, Salmasê û Xo-

yê hat, herkesî girîyê spîndaran bihîst, hinar û sêvên wê salê ber negirtin, beru di darên xwe de teqîyan." (28) "Dema Simko kuştin çîya bêdeng man, tenê li hev dinihêrîn û digirîyan, tenêtiya xwe jibîr kiribûn, wê salê ba rawestîya bû." (28) Piştî kuştina Simko: "Keç û bûkên Şîkakî li ser gora Simko civîyan û bi kezîyên xwe kêla serê wî veşartin, heta niha keçikên Şîkakî kezîkur in." (29)

Serhildana Barzanî: Barzanî li dijî hêzên îraqê serhildanê li dar dixê. Di demekî kurt de serhildan fireh dibe û di nav Kurdan de deng vedide. Badîn jî wek pîrî endamê Hiwayê beşdarê serhildanê dibe. Di vî navê de îngilîz jî piştgirîya îraqê dikin, Kurd li dijî îngilîzan jî şer dikin. Lê di dawîyê de ji ber îxaneta cehşan û bêpiştbûna Kurdan Barzanî naçar tevî pêşmergeyên xwe û malbatên wan derbasî Kurdistana Îranê dibin. Ji vir pê de dibin pêşmergeyên Komara Mehabadê. Di romanê de Barzanî bi pesn û sî-tayîş tê salixdan. "Ji nişkê ve, weke xewnekê, weke taveke biharê û şêrekî newalê Berzanî xuya bû." (139) Dîsa wexta li Mehabadê di nav Kurdan û îranê de şer dest pê dike pêşmergeyekî mezin bi navê Xelîl Xoşevî birîndar dibe, wî dibin nexweşxana Tewrêzê û Barzanî tê zîyaretîya wî: "Barzanî hate serdana wî û her deh birînen wî yên kûr ramûsan, ew dev li ken mir, wê rojê xelkê hemûyan girîyê Bêrzanî dît 'Tenê mêr dizanin li ser lehengekî mîna Xelîlî bigirîn.'" (147) dibêje.

Badîn bi xwe pêşmergeyekî Barzanî ye û di bîranînên xwe de cî dide hin bîranîn di derbarê malbata Barzanî jî. Di 16 Gelawêjê – 18 Remezanê roja îne li Mehabadê di bin alaya Kurdistanê de ji dayikbûna Mesud Barzanî tê salix dan. Ji ber ku bibe şervan û egîd navika wî bi xencerê tê birîn. "Ji adeta ye ku zarokek nuh çê dibe yek di guhê wî de azan dide lê kêlîka ku Mesud welidî, ji camîyên Mehabadê hemûyan dengê azanê bilind bû." (183)

(2) Xuya ye romannus di jiyê Mujdeyê de şaşîti kirîye. Nivîskar dibêje, Mujde di serhildanê de (ku sal 1938 e) çar salî bûye. Piştî wî em dibînin ku 1946'an de Mujde li Mehabadê mamostetî dike û têkilîya wî bi Badîn re çêdibe. Wê çaxê Mujde dibe 12 salî ku ne mumkune keçekî 12 salî mamostetî bike. (Z.X.)

Ev serhildanên ku hatin behskirin di romanê de piranî bi aliyên xwe yên trajîk cî girtine her weha bi peyamên manîdar hatine nîşandan. Lê nivîskar analîza wan a dîrokî jî dike. Wek nimûne ji devê Heme Reşîd bo serhildanên Kurdan: "Ax bira ax serhildanên me weke darên bin xwe tenê sî bin govendên koran in ew serhildan xwedê jî nizane kê fêrî dîlana tewş kirine!" (36)

Trajedîya Mirovahîyê:

Bi taybetî kalikê Badîn Entranîkê Ermenî bi navê xwe yê dîn Nubar Nalbendîyan û hevalê wî Agopê Meyfiroş çîroka trajedîya mirovahîyê dinimînin di romanê de. Entranîk kalikê Badîn e, li Mehabadê wênekêş e; ewqas êş û azar dîtîye ku bawerîya wî êdî li dinê bi tu tiştêkî nemaye. Ligel bavê Badîn Unisê Amêdî bûye şahid û lehengê trajedîya Sarîqamişê ji wê filitîye beşdarê refê serhildêrên Ermenî bûye. Hemû neferên malbata xwe wunda kirîye. Şahidê qirkirina Ermenîyan bûye, dîrûtiya Rusan û Ewrûpiyan dîtîye. Piştî ewqas şer û qirkirin gihaye vê qeneetê ku bi vî awayî vedibêje: "...ez mirovekî ji zincîr û qeydên mirovan riha bûme, min xwe ji ol û ji neteweya xwe bi heft avan şuştîye, ez ne hemwelatîyê tu dewletê me, ez im wodka ye û stodayoya min e. Amîn. Stodayoya min Ermenîsta min e, wodka jî hevalê min e, partîya min e, serokê min e, xwedayê min e." (92) Entranîk gava hevalê wî Agop serxweş dibe jê re dibêje: "De hirçê min de... Ermenîstan bi qurbana gunê te be!" (87)

Felsefa Entranîk felsefa devjêberdanê û bêbawerîyê ye. Nivîskar bi rîya Entranîk xîtabê wijdana mirovahîyê dike, li ser qewimandinên hovane û weşîyane dixwaze xwêner bide fikirandin. "Ez şahidê hovîtiya mirovan im, ez nizanim çima ewqasî xwîn erzane e! Misilman cihu, xirîstîyan, Kurd, Rus Ereb, Ecem, Azerî, Ermen, Tirk, gû, rêx...navên dirindeyan in, xwedê bi xwe jî nizane çima ev xelk ji sîya hev tehemul nakin!" (88)

Agopê Meyfiroş: Meyxana wî li Mehabadê ye, hevalê Entranîk e. Çîroka wî jî gelek trajîk e. Berîya tehçîra Ermenîyan mala wan li Xarpûtê bûye. Qasê ku tê bîra wî serê bav, bira û dîya wî weke kundiran li ser sekuya mala wan digîndirînin. Deh kes li xuşka wî ya 13 salî dicivin cil lê diqetînin, lê wê çaxê nizane çima cilan lê diqetînin. Ew bi xwe ji mêranîyê ketîye. Wexta serxweş dibe bîranînen di heşê wî de zil didin û dawîyê de wek gurekî dizure. Çîroka Agopî weke histirîyek di dilê mirov de diçe. Agop bi jîyana xwe di romanê de temsîla hovîtiya şer û dirindetîya mirovên weşî dike.

Dawî:

Dawîya trajedîyên ku di romanê de tê behskirin gelek dilsojin. Mexdûr û bindestên mafdar dimirin û yên dîn dimînin. Komara Mehabadê berew ruxandinê diçe. Zilma îranê bi piştgirîya Birîtanyayê û bi destura Rusyayê bêhn li Komara nuciwan diçikîne. Badîn bi her awayî têk diçe. Jana Jaleyê Mujde kurtir dike û rewşa Komarê mora mirinê li dil û mejîyê wî dixê. Badîn dikeve jura xwe û xwe dispêre mirinê. Tê hestkirin ku Badîn xwe dikeve. Li beramberî vê rewşê bikujên evîna Badîn Jale, Mujde û Kerîm dimînin. Kalikê Badîn Entranîk dimire hevalê Entranîkî Agop li ser gora wî dimire. Emîral Axa xwe dihavêje Sablaxê û xwe dikeve, Kalê Werîsfiroş xwe di nava dikanê xwe de darda dike.

Belê xuya ye ku dawîya romanê jî li gorî taybetîyên berhemên trajîk e: MIRIN û KUŞ-TIN. Di encamê de wek romaneke trajîk Mijabad, ji bo çêbûn û gihandina hestên neteweyî û pêşderxistina wijdana mirovahîyê li beramber zilm û bê edaletîya carî ya cîhanê berhemeke serketî û hêjayê pesnê ye. ■



Jiyana Mirov û Şeveqa Serkeftinê

MUCTEBA BARAVI

Pirsgirêka rojê ya herî mezin a di warê fikrê de, ew valahî û nakokîya di navbera daxwaz û jiyankirina wan de ye.

Ziman gelekê cara jî berdevkîya heş û berhemên heş bêtir ya xeyal û asîmanên wê yê xemilandî dike.

Ji bo ku heş berheman bide, divê sedemên xwe yên berbiçav hebin û divê ku pêlikên gihaştina armancê yeko yeko pê bike.

Ev yeka hanê ne ewqasa hêsan e û nabe nesîbê gelek kesan.

Lê kî xwe li berdevkîya xîyalan deyne, ew yek hêsan e û pêwîstî bi tu pîvanên heşmendî jî nîne.

Di cîhana xîyalan de dikare her tiştî bixwaze û her tiştî bike; bê ku kesek hesabê kirinên wî jê bipirsin û bê ku li astengan rast were...

Cîhan li wê derê bêsînor e û dinyayên avabûna wan li derveyê derfetên heyî bi hêsanî dikarin ava bibin.

Gelek xwestekên bi navê fikr û ramanan tîngotin û daxwazkirin, di rastîyê de tenê

xwezîpêanîn in û tu rûmeteke xwe jî tunin.

Her wekî me li jor jî got, tu asteng jî di xwezîpêanînê de tune; lê divê em zanibin tu rûmeta xwe jî tune.

Xweşkirin û kirin, du tiştên ji hevûdu cihê ne.

Behsa avakirina cîvakeke îdeal, dikare di çend saetan de bê kirin, lê sazkirina wê bi salan belkî bi sedsalan e.

Bidestxistina hin malûmat û zanistên jiyane heke çend rojan bigre, xwe li gorî pêdivîya wê zanistê perwerdekirin karê meha û sala ye.

Yek dikare navê psîkolojîyên bi mirov re heye di demeke kurt de bixwîne lê naskirina wan û li gorî wan bi mirovan re tevgerkirin û danûstendin pêvajoyeke dûvdîrêj e.

Nepejirandin û amadekirina alternatîfan jî du nakokîyên nêzîkî van nakokîyên em dikin in. Mirov dikare pozê xwe jî gelek tiştên heyî re bilind bike û xeletîyên wan bibîne, an rêxistinên gunehkar bibîne û xeletîyên wan li pê hevûdu rêz bike; lê qe jî ne hêsan e ku mirov bikaribe alternatîfê jî ew tiştê ku mirov rexne dike re, di jiyana rasteqîn de amade bike.

Ev yek mîna dema avakirin û xerakirinê

ye.

Avahîyek dikare di rojekê de ji hêla kesekî ve bê hilweşandin lê ji hêla bi dehan kesan di hukmê mehan de bi zorê tê avakirin.

Heke mirov ji asîmanên xeyalan dakevin û bixwazin daxwazên xwe bi rêka heş bînin kerteke maqûl ku di jîyana rasteqîn de jî derfet jibicîhanîna wan re heye, dê wê gavê dev ji sloganên û gotinên ku dilê wan dixwaze berdin û şert û mercên jîyanê bidin ber çavê xwe û zimanê xwe li gorî gavên xwe yê ku di jîyanê de diavêjin an jî dikarin biavêjin bilivînin. Ji ber ku tim jîyana rasteqîn -ku li ser pêlikên sebebên hatîye avakirin- li ber çavê xwe digrin fikr û gotinên wan jî dê rûmete xwe hebînin û di jîyanê de bibin xwedîgiranîyekê; welew ku fêdeyekê nedin xwedîyê xwe dê karibin ronahîyekê bide kesên bi liv û

tevger ku bikaribin çêtir û rastir tevbigerin.

Kina gotinê, divê newala di navbera gotin û kirinê de vebûye bi taybetî gotina ku mêweyê xeyalan e zû bête dagirtin an na dê gelek kes li ser navê fikrê jîyana xwe di asîmanên xeyalan de telef bikin bê ku tu encam jê were girtin.

Belê bêgûman dê mîna zarokan li ser qûmîstanê xanîk û projeyan jî xwe re saz bikin, lê belê ew proje avahîyawan, tenê heta rabûna bayekî an jî pêlekê ku dê bi ser de were dikare bimîne.

Dar

NAÏF ERGÜN

*Dar e zindî ye
Her dem ser bilind e
Daxwaza wê av û roj e
Jêr tê diçe jor
Hem bûka xemlandî ye
Hem jî zarok dane
Hem jî tazî ye
Û bi şaxsîyet e
Ne zîyano ye
Ne jî rûniştî
Her dem kemalî ye*

*Bi bayê xişxişokê
Bi tavê sîdar e
Ji rêbera re bêhndar e*

*Dar e
Hem jîyan e
Hem evîn e
Û hem jî pîre
U mirin jî benda dar e*

Li hinda evdan jî û li hinda Xweda jî tiş-tê herî nexweşik tê dîtin, gotinên ew kesên ne xwedîyê gotinên xwe ne.

Em ji Xwedayê pirkerem, hêvîya gotina bi hikmet û zanebûn, û serkeftina bicîhanîna gotina ku mêweyê hikmet û zanîne ye dikin! 2006-03-16 ■



Rovî û Dîk

SEYDA RONAHI

Rojekê ji roja;
Rovî birçîna ra, bûbû mîna gêja
Got: "Ez çî bikim, çî nekim,
Bi vî zîkê birçî nikarim plana çêkim
Ezê herim, bizîvirim, bigerim
Qey rasta neçîrekê werim.
Nêzikî li gund kir li dorhêla nêrî,
Dî ku dîkek li ser darê diqîrî.
Hate nêzik û silav lê da,
Xwe kire hevalekî canfêda.
Got: "Hevalê dîk, were dakeve jêr,
Ez çavê te ramîsim tere têr.
Îro cejn e, dahatîye li nav me aşitî,
Herder bû rindî û geştî.
Min ramîsa çavê pir wehşî,
Bi dilekî pak û bi vî mehşî"
Dîk fêm kir, xîrab e nêta rovî
"Seydayê wehş û kûvî"
Dîk got: "Bi vê gotina te dil coş bûm,
Min bibexşîne ez pir şaş bûm.
Çend deqqa li min bike sebir,
Reşayî heye li nav erdê kepir.
Tê tajîyek û du nêçîrvan;
Dikin bighêne me, heman heman
Emê bigrin dîlana xwe helkin
Cejna aşitîyê tev pîroz kin."
Rovî dî ku, ev rewşa ne rewşeke baş e,
Şirtikê çima bidim ber serê nêşe
Rovî got: "Ez xwedî şixûl û kar,
Her ku ez bimînim ji min ra zerar.

Dem demake teng e,
Êvar e li min dereng e
Ezê nuha herim,
Bi xêr û xweşî careka dî li te vegerim.
Mîna dîk nêçîrvan û tajî
Ku pişt bi hev da me jî
Li hember me nedisekinî gur û rovî
Çavê me li rê nedîma bi hêvî...

Ne Dihat Bîra Me Ji Hev Qetandin

RUSTEM ZALL

rustemzall@hotmail.com

Heval!

Niha qasêk dikanim bigrîm azad im
Û ti hêsrên çavan nikarin agirê hundirê
min vemirînin
Baran çiqas bibare jî ser da
zanîm gunehên min pak nabin ger nebe
rihma Xweda
hevdiatina me ma li dinêkek din
Û tu li kû dibî bibe
Bira di dinêya te da tim cîyek ji min re
hebe.

Hîna em pir piçûk bûn. Nedihat bîra me
jihevqetandin. Mixabin, qetandin û cudake-
tin qedera me bû. Em di nav lîstikên xwe de
wenda û çavên me di xewa zarotîyê de
bûn. Her kesî bi çavên melekên li me mêze
dikir. Kesî nedibû şeytanan û gunehan
çer/çawa em girtine hembêza xwe. Pir der-
bas nebû ew soxîna em jê ditirsîyan hate
serê me.

Nizanim îro bû çend sal. Nizanim kengê
ev birîna bê derman li min peyda bû. Min çî
zanîbû ewqas giran e jihev dûrketin.

Tu bi dû armancên xwe ketî, ez bi dû ar-
mancên xwe. Bayê daxwazan em ji hev
dûrxistin. Kengê têtê bîre min ew rojên za-
rotîya me, xwîn ji dilê min, hêsir ji çaven
min dilop dilop xwe berdide jêr.

Em bi heve hatibûn girêdan. Ez diketim
tu dihêşiyayî. Tu digiriyayî ez dibûm hêsirên

çavê te. Ger min neîstana, lîstika te diheri-
mî. Me nizanîbû bê hev tiştek bikirana.

Û min kulîlkên bûkzavayan hew ji bo te
diçinî.

Tu xeyalperest bûy. Geh li stêrkekî te ji
xwe re malek çêdikir. Geh li keştîkî suvar di-
bûy û di behran de wenda dibûy. Bi pîlînga
re dibûy heval. Te digot bira hemû daxwa-
zên min werin cîh. Belkî loma ewqas te ji
zarokan hez dikir. Lewra zarok di dinêkek
nerest de dijîn. Xwestekên wan bi çî hewa-
yî be têtê cîh. Te ji xwe re di nav dewleta
daxwazên xwe ê masûm de keleyek çêkiri-
bû û têtê de bibûy padîşah. Te ji min bêhtir-
zanîbû ew dewleteke xewn û xeyalaye û bi
şîyarbûna te ewê hilweşe. Loma te newêrî-
bû çavên xwe ji xwe vekirana.

Xeyalên min jî hebûn. Hima min dizanî-
bû ku du dinê hene ji her kesekî re. Yek di
nav hemû restî û zorîya xwe de ew dinêya
em bi însana re mecbûrin têtêkevin têtêkîyê û
bi hev re bijîn. A din ew dinêya min a ku
min ji herkesî veşartibû. Di nav xeyalan de
li ser ewr e. Kenga tenê bimama hêdîka
berjor dikişîyam. Dûra ji xew şîyar dibûm û
diketim nav rastîyan.

Û me di xeyalxaneyên xwe de cîyên he-
rî baş dida hev. Pir cara min tu jî bi xwe re



► dibirî ser ewra û min hîs dikir ku kînga tu diçûy xeyalxana xwe min jî bi xwe re dikî heval.

Qetandin... dûrketin... wendabûn...

Çi navên nexweş in. Çi şûrên tûj in. Mere ji kûr de dihêşînin. Axek dibe hezar ax. Kulên di zikê însan de di xew de ne bi van peyvyan radibe ser nînga. Sînga însên ditengije. Bêhn naçe nayê. Xewn û xeyal radiiben ser xwe. Dinêya fireh ji însan re teng dibe. Ew jîyana bihar nişkave dibe sar û sermaya zivistanê. Di havîna jîyanê de berf dibare ser hêstên bêçare de.

Çiqas xweş gotîye şaîrekî; "Ger ji dost û yarê qetandin/cedaketin nebana, mirinê rê nedidî ku were xwe bigîne rihê me."

Çi ecela te hebû, te ewqas zû rê ji mirinê re vekir.

Nîha em jihev pir dûr in. Çavê min li rêya te. Tu lî welatê dûr û wenda.

Car jî di bin bandora hêstên xwe ên mazlûm de me. Him jî li bajarekî xerîb û jî te dûr im. Ne bêhna nêrgîz û sosinan heye, ne kulîlka cînnetcahnimê. Ne nançûçik hêşin dibe li vir ne jî çiyakî kulîlkên bûkzavayan lê vebin hene.

Tiştêkî min bi mane bike tineye. Hew bîrenînên minê rip û rût û xeyalên min ên bê rih mane bi min re. Dibê qey wekî din derdekî min tineye, min dev ji her tiştî berdaye û ez li cîyên tu lê tineye li te digirim.

Niha min çiqas dixwest hêstên xwe jî bona te binivînim. Weke hespeke bend qetandî, an jî weke salnamekek/teqwîmek pelên wê êdî şûnda nayên ji destê min diçû umrê min. Ez jî nizamim, di hindirê kîjan roj û kîjan mehê de ji bona te ketime rê û şopên wenda. Hestên min bê mane û tevlihev, car jî li te digirim.

Dilê min kû da biherike, çavên min li kû

bimeyîzîne, ningên min bi kîjan alîyî ve biçe, hişê min li kû xwe wenda ke, bi zanebûn an jî bê zanebûn, li her cîhkî û di her demê da li te digirim.

Nizamim ev evîna min a bêmane ya çenda ye ez dev jê berdidim û bi dû te dikevim.

Dîtîna te ne hêsan e ez dizanim.

Lewra tu ji Adem re Hewwa bûy

Û li serê dinê wenda bûy.

Ji Mecnûn re Leyla,

Ji Yûsûf re Zuleyxa.

Ez di bin tofanê de mam,

Tu di kêştiya/gemîya Nûh de. ■



Nimêj Dikim

*Li gor Mezhebê Şafîî
rê û usûla Nimêjê.*

Ji bo siparişê
www.nubihar.com
Tel: 0212 519 00 09

Keda Şêx û Meşayîxên Me

BAMED SERDAR

Bûyerên li vî welatî, pirsgirêkên gel, di dema berê de, bi şêx û meşayix, alim û zanayên gel dihatin çareserkirin. Lê rastîya herî rast jî ev bû; dema bûyer û pirsgirêkên gel, li ser destê şêx û meşayix û mirovê salih dihatin çareserkirin, heta dawîya dawî jî, êdî li ser wê biryar û serîkirina wan mirovên salih dima. Êdî, ew kesên alîgirên wan dozan, li ser soz û biryarên xwe diman. Meriv dikare mînakê ji Mele Kemalê Emerekî bide. Li gorî ku Mele Kemalê Emerekî digot:

— Li Serêkanîyê¹ bûyereke çêbibû. Mixtarê Serêkanîyê Zekîyê Bêrtî zilamek ji Xanîsora Omerîya kuştibû û yek ji wan jî birîndar kiribû. Ji bo ku ev fesadî û nexweşîya di nava wan mirovan çareser bibe; ez, Mele Abdulcelîlê Kermêtî² û Axayê Omerîyan Mihemed Axa û hinek kesên din jî, bi Seydayê Şêx Ebdurrezaq³ re, mekîneyek tije, em çûne Serêkanîyê. Bi Seydayê Şêx Ebdurrezaq re, em li mala Zekîyê Bêrtî peya bûn. Em derbasî hundirê mala Zekîyê Bêrtî bûn. Piştî demê Seydayê Şêx Ebdurrezaq sedema hatina xwe vekir û got:

—Xwedayê teala kuştina mirovan li ser mirov heram kirîye... Wazê seyda pir dirêj bû û berde-wam kir... êdî meriv dizanibû ku heybeteke îlahî xwe berdabû ser me. Em tev sist bibûn. Seyda dawî li peyva xwe anî û got:

— Zekî we zilamekî xelkê kuştîye û we yek ji wan jî kirîye niv însan, me bi zorê ji bo çêkirina dawê, deriyê dawê li wan vekirîye. Zekî ka hûn çi dibêjin? Zekî hinekî xwe da hev, xwe rast kir.

Bi dengekî neçar got:

—Ez qurban şerîtê bavêjin esmana û bavêjin qirika min û bavêjin qirika her pênc birayên min jî. Jibilî not hezar benqenot pêv ez nikarim biqedînim. Heftê benqenot ji ê mirî re û bîst jî, ji yê niv însan re. Kirin, kirin; nekirin kê me li kû kuşt bila bikujin. Ev ji me diqede ez qurban! Seydayê Şêx Ebdurrezaq bi nermayî li dora xwe nerî û hinekî rawestîya bêdeng ma. Piştî kêlîkekê, ji me re got:

—Rabin em herin.

Em li mekîne siwarbûn, em ketin rê. Em çûne mala Hecî Qado (bavê zilamê kuştî). Mala Hecî Qado tije mirov bûn, Mala Silêmano û mala Taşler tev li wir kom bibûn. Hecî Qado û ew malanan mervê hev bûn. Seydayê Şêx Ebdurrezaq dest bi peyvê kir û hinek wa'zên li ser efûya Xweda rawestîya. Li ser lêborîna ji bo Xweda peyivî. Gelek wazên bi bandor kirin. Wa'z û şîretên seyda pir bi bandor bûn. Mirovên rûniştî, her çiqas kezeba wan î beşerî ji kuştinê şewitîbû jî, Seyda bi wa'zê xwe, êşa kezeba wan hinekî sivik kiribû. Dilên wan ber bi eşqa Xwedê vekiribû. Di dawîya wa'z û şîretên xwe, xwest ku bibhîze bê ka xwesteka xizmên kuştî çîye. Piştî pirsê seyda, bavê kuştî Hecî Qado li gorî şertên usûlê got:

—Ku sed û pêncî hezar hebe êmê dawê çêbikin qurban. Gotina Zekîyê Bêrtî û xwesteka



➤ Heciyê Qado pir dûrî hev bû. Piştî gotinên Hecî Qado, Seydayê Şêx Ebdurrezaq dîsa peyivî û peyv hinekî bi bandortir kir got:

—Ez ji mala Qopê⁴ me. Lawê apê min, ev bû heft sal stêrk nedîtine. Pismamê min, her roj, beriya ku roj harê ava çeka xwe hildigire û dikeve hundir û deriyê hundir li ser xwe digire, da ku dijmin wî nekujin. Heya sibehê dijminên wî, wî dorpêç dikin, da ku wî bikujin. Piştî van gotinên Seydayê Şêx Ebdurrezaq, Hecî Qado got:

—Bîst hezar nelazim qurban. Seydayê Şêx rawestîya, çavên xwe girtin û biqasî pênc deqîqa çavên wî girtî man û sê caran serê wî kilbû (hejîya). Dema meriv li seydayê şêx dinêrî meriv dikete peroşiyekê (heyecan). Lewra dema çavên seyda girtîbûn, meriv têdigihîşt ku ne di rewşeke asayî de bû. Ketibû halekî cuda. Meriv di xwe de jî ferq dikir ku giranîyek hebû. Seyda dîsa bi nermayî û bi dengê zelal, dest bi gotinê kir û got:

—Heq we bizanîba, ku erwahên sadatan bê çiqas çûn û hatin, ku we bizanîbûna we yê ev dawa çêbikirana...

Piştî vê gotina Seyda, muyê canê wan kesên li hundir tevan bûne mîna bizmaran û kela girî kete qirika wan. Qûrîn û kuzînî bi Hecî Qado ket û got:

—Ez qurban lawê min berxek bû, min ji sadatan re serjêkir. Seydayê Şêx berê xwe da Hecî Qado, mîna ku nexwest neheqî jî li Hecî Qado bibe, got:

—Na em hatine ku em dawê çêbikin.

Piştî vê gotina seyda Hecî Qado dîsa xwest ku hinekî din jî kêr bike heqê xwînê, got:

— Sîh hezar din jî nelazim qurban.

Seyda got :

—Mele Ebdulcelîl, îca dora te ye.

Mele Ebdulcelîl ji ber ku ji Omerîyan bû, ew malbatana ji berê de nas dikirin. Piştî çend wa'zan got:

—Heyran, min ked pirr bi we re dîtîye, deh hezaran bidin xatirê min jî. Hecî Qado sekînî

mîna ku bêje îro roj roja camêriyê ye. Bi helwesteke serbilindî got:

—Me deh hezar da xatirê te jî seyda. Mele Ebdulcelîl berê xwe da Mihemed Axa û got:

—Îca ma Mihemed axa. Mihemed axa piştî xwe hinekî ji balîfê kişand, mîna ku bibêje çend gotinên meyî dinyayî jî henin û got:

—Şêx xalên axa nin. Axa jî xwarzîyê şêxan nin. We xatirê şêxan girt, we xatirê me jî girt. Xatirê min eve ku hûn vê dawê bi rastî çêbikin. Dema ku hûn vê dawê bi rastî çêbikin, wê xatirê me jî bê girtin. Ku hûn çenekin û bêbextîyan bikin, ezê wê demê pêl we kim. Xelkên we û xelkên min, ez ji xwe re bi axatî qebûl kirin. Bavê we jî bavê min bi axatî qebûl kiribû. Xalanên min yên Şêx, ez bi xwe re anînin ser dawa we.

Piştî gotinên Mihemed axa, mala Silêman û mala Taşler ciwanên xwe derxistin derve û hatin-gotin:

—Axa xatirê te jî hate girtin. Kêfxweşiyekê xwe berda ser rûyê mirovan. Hewayek aşî û biratîye bi hênkayîya dilên mirovan xwe delalî dikir li wê odê. Odeya ku bibû civîna sadat û erwahên wan.

Ev bûyer berî anîha bi sîh û pênc sal berê bû. Bi bereketa Xweda û bi bereketa sadatan heya anîha, herdu alîyan jî, ti zerar nedane hev.

Têbinî:

1. Serêkanîyê: Wê demê gund bû. Anîha bûye navçe, girêdayî Rihayê ye.

2. Mele Ebdulcelîlê Kermêti: Xelîfê Şêx Mehsumê Xizna ye. (Rehîmuhullah)

3. Seydayê Şêx Ebdurrezak (Qedesallahu sirrehu): Xelîfeyê Şêx Ehmedê Xizna (Qedesallahu sirrehu) bû. Anîha merqeda wî, li Qoser navçeya Mêrdînê ye. Gelek alimên ku li cem xwendibûn û ew dîtîbûn dibêjin, Seydayê Şêx Ebdurrezaq xwedîyê; sîdîq, adalet, hilim (tenikîtmîna, şecaet/cesaret bû.

4. Qopê: Navê wî Şexmûsê Keye ye. Li herema hilêla girêdayî Şemrexê bû. Di dema xwe de bi mîranî û bi mîrxasî nav dabû.

Ferhengoka vê Hejmarê

A

adan tiştên ji şîr tê çêkirin, weke penîr, mast.
aso ufûq, ciyê ku erd û asîman digihêjin hev.
ast mertebe, cih, herêm.

B

babet cins, çeşid, nifş, çawatî.

Ç

çaplûs meddah.

D

dam hebs, zindan, girtîgeh.
destbolî berdarî, kirin û xebatên pir û bi bereket.
deste bandûr, hakimbûn, nifûz.
destegîr sermîyan, serdar.

E

êge hesan, berav
enirandin xeyidandin, hinerandin.

F

fêrnas hînbûyî, pênas, agahdar.

G

geremol tevlihevî, kaos.

H

helwest rewş, tevger.
hemanê li ser halê bûnê.
hest diş
hidama xwe ji ba xwe, ji ber xwe.
hovbaz hovane, bi awayekî wehşî.

K

kam mesûd, dilgeş.
keşxe lihevhatî (ji bo mêran tê gotin) bedew, xweşik.
kizgiri

L

lûleper navê kulîlkekê ye.

M

mefer hewar, rêya rizgarîyê.
mêjû tarîx.
mîrnişîn seraya mîr, cihê mîr lê rûdinê.
misoger muheqeq.

N

nabihe nabihîse.

P

pa kelîmeya ji bo destpêkirina gotinekê tê gotin, weke "hele", "ka", "hema"
payîzok cûrekî musîkê. tiştên girêdayî payîzê.
pêşwazî pêrgikirin, çûna pêşîyê.
pêvdivî lazimî, ihtîyac, gerekkirin.
piç mexrûr, xwe mezindîtin.

Q

qed cih, meydan, der.

R

rawil heywan.
raz sirr.
regez unsûr, perçe, element

rêzgirtin xatir zanîn, qedirşînasî

Ş

şelah kasealês, xweşker, şayikker.
şol kar, xebat, temtêl.

T

tavilê dawîya dawî, axir.
têrêşan eşeke pîrr.
têrjan jana pîrr.

V

vekoler kesê ku li ser mesele ilmî tehqîqê dike û dikole.
vîyan arzû, xwestin, ixtîyar.

W

watedar bi mane, xwedî mane.
wêjevanî edîbî, xebat û lebatên edebîyatê.
wekanî emsal, nazir,
bêwekanî bênazir, nedîtî, nebûyî.
wexer irtîhal, koçkirina edebî.

X

xasma bilhesse, bi taybetî, baxusus.
xewan sifre, cîfnî, sinî yên xwarin li ser tê danîn.
xîç xav,
xûk xerac, bac.

Weşanên Nûbihar

Kitêbên Kurdî	YTL
Rîsala Biratîyê/ Seidê Norsî	3.00
Peşîva Bîst û Sêyemîn/ Seidê Norsî	3.00
Peşîvên Piçûk/ Seidê Norsî	4.50
Nimêj Dikim/ Komisyon	5.00
Gazîya Min/ Berhîm Paşa	4.00
Rubaiyat/ Omer Xeyyam	4.50
Dubeytî/ Baba Tahirê Uryan	6.50
Çarîn/ Sabah Kara	4.50
Peşamberê Ummetê Hz. Muhammed/ E. Botî	6.50
Leyla û Mecnûn/ Siwadî	7.50
Diwan/ Seyid Eliyê Findikî	8.50
Çil Hedîs / İmamê Newewî	5.50
Feqîyê Teyran/ M. Xalid Sadînî	11.50
Kelîle û Dimne / Beydaba	8.50
Teyrê Xerîb / Xurşîd Rûşen	1.25
Abdullahê Minyeyî / Hekimoğlu İsmail	8.50
Seyf-ul Milûk û Melke Xatûn/Siyahpoş	8.50
Gulşenê Raz / Ş. M. Şebusterî	6.00
Pênc Rîsaleyên İmam Xezzalî	6.00
Gulistan / Şeyh Sa'dî-i Şirazî	8.50
Leyl-name/Ayhan Geverî	5.00
Ferhanga Destî (Kurdî - Kurdî) / U.Demirhan	8.00
Cildên Kovara Nûbiharê (9 Cild, cildek)	25.00

Kitêbên Kurdî-Tirkî

Nameyên Bêcewab-Karşılıksız Mektuplar/ S. Kara	5.00
Mersiyeyên Rojhilat-Doğu Ağıtları/ S. Kara	5.00
Gotinên Pêşîyan û Botan Atasözleri.../A. Bingöl	12.50
Melayî Cizîrî Divanî'nın Şerhi/A. Septioğlu	9.00

Kitêbên Tirkî

Bediüzzaman'ın Hayatı/ Abdurrahman Nursî	5.00
Bediüzzaman'ın Volkan Yazıları/ Osman Resulan	4.00
36. Paralel ve Ortadoğu/ M.Selim Akdoğan	5.50
Çağdaş İnan Şiiri Antolojisi/ Sabah Kara	5.00
Asilerin Dönüşü / Gülistan Çoban	5.00
İslam Tarihinde Kürt Kadını / M. H. Yûsuf	5.00

Kitêbên Em Belav Dikin

Alimek û Zordarek/ Dr. Yûsif el-Qerdawi	4.00
Cewhera Eqîdeya İslamê / E. Tahir El-Cezaîrî	4.00
Şark Uleması/ Mehmet Çağlayan	10.00
Osmanlı Rus ve İran Savaşlarında Kürtler /A.	10.00
Dîroka Dugelên Kurdan/Abdullah Varlı	15.00

Kitêbên Em Belav Dikin	YTL
Qur'ana Pîroz û Arşa Wêye Bilind/Abdullah Varlı	22.50
Meala Fîrûz û Şerha Qur'ana Pîroz / M.M.G. Farqînî	20.00
Mewlûda Nebî / Ertûşî (cildkirî, du reng, şamûe)	10.00
Kürt-Ermeni İlişkileri/Mayevsriy	12.50
Kurd û Pêvegîriya Nişa û Dîroka Wî/ Reşid Yasemî	12.50

KENT YAYINLARI

Seyahatnamelerde Diyarbakir/ M. Ş. Korkusuz	24.00
İnsanlığın Ortak Akli (Antoloji)/M. Halit Yalçın	30.00
İslâm'ın Anadoluya Gelişi/ Ahmet Demir	8.00
Vadedilen Günler / Taha Hüseyin	7.00
Bütün Yönleriyle Arabkendi / M. Şerif Eroğlu	10.00
Tezkire-i Meşayih-i Amid/M. Ş.Korkusuz	24.00
Ali / Ali Şeriatî	17.50
Kuruluş Döneminde Eyyûbiler / Ali Beyyümi	10.00
Mem ile Zîn / Necdet Karasevda	6.00
Mazlum Halepçe / Müştahir Karakaya	5.50
Urfa Efsaneleri / Mehmet Kurtoğlu	10.00
Diyarbakirli Şair Sırrı Hanım / M. Ş. Korkusuz	7.00
Aşk ve Savaş (Devriş-i Evdi) / Necdet Karasevda	9.00
Amid'den Diyarbakir'e Eğitim Tarihi / M. Şimşek	6.50
Medreseden Meclis'e... / Giyaseddin Emre	12.50
Süryaniler ve Diyarbakir / Mehmet Şimşek	12.00

Ferhangê Destî

kurdî bi kurdî

Umîd Demîrhan

n

Nûbihar

▶ Naveroka vê xebatê, ji peyvên hevpar ên devokan hatîye hîlbijartin. (8500 peyv)

▶ Peyvên zanistî û pîşeyî ji ehlê wan hatîye pirsîn û wisa hatine ravekirin.

▶ Peyvên hîlbijartî bi mînakên ji gotinên pêşîyan ve hatine destekkirin. (1500 gotinên pêşîyan).

▶ Hemû lêkerên xwerû û pêkhatî hatine kişandin û ên hevedudanî jî ji hev cihê hatine nivîsandin.

▶ Mefhûmên rêzimanî bi herfa /(r)/ê hatine destnîşankirin.


▶ Ev xebat, li gor pîvanên ziman-nasîyê û Kurdî bi Kurdî hatîye amadekirin.

KENT'in Işıkları

SÜRYANİLER
VE
DIYARBAKIR

MEHMET
ŞİMŞEK

Süryanilerin Diyarbakır'la veya diğer bir ifadeyle, Süryani kaynaklarının kent için kullandığı isim olan Omid'le ilişkisi kadim zamanlara kadar gidip orada kayboluyor. Hıristiyanlıkla birlikte Süryaniler kentte kiliseler ve manastırlar kurmuş, kentin tarihinde önemli bir renk olmuşlar. Diyarbakır, Süryani Kilise tarihinde önemli bir kent. Şimdilerde sadece 5-10 kişilik cemaati olsa da, bir zamanlar Süryani Kilisesi'nin Diyarbakır'da kalabalık, eğitimli ve görece varlıklı bir cemaati vardı. Tarihsel süreçte kent ve civarındaki manastırlar, Süryani Kilisesi'nde önemli eserler veren yazarlar yetiştirmiştir.





Ji Mehmed Uzun re

Hunermend dengekî bi rêkûpêk û danisilandî ye.

Bi nêrîn û dîtîneke têgihîştî, bi aram û dorfireh e.

Bi helsengîya çanda xwe dizane û di rêya wê de têdikoşe
heta ku ew jî dibe parçeyekî wê helsengîye.

Herbijî ku tu xwediye vê rewşê yî.